ZARÊ ZÊRÎN

LÊVEGERA RÊZIMANA KURDÎ

Bi ṣêwezarê (Ḱurmancî)

Nivîskar

ARŞEḰ BARAVÎ

Pêşgoťina daner

Min ji zû de dixweśt ḱu ez ḱaribim xweśteḱa xwendevanên Kurd pêḱ bînim (hin desťûrên rêzimanî) ji wan ře bidime xwiyanê ; min soz dabû jibo ḱu ez bidim lê tiśtên qenc û baş sade û zû nayên hebûnê û bi vî awayî min xweśt ḱu tiśtên ez bidim serkefťî û rasťegêr bin .

Hodeya van desťûran ji rewşenbîran ře xelaťa mine ..nexasma boy pêbilyayên zaravên zimanî,ev ne çakî û xasiye ji min ře qasî ḱu zar û zimanê mine , tev ḱu mefaya xweśtî bêyî desťeḱ û alîkariya we naçe serî .

Ya gereḱ berdewamḱirina di nivîsandin û xwendinê de bi fêrî bibe (hojînḱirin).

Ev verêja min weśtiyana salaye ,bi desťeḱa piř

ferheng û pirtûkaye…bi salan ez li ser rawestiyame ta ez karibim vî êmîşî bidme we bê westandin .

Nû ezê şabim ku hûn jî bi min re aloziyên zimanî ji xwe re bikin karekî pêwîst û kêmasiyan jê bidine der .

Davdiliyên dilsojî boy we .

ARŞEK BARAVÎ

Lêvekirin :

Zar ji karmendiyên mirovînî tundiye, ango di jiyana lawirî de peyda nabe tevku despêkin di asta meymûnanî bilind de jî neyin û nepen nabin .. belê ew despêkin jandarin, dêmekî ji bingehekê civakî .. řê li ber girtiye.. an hatiye girtin.

Ji gencîneyên lêkolînên bilîmetên cîhanî û kevnar tê nasîn ku zar yek ji mercên mirovahiya mirovaye.. mercekî resene û hîmdeye.

Zar bi derbasiya pêngavên delîve û qonaxêd zarotiyê hatiye vegirtin û ji têkiliya ziman û

Ramanê bi hiş ře sûd û hode wergirtiye.

Tenê mirov dikare zar bikar bîne (şêkarê axaftinêye) .. binivîse .. paxive .., lewra di piř beşên zanyarî de lêkolîn û kwîrkol jê ře bi nav bûne .

Pîtolên derûnî jî piř berhemên balkêş di biwarê zar û derûnê de şirove kirine … û ravekirin dane, hevkariya hiş û zimên berdewame .. çiku

dever û navendên peyivandin û axaftinê di mejî de cîgirin… aşkart û aşkere bûne, di evî warî de û li ser ronahiya çirûskên berêzêd berya me … tevlî kêmasî û şaşiyan… emê berbi pêşxistin û duriskirin … û geşînkirinê de bimilin, hêviya me ewe ku em bereкî nûvar û xweş ji mêweyên bi mize û çêj û bi mizyarî perû û pêşkêş bikin.

Bila tu kes xwe meke xwediyê tiştekî an şîretvanê radeyekê ..û di pê re helwesta wî di rolê de lawaz bibe, ku bayikê wî tune be ..!.. lê ku pingirandin û kîndarî be .. ewê di wê dexsê de bikizkize .

Di cîhan de çiqas millet hene evqas ziman jî hene, tevde ji hev cudane, pirbûna şêwezarên zimanan jî bi kevnariya dîrokî û pirbûna hejmara amarê û pêşketina têkiliya deshilatdariyêye .. û bi berdewamkirina serdestiyê ve berpîvaneke pêwîste..

Lewra zimanê kurdî jî pirşêwezare, lê ku em her nerîneкê li gor şêwezarê deverê binerxînin û em tevayên şêwezaran bi ewê nerînê ve bipîvin..em gunehkar dibin,çiku em tevayên şêwezarên dîtir neşê û neçar dikin, emê wan

bimesťînin û bêcan biḱin,.. û ev ji zana ře nabe pḯver û terazû .

Ziman pîťoliye (felsefeye) ..bi live û bi cane.

Balo ḱu em bêjin berêz Celadeť û hemû rêzdarên dîťir, her yeḱ ji wan peyamberê dawî bû , naxwa çima bûn (Celadeť- Tewfîq- Ereb- Qenať- Kamîran- Reṣîd- Osman ..h…w..)…… û her yeḱî ji wan berêzan.. di bin bandora ṣêwzarên navçe û devera xwe de û bi nerînên cuda û cîwaz jî, rêzimanî ṣopandine, de ka em bêjin A B C ya kurdî (durvê tîpa) qalibeḱe ji xwe ve haťiye , ne ji zimanên hindoropî haťiye veguhêzťin , dêmeḱî em xwe ṣaṣ naḱin ..em xwe zana dibînin .. em hempazin û her yeḱ ji me tu kesî ji xwe pêve nabîne , ḱu em ev bin ..silavên xwe ji zimên ře bihinêrin (Yezdan zimanê me bi dilovaniya xwe ṣa biḱe).

Pîvera ewê pirsa ḱu ji her zîreḱeḱî dibe : ka ťu ji kîjan Akadîmiyê derhaťiyî ?..., û bersiv jî :

Ma gelo ew hemû zanyarên ḱevnarî ji ewan rojgarên bûrî … ji bilî ḱu ji Akadîmiya gellê xwe derhaťibûn û pêve tu Akadîmî ji wan ře

hebûn? .. belê hinan ji zanyarên cîhanî ji zanestiyê..Akadîmî ji gellê xwe ře damezrandin û berdewam bûn .

Xwendevanêd rûmetdar: kî ji we dikare çi ji zimanê xwe ře pêşkêş bike bila bê tirs û fedî û rawestan be , çiku lêkolînên pêşinyarî (pêşniyazî) çendî piř bin hempayî sûd û wircên rojane .. ew ayindê lal bi zar û bizav dikin.

De îcar ew kesên ku bingeha xwe lawaz dibînin , dava rexnê di her tiştî werdikin , ew neşêne .. jar û mestin , lewra zana û zîrekan ji xwe ře dikin nîşan û armanc, da bi wan ře navdar bibin , çiye neçiye.. vaye em jî her tiştî dizanin, tevlî ku me hin hewildan kirin ..û.. ji ber berjewendiyên kesane têkve çûn(bi ser neketin) lê em ranawestin.. em di rîpên bazirganiyê de serkeftîne .. em dirav bi kijên bilind di hemû delîveyan de zanin bicivînin.. çima kirî em ne hertişt bin ? erê em hovin lê rola zanînê ji me ře heye ..em têkoşerê nepenin .. mane her tişt bi drav dibe û em xwedî diravin…!!!

Em bi gova û bawernamene .. em bi perene ..balo tukes ji me zanatir nine, dema em xwe di

zanyaran û mijarên demane derxin .. çê be xerab be nederde , çewt be rast be nederde , tenê emê kar bi derengî xin û kînên bê bingeh pêk bînin.

Ku ez kara û têgihijtî bim ezê bidim ,çima ezê xwe bikim şîretvan û pê ře jî bixwazim, na tew ez rexnê jî dikim êrîş û bi şêweyekî wenda jî .. kî tê digihêje ?..hovin..?..şêtin ..?.. an ez bêmejîme.. ? …mexabin .. !!!

Zimanê kurdî yek ji zimanên Ariye .. kevnare , ji şaxê rojava (zendî) ê ku ji komela (malbata) zimanên Îraniye , ev malbata ku goveke mezin ji zarên Arî jêne..û tê ře zarê Avistayî ku Zerdeşt - ew pêxemberê milletên Îranî -..herdû berên pertûka xwe a evra Avista: (Zendavista) û (Vêninda) pê nivîsand , ew zarê herî nêztirîn ji zarên Êranî ku ber bi Kurdî de bû , dibe ku yek ji şêwezaran be jî , her wekî ku zarê Pehle (parisiya navîn) û Parisiya nû û Kurdî û Estînî li navîna Qewqasa bakur jî jêne (ji malbata Êranînê) , zarê kurdî li ser hêza xwe ma û zaravên xwe êd resenî ku regezê wan ji Avistaye – zarê Mîdiyan - ku hin bavpîrên kurda ên di bakurê rojavayî Îranê de berya ku

Guhreș dewleta Pars ava bike deshilatdar bûn … ew parastin .

Zarê kurdî li çar șêwezarên ku her yek jî weke zimanekî xwe dinasîne … pay vedibe , li sê hevciyan ji Kurdistanê belav dibe û dipexșire : șêwezarê bakur û șêwezarê başûr (Kumanciya jorîn û jêrîn-xwarê) û șêwezarê bakurê rojava (Zazakî) û șêwezarê Lorî (Bextеyarî) .

1- Kurmanciya jorî(Behdînanî) : hemû kurdên bakur di herêmên rohilat û başûrê rohilatî Turkî de û kurdên li Qoqasa başûr di Ermenistanê û Gurcîstanê û Azerbêcanê de , û kurdên li başûrê biçûk li Sûrî(ji bilî bîrek ji koçeran li herêma Dêrikê ku di bin bandora șêwezarê Botanî de taxivin) û li Şingal û Zaxo û Eqrê û Zîbar û Îmadî û Şêxan li șarê Duhokê , her weha jî kurdên leqa Qoçan û Beçnort li șarê Xurasanê … pê taxivin .

2 - Kurmanciya xwarê:li kurdistana başûr(Îraq), başûrî xiça Rawendoz - Mûsil - û kurdên Rohilat (Êran) di herêmên başûr û başûrê rohilatî gola Ormiya (Rizayê) de ta bighêje başûrî Loristan û Bextiyarê…pê taxivin .

Lê ṣêwezarê ḱurmanciya jêrîn (xwar) bi sê komgêrên mezin pay vedibe…

A - Babanî û Soranî : li Silêmanî û Kerḱûḱ û Hewlêr ji baṣûrê Kurdiśtan (Iraq).

B - Mukrî û Erdelanî û Ḱelherî li rohilaťî (Êranê) belavin …

Mukrî bi xwe li herêmên ḱu bajarên (Şeno - Lacan -Sablax - Serdeṣt..) ťa bighêje sînorê Miyandiwavê … û Erdelanî li ṣarên (Bêcar - Kiros-Ciwanro-Bane ..) û rexa rohilaťî rûbarê Sîrwan belav bûne .

C - Hewremanî û Goranî : Hewremanî li herêmên Hewremana çiyê li navbera Mirêwan û Sîrwan .. nêzî sînorê Iraqê bi kar ťêť .

Lê Goranî .. ew kesên goranên bawermendên rasťiyêne xwe dibînin xwedanêd maf .. û zavên wan ji zavên hinavî bisilmaniyêne ,.. herêmên Goran li nêzî rêya Xaniqîn û Kermenṣahêne.., û ev herdû ṣêwezar nêzîḱayê li Zazaḱî di baḱurê rowavayê Kurdiśtana baḱur (Turḱî) de diḱin .

3 - Şêwezarê bakûrê rowava (Zazakî) : êlên Dumilî (Zaza) li herêmên Dêrsim - Palo - Gênco - Çebeqçûr - Madin - Pîran -Agîl - Sêwêrek-Bêcar-Çermûk..pê taxivin û di herêmên ku êlên kurmanc bi êlên Zazan re hevjînin de..bi kurmancî û bi zazakî jî taxivin .

4 - Lorî û Bextеyarî û Lekî : li Loristana mezin û biçûk bikar hatine .

Her weha di van ṣêwezarên bi navkirî de , her yek ji wan ji dehan bêtir ṣêwezarên deverkî hembêz dikin .. ji bilî ṣêwezarê Zazakî ew ṣêwezarekî xurû û serbixweye .

Ev hejmara ṣêwezaran di zimanê Kurdî de dinase ku ev zimanekî kevn û resen û dewlemende , lewra xwe ta roja îro parastiye .

Fuad Hemê Xorşîd *(Macisťêr di Ceografiya de)*

Di sala 1983an de goťiye:

Biřeḱe mezin ji rojhilaťnasan di lêkolînên xwe de ber bi wê baweriyê ve diçin , ḱu tu girêdana zimanê Kurdî (weḱe şêwezar an şaẍeḱî jê) bi zimanê Farisî ře tuneye, ew zimaneḱî xudan taybeťiyên serxwebûna xweye û ji wan rojhilaťnasan em diḱarin bi taybeťî **Justî û Socin** bi nav biḱin .

(Justî) li ser wê yeḱê radiwesťe, ḱu zimanê Kurdî ne şaxeḱ ji Farsiya nûjene, ḱu bandora bindesťiyê lê bûbe jî … belê ew geleḱî ji Farsî cihêye, û **(Socin)** jî diyer ḱiriye, ḱu zimanê Kurdîne şêwezareḱî hogire ji zimanê pehlewî ře û ne ji Farsiya nûjen ře jî ... lêbelê tişteḱî dûrťir di warê têḱiliya wan de heye, tew **Socin** daye xuyan ḱu zimanê Kurdî ji Farsiya ḱevnare û şaẍ nedaye.

Rasťe .. ḱu ji zimanê Kurdî ře têḱiliyeḱe dûr û dirêj bi zimanê Farsî ře heye ji ber ḱu herdû jî endamên komiḱa zimanên Indo-Europî ne (*Indo-European Langauges*) lêbelê ji hevdû

cihêne ji geleḱ aliyan ve, çi di bêjeyan de û çi di rêzimanî … rewanbêjî û kêṣanê de, an jî di lêvḱirinê de, çiḱu zimanê Kurdî weḱe ḱu **Sedny Smith** li ser rawest́iyaye … zimaneḱî serbixweye , gelmperiya serxwebûna wî heye , û pêṣkef̀tinên dîroḱiyên seř ast́ jêře hene , ew zimaneḱî Ariyê hêjaye , ji ḱevnedemê de t́a roja îro li ḉiyayên Kurdist́anê bi ṣêweyeḱî paḱ û zêndî dijî.

Daḱu em wat́eya zarûzimanî a komiḱa zimanên Indo-Europî baṣ binasin , û t́a çi deraxê têḱiliya zimanê Kurdî bi ewan zimanan ře heye, divê em hineḱ rast́iyên dîroḱî bibîr pînin.., **Arxeolociyan** berḉav ḱirine ḱu tehereḱ hevpar bo ṣarist́aniyeḱe mirovî a ḱevnare heye, piṣt́î kut́abûna demgarê ḱevirînî nûjen… li ser pareḱe fireh a zevînên cîhana ḱevin belav bûye , weḱ li Romaniya , baṣûrê Urisê, Sûse, Bilûcist́an, Hindist́an Turkist́an û Kurdist́anê. . û bi encama wê zanyar gihane wê got́inê, ḱu bêguman ev ṣarist́aniya hevber di peydaḱirina neteweyeḱê de jî bûye, û li gor belavbûna diyarḱên wê ṣaristaniyê ji Hindist́anê t́a bi

Europa, lew ře navê Indo-Europî li wî gellî kírin .

Ew gell (netewe) ji geleḱ êlan bû , ḱu berî koçḱirin û belavbûna xwe .. di nişt́ê xweyî ḱevn de jiyan dibû , li deşt́ên ḱu li aliyê rojhilat́ û bakuřê rojhilat́ ji zereya **Qezwîn** dikevin ... û ji ber ḱu tevayêd wan **Êlan** yeḱ gell bûn .. ewana - bi nêzîḱayî - bi yeḱ zimanî diṕeyivîn, ḱu jêře navê (Zimanê Indo-Europî) hat́iye danîn, .. ji wî zimanî- îro - hemû zimanên ḱu gelên **Arî** ṕê diṕeyivin..şaẍ dane .

Zimanê Indo-Europî , ḱu zimanê Kurdî yeḱ ji şaxên wiye, ew jî bi xwe ji zimaneḱî pêşdîroḱî peyda bûye, şaxnas vî zarî di nav zimanê Indo-Europî ê pêşeḱî de (**Proto-Indo-European**) bi nav diḱin, û t́ê bawerḱirin ḱu ew berê di hezarsala pêncemîn a berî Zayinê de li dar bû .

Zimanêd Hindo-Iranî



Komiḱên Îranî

Qezwînî

Hindî

Durdî

Ev ziman bi koçḱirina gellên Indo-Europî ře belav bû , ewên ḱu her komeḱê ji wan berê xwe dabû herêmeḱê ji herêmên cîhana ḱevn .. û bi

taybetî li Asya û Europa û parek ji wan di çemê **Donau** re derbas bû û koçkir .., û ewana pêşserên "Bav û bavpîrên Yûnan û Roman û ên din ên ji gellên Europiyên ku bi zimanên Europiyên nihok dipeyivin , di dema ku pareke din ji wan ber bi başûrê rojhilat ve çû û giha serhedê Hindistanê û li **Sind** û **Pêncab**ê :*pênc avê* "bi cih û war bû .. û ewana Ariyên başûrê Asyane,û ewin ên ku îro bi zimanên **Hindî** ji komika zimanê Indo-Iranî li başûrê Asya taxivin .

Lê beşê sêyem berê xwe da bi **Asya Biçûk** û çiyayên Zagrosê .. û li Iran û Kurdistanê belav bû , û di pêşiya hatiyên nav çiyayên **Zagros** de **Gotî** hebûn û di pişt re **Mîdî** pêşiyên gellê Kurd hatin.

Weku çûyina **Parthan** ber bi bakurêIranê ve .. û Farisan ber bi başûrê wê ve,..ku ta nuha ew parê Iranê bi herêma (Iqlîmê)**Fars** navkiriye, û van tevan bi komek ji zimanên hevnêz û wekhev di hinek taybetiyên zimanî de dipeyivin , ji wan re navê komika zimanên Iranî hatiye danan..(*Iranean Languages*) ewên ku şaxekin ji zimanên Indo-Europî .

Bi evê bingehê,di zimanê Indo-Europî de komiḱeḱ zimanên Sereḱîne û geleḱ liqên wê li herdu zevînparên Asya û Europa hene evin:

1- Komiḱa Hindo-Europî
2- Komiḱa Anatolî
3- Komiḱa Italî
4- Komiḱa Germanî
5- Komiḱa Kilt́î
6- Komiḱa Balt́îḱî - Silavî

Û hineḱ zimanin din jî hene..
ev komiḱên zimanî bi xwe li çend zimanan an komiḱin zimanî ên ne sereḱe ḱu hemî zimanên Indo-Europî ên nûjen digirin nav xwe par vedibin .

Komika Indo-Europî :

1- Dardî
2- Hindî
3- Qezwînî (seba Zereya Qezwîn)
4- Iranî

Û di komiḱa zimanî a Iranî de geleḱ ziman hene..evin :

1- Kurdî
2- Belûcî
3- Suxdiyanî
4- Piştowî
5- Avêstayî
6- Farisiya kevin

Û hatiye berçavkirin ku nêzîkahiyeke zimaniya diyer di navbera komika zimanên Hindî û Iranî de heye (Zimanên Indo-Europî) tê naskirin . Belê komika zimanî a Iranî ku herdu zimanên Kurdî û Farisî û hindek zimanên ku me berê dane xuyanî jê hatine peydakirin ,.. li sê beşên sereke par vedibin :

1. Zimanên Iraniyên bakurî rojavayî

2. Zimanên Iraniyên başûrî rojavayî

3. Zimanên Iraniyên rojhilatî

Zimanê Kurdî ji komika yekemîne, lê ê Farsî ji komika duwemîne Û ev nîşana serxwebûna her yekî ji wane.., lewra zimanê Kurdî zimanekî serbixweye û ne liqeke an zaraveke herêmiye, ku ji zimanê Farsî peyda bûye.

Ev zimanê hevdûdanî û xweza ji zimanên regezê Arî ta nuha xwe li ser niga hiştiye , tevlî bandora bindestiya kevnar .. û xwe li ber hêzên Olî û Ayinî aşkartiye..mancî kiriye , lê mixabin bandora zarave û ciyokên dagêran pir lê kiriye (lê bûye) , lê hin makiya gote û bêjeyan ji Parisî bêhtir parastiye , ew jî mîna hin zimanên Latîn .. nêr û mê li nav xwe wergirtiye : tîpa (E) ji mê re di darêja palvedarî de û (O) ji bangîna nêr re holisandiye , pêrnavêd xwe bi du cureyan li nav her çi şêwezaran de man hiştiye , tew ew hûrbînên zimanî (pêşgir û paşgir) ku bûne bingeheke rojgarînî boy peydakirina hevwateyên demane .. û hîn û hîn bêhtir boy dewlemediya rêzanên rêzimana evî zarê pîroz û berfirehiya ferhenga wî ..tevlî peydabûna arîşe û aloziyan jî …

……..

Hin nerînên cihêreng :

*- Di sedsala 16’an de Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe a navdar Şerefnameyê de şêwezarên kurdî wiha rêz diḱe :

1) Ḱurmancî

2) Lorî

3) Kelhûrî

4) Goranî

*- Li gor G. Girvinli ku di salên 1836-37’an de li ser etnografiya kurdî hineḱ lêkolîn ḱirine, zimanê kurdî dibe du beş : kurdiya jêrîn û kurdiya jorîn.

*- Peter Lerch (1857-58) kurdî li pênc şêwezaran dabeş diḱe : zaza, ḱurmancî, kelhûrî, Goranî, û lûrî …

*- Oscar Mann., kurdî weḱî kurdiya rojava, rojhilaṭ û başûr …diḱe sê beş. . Mann , Goranî û Zazaḱî weḱe Kurdî napejirîne.

*- E. B. Soane, di berhema xwe a bi navê {Grammar of Kurmanji or Kurdish Langauge (1913)} de, kurdî li sê beşan parve dike : kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn, lorîzaza (hewramî û goranî) .

*- Ziya Gokalp, di xebata xwe a bi navê (Kurt Aşiretleri Hakkinda SosyolojikTetkikler) de , Kurdî wek pênc şêwezaran hildaye dest : kurmanc, zaza, soran , goran û lor, .. Gokalp daye zanîn ku, ev gişt zarava ji kurdiya kevn derçûne.

*- Dr. Mac Kenzie, kurdî dike sê kom : koma bakur, koma navîn û koma başûr.

*- Cemal Nebez jî kurdî dike çar beş : kurdiya bakur, kurdiya navîn, kurdiya başûr, Goranî,zazakî.

*- Alaedîn Secadî, di berhema xwe a bi navê ..Destûr û Ferhengî Zimanî Kurdî, Erebî û Farisî de, ziman ê kurdî dike du beş : Kurmanciya behdînî û soranî .

*- Li gor Dr. Kemal Fuad ,zimanê kurdî çar şêwezarin :

1) kurdiya rojava (jorîn)

2) kurdiya rojhilaṫ (jêrîn)

3) kurdiya baṣûr

4) kurdiya zazakî-goranî.

*****- Emîr Hesenpûr , di xebata xwe ya bi navê {National and Language In Kurdistan (1918-1985) } zimanê kurdî diḱe çar ṣêwezar : ḱurmancî, koranî, hewramî, kîrmanṣanî.

*****- Ehmedê Xanî (sedsala 17'an), di berhema xwe a navdar Mem û Zînê de zaravayê Ḱurmancî li ser sê devoḱên bingehîn pare ve ḱiriye ,..em vê peyt́ û tespît́a wî bi maliḱeḱe ji Şahesera wî nîṣan bidin :

Bohtî û mehmedî û silîvî

Hin la'l û hiniḱ ji zêr û zîvî .

****

Zimanê gell nasnameya gelle.. û em jî gellin :

Di bin siya evê durişmê de … pêdivêye ḱu em jî li zimanê xwe xwedî derkevin û tevḱu hewlên kesane sûd û wirc û hode û mefayeḱe piř ḱêm didin evî zimanê heřifî û jevkeťî ... lê ev hewlên kesane bingeheḱe wircedar avdidin .

Boy pirojeyeḱe dezgehî bêťe damezirzndin … ew karê dezgehî ḱu evan hewlên kesane bide ser hev û bibişêve û biṕarzinîne, ťa ḱu kesên zimannas bi gelamperî ji hewlên tevayên şêwezaran laperîneḱe gi sťî peyda biḱin ,…û kar ji zimaneḱî fermî … peťî û seřasťî yeḱser ře boyî seranserên şêwezaran…ji hevṕeyvîneḱe hevweḱ û hevfêriyê ře … biḱin , lê şêwezar dîsa wê bimînin .

<u>Ťêbînî :</u>

Min goťiye: zimanê herrifî û jihevkeťî … ev danasîneḱe demçaxiye , .. çiḱu bandora bindesťiya salan ev ziman ji lawaziyê û lariyê ře ḱevandiye..ciyoḱ û zaraveyên zarên cînar (hevsî) ťê de bûne rêwiyên raser û cîgir, ev

aloziyeḱe balkêṣe û minêkarî lêkolînên miqaṭebûnêye .

Zimanê kurdî ji dîroḱa ḱevnare…laṕ dewlemende …piř zengîne , çiḱu ew zimaneḱî xwezaye , bi qam û kizweṭe.. xwewaṭeye… goṭe û bêjeyan ji rade û jêderên xwe .. ṭafirîne , tenê jêře pêwîsṭe ḱu em gemara salan ji ser daweṣînin …

- lê mixabin - bi derengî keṭ , û tew ḱula ew heçî pirojeyên ḱu li herçar layên Kurdisṭanê ,… ev festîvala Amedêye û ya dîṭir li Dihoḱê û her weha boy rweṣa zimanê kurdî û pêṣkêṣḱirina pêṣinyarên xwedêgiravî boy zimaneḱî Sṭandarṭin …

-Bibexṣînin - bi gavnî sisṭ û hêdan, bê hêz û bê berhem , mîna neçaran , çareserî windaye … rêbaz çeṕerḱiriye … na û ne hew ev tenê jî .. ka kiye ew ê berpirsyar ? … tenê dem û ciyên sêçarbareḱirinê ji wan ře giringin , lê her gav jî pêṣinyar û xwesṭeḱ û axavṭin ew ewin , û kes jî ew kesin , her weha ew xwediyên hol û rola vê pirojeyêne , dêmeḱî qeṭ nabe ḱu mejiyên nûjen hevbeṣbin … eger ḱu kes ji wan ḱêm bin ,

jixwe pêṣinde behaneyên wan amedene : (hevalê me çûye serdana Kurdiśtanê..).. balo ew devera ḱu ew lêne ne kurdiśtane.. , lê kesên nûderbas jî ew hempayên tenê guhdarin , an jî pirḱirina temaṣevanêd ewan kesên kawîne,…

Şelo ji eniśt̂út́eya Holandaye (Indirlande)… Çello jî ji Amojgeha (ṕeymangeha) Parîsêye ... Bext́ewer ji Iśtanbolêye û Bext́iyar jî ji zanîngeha Tebrîzêye !!…

L ê Bext́ereṣo bi xwe zanyareḱe,..belê ew vexwendî tu ahenga nebûye ,..çiḱu perîṣane .. bêdirave… rewṣenbîreḱî serberdayî û bê hêle … eger ḱu derbasî evê rewṣa taybet́ bibe …. çê nabe …!!.. ma ev rava zanaye ?..

Loma alozî berfireh dibe .. . hûrbînên ziman winda dibin, têvel û jevcudayî ..qonaxeḱe dûdirêj ava diḱin … û her hêzeḱe deshilat́dar di her herêmeḱê ji kurdiśtanê de pêsinyara xwe pêṣkêṣ diḱe ,.. ewe ḱu ṣêwezarê xwe ê herêmê biḱe zimanê fermî … tev ḱu bingeh û binyat́ ne resenî be û rêzimanî heřiṣî be jî , û bila ṣêwezarên dît́ir vemirin ,… raserî dizane û diḱare ,..boy çi û t́a kuder ev ṣaṣiyêd ziyandar ?

Ew jî berjewendiyên kesanene !... ma gelo gunehê evî zimanê qidoș û bindest̕ çiye?.

Li min bibûrînin… ez arîșeyên zimên bi rûdan û bûyerên demane șirove dik̕im .. lê mebest̕a min k̕u ez serbûriyên dîrok̕î(mêjoyî) ji ayinde ře bik̕ime goriyên ronahiyê .

Hêjano : mijara (mijada) min mebest̕ û xwest̕ek̕a gellê mine .. pêwîst̕e k̕u em jî mîna hemû kesên cîhanê li rêzimana xwe bikolin..

Erebê Şemo û Tewfîqê Wehbî û Qenat̕ê Kurdo û Celadet̕ û Kamîranê Bedirxan… Reșîdê Kurd û Osmanê Sebrî û .. h..w.. piř zanyarên dît̕ir ên xwedî ked û hêz û bîr û bawerî ji me ře bûne ronahiyên berbiçav û xuyanî, divêt̕ em jî li p̕ê wan di ronahiyê de șop̕gêr bin da em pêșve biçin û em k̕aribin sûd û hode û wircê bidin.

Lewra min jî ev daxwaza gellê Kurd bi miqat̕eyî șop̕andiye , çik̕u Kurd li henkûfê rêzimanek̕e rast̕egêrin.

Rêzimana her zarek̕î xurt̕iya ewî zarî bi rêzanên zimanî dide xuyanî.

Weḱe ḱu haṫiye nasîn: rêzimanivîsan tîṕên laṫînî di zimanê kurdî de bi pêṣkeṫina demê ře bikar anîne .. 31 tîṕ ji A B Cya kurdî ře danîne , pîṫoliya zimên berz diḱe ḱu zimanê kurdî zimanekî ṕeyviye û axêvḱiye .. dêmekî çiṫove ṫêṫe bilêvḱirin weha jî ṫêṫe nivîsandin, ji evê nasînê ṫêbînîḱe bi waṫe derṫê.. piř lêkoler jêře mijûl dibin û li ser diṕonijin: eger em rêzanê neṣiḱênin û durisṫ bi cî bînin … hin tîṕ hene di bilêvḱirina tevayên dever û herêm û navçeyan di welêṫ de..dudengin û her dengeḱ di bêjeyên hevtîṕ de waṫeyeḱe qetirme ava diḱe ..

Mînaḱ : tîṕên Ç K P T R

Di nerîna min de.. ji kêferaṫa hay û hesṫan.. em ṕêjna cêwîdaran jê diḱin..

Ṫêbînî : alava (dar) di zimanê kurdî de samanî û arziyê dinasîne..

Weḱ : ez oldarim .. dêmekî ez xwedî olim

Balo cêwîdar waṫe û rêzberiya xwedîcêwî dide .. û cêwî(cêmiḱ) jî evin : Ḉ Ḱ Ṕ Ṫ Ř

Mînakîn jiboy ravekirinê :

Ço.. dengenave boy ajotina Kere

Ço .. dare ..şive

Kar-kar .. Par-par..

Ta-ta .. birîn-biřîn .. vir-viř

Bindestiya kurd û setema kevnar bûye sedemeke mezin .. bandora xwe daye liv û bizavên canê rêzanên rêzimana kurdî .. û bi evî awayî rewanbêjiya zimên û zarxweşiya wî lawaz û qels kiriye, alozî û arîşeyên giran tê de peyda bûne.. ev mukurhatineke ji me kurdan tevan têtê xwestin, dêmek astengî di rêya lêkolînerên rêzimanê de gov û kom bûne… wêrankirin asaye lê avakirin zore.

Zaravên herêmî û rêzanêd zimanên hevsî û cînarên hawîrdorî Kurdistan bi nifşan xwe di nav zar û zimanê me de bi cî kirine.. ango zimanê me zîvar kirine taromar kirine.

Tevlî evan zortengiyan jî hêna gote û bêjeyên makî … jêderî .. û hin ji malbatên rêzimanê ên

koḱî(rehane) û bingehî li ser xwe mane, ew baẍê hêvî û omûdewerêd lêkolînerên zimên av didin.

Hêzên ḱeṫaḱeṫ wirceḱe ḱêm û hindiḱ û hodeyeḱe demxwaz ṕê digihêjînin.. lê kareḱî hevbeș ji saxṫiman û dezgehên welaṫî giringe û têḱiliyên rewșenbîrî di nav xêziḱ û têlbiřên welêṫ de dîsa giringin…

Tevde jiboyî rêzgariya zar û zimanê kurdî û pêșxisṫinê .. pêș ve biçin ..

PUXṪEYA MIJARÊ SERMIJARE

Pêḱanîna rêkefṫineḱe ferzande.. ji tevayên șêwezarên zimên… bi giṣṫî pêḱeve bê.

Pirḱirina derfeṫ û delîveyan boy piṣiḱdariya herçi zimannas û çi ṕêbilyayên zimên ên sṫêle.. ji hemû șêwezaran .. bi awayeḱî hevkêșe û bêyî qiran , daḱu werez nebe.. giringe.. û ev xwesṫeḱ jî ne hîbûdiye qasî ḱu mafê her kesiye , daḱu vebijarṫina zanyaran hîmdeyeḱe nasyar ji hojîneḱe hêvoje (hawûṫ) damezrîne , û gedê biryareḱe hevra were afirandin .

ARŞEḰ BARAVÎ

BERÊ YEḰEM

RÊZIMANÎ . . . çiye ?

Rêzimanî destûr û ferman û biryar û rêzanên liser zaravên zimanin , û Pevgirêdana wan zaravan (goṕe - bêje ..) û gîtan - alavan - pêřnavane...., û beş û şêweyên nivîsandina hevokan û axavtina dûrêz û duriste,.. bi taybetî û tibabî bi her babeṕ û durv û celeb û weş û renga ravedikḗ ...rêzimanî ji pîtoliya zimên dertê.

lewra rêzimanya her zarekî xurtiya wî zimanî bi rêzanên rêzimanî dide xuyanî.....

HÛRBÎNÊN RÊZIMANÎ

Alavên ḱu bi tena xwe bê waťene:

Alavên bê waťe bi tena xwe tu waťeyên raveḱirî nadin xuyan..belê ḱu bi goťeyeḱê ře hevbend dibin .. waťeya ewê goťeyê diguhêrin..

an jî taybeťiyeḱe girîng didin waťeyan..

Lê ev alav û tîṕ û gîť , ji rêzimaniyê ře curecur dibin, hin ji wan pêṣgirin (pêṣḱoḱin) .. û hin jî paṣgirin (paṣḱoḱin) …û pêṣgir û paṣgir jî bi herdû beṣên xwe ve .. bi du curane , di rêbazên rêzimaniyê de bi du darêjan xwe dinasin :

1- ṕêgihêj (ṕêgeh) .

2- cihê (cuda).

Emê jî li gor evê danasînê..risťeḱe rêxisťî ji evan ṣiroveyan binasînin :

Alavên pêṣgir (pêṣḱoḱ) . . Alavên paṣgir (paṣḱoḱ) .

ALAV Û PÊGIHÊJ

1-Alav: bi-ji-jê-ta-li-di-ba-bo-ber-nêz-nêk-nêv-rex-ne-na-bêyî-pêvî-bilî-yê-ya-jî..û..w..

2-pêşgir û paşgir:

A-alav û tîp: boyî-li-pêş-paş-dû-jêr-jor-çend- eger-jî-di-xwe-ser-bin-...

Wek:

Ji boyî te	li wî
Li pêş giṣa	paş hina
Dû kerî	ser berjêr
Jora xanî	nêzî darê
Ne sare	çend sal
Eger tu here	
(jî-tîpa girêdanêye)	
Ji boy xwe bir	di hundur de

Ji nîvro t́a êvarê li ser avê

Li ba ḉem ji boy bavê min

Ber dîwar nêvbera du tiṣt́a

Rex derya nêḱ min

Bêyî avê emê bimirin

- Alavên pêṣgir (pêṣḱoḱ) : ew jî du curene :

1 - Pêṣgirên cihê : neṕêgehin.. alavên tekeziya karên wan jî hene , û ew alavên tekeziya karên wan bi xwe jî .. ṕêdivêye ḱu cihê bin .

2 - Pêṣgirên ṕêgihêj : ṕêgehin , serweriya (karjêder - navnîṣanan… û.. h..w..) bi wan desṕê dibe .. an jî wat́eyên nû (taybet́ - dijwat́e - cîwaz ..qetirme ..) an jî darêjeḱe nû peyda diḱin .

Lê pêṣḱoḱ bi giṣt́î .. wat́eyê naguhêrin , tenê darêjê nû diḱin û diguhêrin û rawaya wat́eyeḱe taybet́ dadimezrînin.

……..

PÊŞGIR

1-Weḱ:

Pêşgira " **ra-rû** (re)" : ev alav têvelî wat́eya got́e û bêjeyê şirove diḱe..

Mînaḱ :

- Hişt́in **ra**hişt́in
- Xist́in **re**xist́in
- Ket́ **ra**ket́
- Veḱirin **ra**veḱrin
- Kişandin **ra**kişandin
- Za **ra**za
- Sṕêr **ra**sṕêr
- Girt́ **ra**girt́
- Bûn **ra**bûn

- Ḱirin **re**ḱirin

- Niṣt́ **rû**niṣt́

.....

2-Weḱ :

Pêşgira " **ve** " : ev alav jî weḱe yên dît́ir taybet́iya wat́eyan daxuyan diḱe..

Mînaḱ :

- Şart́ **ve**şart́
- Hêl **ve**hêl
- Rijîn **ve**rijîn
- Xwar **ve**xwar
- Girt́ **ve**girt́
- Miranda **ve**mirandin
- Rês **ve**rês
- Şuşt́in **ve**şuşt́in
- Bû **ve**bû
- Ḱir **veḱ**ir

Dêmeḱ : " **ra** (re) – **ve** " :ḱu bûn pêşgirên got́eyan .. got́eyên duber hevbend diḱin..û bi herdû darêjên jîwerî ře çi kar û çi maḱ bi kar t́ét́in .

Ji we ře çend mînaḱ :

-Azad **ra**bû û derî **ve**bû :
(karê bûyinî ye)..ne ṕêwîśt́î berkare ..çiḱu Azad ji ber xwe ve rabûye , ne tukesî û ne tutiṣt́î ḱiriye ḱu Azad rabe .

-Min Aras **ra**ḱir û wî bi xwe derî **ve**ḱir :
(karê ḱirinî ye) ..derhingêve ,Aras bûye berkar.. çiḱu karê raḱirinê bi serê Aras haṕiye , min karê raḱirinê ḱiriye ́ta ḱu Aras rabûye..ne Aras ji ber xwe ve rabûye .

Azad ji ber xweve **ra**bû tu tiṣt́î an kesî ew **ra**neḱir, ..lê Aras min ew **ra**ḱir,.

Derî **ve**bû nepene(çawa **ve**bû-çi ew **ve**ḱir?) , lê Aras bi xwe derî **ve**ḱir pendiye..

T́êbînî: (ve) bi ṣêwezarê Soran dibe (we)

Mînaḱ :

- Vemalîn = wemalîn

.....

3- Weḱ :

Pêṣgira (**vê**) ḱu cihê be ew ṕênavê nîṣandanêye , boy nêz **û** mêye ..**û** di raweya berkarî de bikar t́êt́…

Mînaḱ :

- Ez vê darê dixwazim
- Hûn vê darê dixwazin

Lê dema ḱu (**vê**) ṕêgeh be .. taybet́iyê dide venasînê anjî wat́eyê diguhêre..

Mînaḱ :

- Ket́ **vê**ket́ **vê**ket́in
- Xist́ **vê**xist **vê**xist́in

Û ji (ve) verês dibe li gora ṣêwezaran..

Nimone :

- **Ve**xwarin = **vê**xwarin

Têbînî: (**vê**) ew jî tayê pêşgira (**pê**)ye , herdû pêşgir ji ciyokên hevbend (bi wî - bi wê) verês bûne..

Mînak :

- Ez bi wî ře çûm = ez **pê**ře çûm =ez **vê**ře çûm

- Agir bi kayê ket = agir **pê** ket = agir **vê**ket

- Tu bi wê ře hat = tu **pê**ře hat = tu **vê**ře hat

- hûn bi wî ve çûn=hûn **pê**ve çûn =
hûn **vê**ve çûn

Dema keça mest yarê dila dît riwê wê **vê**ře (**pê**ře) vegeriya (geş bû).

…….

4 - Weḱ :

Pêṣgira (**wer**) ..pêṣḱoḱeḱe ṕêgehe , pêṣgira kar t́êt́ , û mîna hemû alavên pêṣgir ew jî hevwat́eyeḱe duber ava diḱe û danasîneḱe nû peyda diḱe ..

Mînaḱ :

- **Wer** + girt́in = **wer**girt́in
- **Wer** + dan = **wer**dan
- **Wer** + ḱir = **wer**ḱir
- **Wer** + geřand = **wer**geřand
- **Wer** + bûn = **wer**bûn

T́êbînî: eger alava (wer) bi wat́eya biryara karê hat́inê be , an jî bi wat́eya (wilo - wisa - weha - halo - wanîḱo - ….h…w..) be ..ew ne alave ..di evê wat́eyê de bêjeye, çiḱu hevbendiya du got́eyan..an du bêjeyan …navê ḱaraḱî an jêdereḱî an pesindeḱî… ..h…w..ava diḱe , dibe ḱu bersiveḱê bide

nasîn û ne pevgihêj be jî..û ev ne mebesta meye …

Mînaḱ :

-Weravt́in - wereyeḱ-werçû(wehaçû)
-Wer bazda (wilo bazda) - rûgeṣ
-Rêbazî - ṣahnazî…

……

5-Weḱ:

ALAVA BERDEWAMIYÊ

Pêṣgira " **di** "ḱu ṕêgihêj be ..ew alava berdewamiya kare ,

Nimone:

- Çilo ji darê **di**weṣe = ew ji wê **di**weṣe

- Ardiwê me **di**ṣewiťe - hûn **di**bêj**in**

- Ez dujminan **di**ḱuj**im** - ťu **di**bezî

Û alavên teqeziyê (erênî) jêře ew alavên teqeziya ṕêrnavên bi alavin ,

Ṕêrnavên bi alav:

Ez - ťu - ew - em- hûn -ew+(ên-in-an)

Alavên teqeziyê

(im - e - î- in) boy wanin

Mînaḱ :

- **Di**ṣewiṫe
- **di**bêj**in**
- **Di**ḱuj**im**
- **di**bezî

Lê di dema buhêrḱî de û di bersiva dûxa kar de û bi karê derhingêv ře.. teqezî ne gereḱe, çiḱu ṕêrnavên xuřû..bêyî alav ṕêře bikar ṫên..

Mînaḱ :

- Min serdana Şêrîn **di**ḱir

****

Ravekirinek :

* Ji mînakên derbasbûyî xuyan dibe ku mebesta min ji alavên teqeziyê.. hebûna kara(kirar) şirove dike,lê ku ew alavana bi pêrnavê xurû re hatin wê çaxê teqeziya dûxa (raweya) berkar (pêkar) didin..

Nimone :

-Min **dijmin** tev **di**kujtin .
-Te **silavên** germ boy min **di**şand**in** .

-Wî ji ber talanan **zarokên** xwe tevde **di**hiştin..

-Pirên caran **te** ez **di**hiştim û **te** **di**çû ji gulîstanê **gul** **di**çinîn.

Lê ku pêşgira " **di** " ji kar cihê be ew wê tîpeke pêbest be û alava teqeziya pêbestiya wê " **de** - **re** " dikeve dawiya axavtinê de,û

("**de-re** " dibin paşgirên cihê).

Mînak :

- Şiyar **di** Amûdê **re** hat - çû.....
(derbasî) ..bê rawestane..

- Çeto dujmin **di** şikeftan **de** girtin (mayinî) ..bi rawestane..

- **Di** pertûka min **de** çend rêzimanî hene ..(mayinî)

-**Di** newalê **ře** řeviyan.. (derbasî)

-**Di** despêkê **de** min tu nas nekir .. (mayinî)

.....

6-Weḱ :

ALAVA AYINDÊ

Pêṣgira " **bi** " ḱu ṕêgihêj be ew alîkara ayindê û biryarêye ..û ji (bib) darêj bûye,..regez jî (bûn-bûyin)e ..

û ḱu li pêṣî haṕ..çênabe ḱu karê bûyinê li dawî jî dûbare bibe ..

Mînaḱ :

- Minê biḱujt́iba…. " ṣaṣe "

- Minê ḱuṣt́iba ..an minê biḱuṣta…" rast́e"

T́êbînî :

Dengê (z) ê bilind (s)ye , û dengê (j) ê bilind (z)ye , balo (j) ji (z) hat́iye û xwe bi (ṣ) jî diguhêre .. lewra ḱujt́in bûye ḱust́in.

Di **BÛRÎ** de alava erênî jê ře " **a** " ḱet́eye û " **ana**" kome .

Mînaḱ :

- Hozan ê wê **bi**xwar**a**

Wê sêveḱ (tiṣteḱ) bixwara

- Şivan û gavanan wê **bi**dît́**ana**

Wê hûn(ew - em) bidît́an

Di **AYINDE** de alavên teqeziyê.. ew alavên teqeziya ṕêrnavên bi alavin..

Nimone :

- Ez ê (dê) **bi**rev**im**

- Ahîn a (wê) **bi**st́ir**ê**

(-ê-verêse ji -e-)

- wê Şervan **bi**bêje

- wê Rêzgar got́arê **bi**xwîn**e**

Di **BIRYARÊ** de " **bi** " li gora darêjê erênî jêře heye..

Mînaḱ :

- Bila Siwar **bi**xw**e** - hûn **bi**xu**n**
- Min bi tenê **bi**hêl**in** - **bi**řev**e**
- Ji wan **bi**sťîn**e** - de **bi**xwîn**e**

Lê- ezê xwe **bi**wesťîn**im**…ji (ezê xwe wesťiyayî biḱim) haťiye ..lewra ḱirin û bûyin jî pev ře nabin, mînaḱa jor govayê dide..

***** Balo ḱu pêṣgira " **bi** " ji kar cihê be bi nav dibe tîpa pêbesť û erênî ya wê " **be-řе-de -ve**" di dawî de bi cî dibin.

(" **be- řе-de-ve** "paṣgirên cihêne)..
" **be** " boy ḱeťe û " **bin** " boy komêye .

Di bûrî û nuhoḱ û ayinde de bi her darêjan ťêť.

Mînaḱ :

-Ťu **bi** min **ře** hať

-Ťê **bi** min **ře** bihaťa

- **Bi** min **be bi** ́te **be**

-Ť́u **bi** min **ře** ye

- Ť́ê **bi** min **ře** bimîne

- Bi serfirazî **be**

- Hûn **bi** Şêro **ře bin**

- Şiyar **û** Şervan **bi** xwe **bin**

****

Têbînî(1) :

Ku tîpa pêbest "**bi** " pêşgira gotya"**hev**" hat..lêvkirin tawang (verês) dibe, û bilêv dibe " **pev** , dêmek (b) bi (p) hatiye guhertin ..axavtin pê zelal û şayik dibe ..û bi her darêjên demê re kêşan û rêje natên guhertin.

Mînak :

-Azad û Çeleng **bi hev re** çûn = herdû **pevre** çûn

-Em **bi hevdû re** çûn = em **pevdûre** çûn

Lê- ku tîpa pêbest " **bi** " berya pêrnavê "**wî - wê** " an jî mîna evê darêjê hat ,lêvkirin kurt têt û dibe " **pê** "... dîsa (b) û (p) pev hatine gûhêrtin.

Mînak :

-Min **bi** Aştî **re** xwarin xwar = min **pêre** xwar

-Gulê **bi wî re** çû = Gulê **pêre** çû

-Bi hev ře çûn = pevřeçûn

-Bi hev ketin = pevketin

-Bi hev çûn = pevçûn

(" ê " ciyê nav û pêrnavê "wî - wê " girt).

Têbînî(2) :

Ku tîpa pêbest " di " pêşgira " hev " hat dîsa tawang (verês)dibe û bilêv dibe "tev " û bi her darêjên demê re.. her waha jî gote pê zelal dib, û ev rawanbêjiye..dêmak (d) û (t) jî pev têne guhertin .

Mînak :

- Di hev derbas bûn = tev derbas bûn

Lê- ku tîpa pêbest "di " berya pêrnavê ketê nedyer "wî -wê " an jî " nav " di dûxa berkar û palvedêr de be ..lêvkirin kurt têt û dibe " tê " .. û di hemû darêjên hevokê de weke xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ez **di wê rêyê** ře çûm = ez **ťê** ře çûm

- Sîrwan **di şḱefťê** de bû = Sîrwan **ťê** de bû

- Hejar **di hundir** de bû = Hejar **ťê** de bû

("**ê** " ciyê **nav** û ṕêrnavê " **wî - wê** "girťû ṕêrnav nepen ḱir).

Řavekírineḱ :

* (**Di**): di berdewamiyê de dudarêje..

1- di darêja erêniyê de pêṣgira ṕêgehe û bi regezê kar ve digihêje ..û alavên pêṣgir li ṕê (li dû) xwe dihêle ..

Nimone:

-Ra**di**keve - ve**di**xwar

-Ve**di**ṣêre - hil**di**kiṣe

-Wer**di**gerîne - ve**di**ḱe

2- di darêja nerêniyê (nayinê) de ..alavên nerêniyê (**ne – na**) xwe ṕê diguhêrin..

Nimone:

- Ra**di**keve = ra**na**keve
- Ve**di**xwe = ve**na**xwe
- Ve**di**şêre = ve**na**şêre
- Hil**di**kişe = hil**na**kişe
- Wer**di**gerîne = wer**na**gerîne
- Ve**di**ḱe = ve**na**ḱe

*(**Bi**): di ayindê de bi (**ne – na**) ťê guherťin, ḱu bi karê regez řebe..lê – bi karê jêder ve nepene …

Nimone :

- **Bi**lezîne = **ne**lezîne = **na**lezîne
- Vexwe = ve**ne**xwe = ve**na**xwe

……..

7- Weḱ:

Pêṣgira"**da** " : ṕêgihêjeke pêṣgire , di pêṣiya got́eyê de t́êt́, û got́eyeke nû û hevbend (hevdudanî) dadimezrîne ..

berjêriyê vedinase..

Mînaḱ :

- **Da** + xist́ = **da**xist́
- **Da** + ket́ = **da**ket́
- **Da** + hat́ = **da**hat́
- **Da** + biř = **da**biř
- **Da** + rêj = **da**rêj
- **Da** + ḱir = **da**ḱir
- **Da** + weṣand = **da**weṣand
- **Da** + mezrandin = **da**mezrandin

Têbînî :

Ku" da"(*) bi wateya dayinê an (boyî) hat ew goteyeke , têvelî (cudayî) mebesta alava " **da** "ya xwesteka me dide ,çiku "da"ya gote kare..lê "**da**" ya alav tîpeke bi tenha xwe bê wate ye..

Nimone :

- Hejar guleke sor **da** min

Di evê hevokê de " **da** "bi wateya dayinê ye û ji pêrnavê (min) cihê ye.

-Kawa gepa xwe **da**qurtand

Di evê hevokê de " **da** " alave, darêjeke hevbend peyda dike.

.....

(*)-di hin şêwezarên kurdmancî de " da " bi piřanî wek ku goteyeke xurû bi kar têt.. (bi wateya "ta" û 'heta" bikar tê).

8- Weḱ:

Pêṣgira" **hil** (hel)" pêṣgira kare û pêgihêje, di pêṣiya goteyê de tết , û goteyeke nû û hevbend û jêder ava dike û bi wateyeke cuda..

Mînaḱ :

- **Hil** + peḱandin = **hil**peḱandin
- **Hil** + bijart́ = **hil**bijart́
- **Hil** + weṣand = **hil**weṣand
- **Hil** + kiṣiya = **hil**kiṣiya =helkiṣiya
- **Hil** + digire = **hil**digire =heldigere
- **Hil** + pijiqî = **hil**pijiqî =helpijiqî

Tếbînî:

" **hil** " mîna hemû alavên dîtir, dema ku dibe pêṣgireke pêgihêj taybetiyekê dide wateya gote û bêjeyên ku bi giṣtî bin..

Nimone :

- Min bi berjor de kiṣand, an bi berjêr de , an serrast , an bi ber baṣûr de , û her weha.....

(kareḱî serbesẗe û bi giṣẗîye)..

- Min bi berjor de hilkiṣand.., tenha boy jore.

(kareḱî taybeẗe û waẗeya wî jî taybeẗmende).

.....

9-Weḱ :

Pêṣgira "**li** "pir waṫe ye ḱu hevbend be, ew tîṕeḱe ṕêbesṫe ,û cihê ye ..

Mînaḱ :

- **Li** ser xaniyê me
- **Li** bajarên dûr
- **Li** nêḱ min (li rex min)
- **Li** jora Ḉiyayê Kurdisṫanê
- **Li** bin siya darê

Lê **-** alava" **li** "ḱu bibiṫ pêṣgira ṕêrnavê" wî-wê"

verês(tawang)ṫêṫ û dibiṫ " **lê** ", herweḱî ḱu **ji**+**wî** an **wê** = **jê** .

Mînaḱ :

- **Li** + wî = **lê**
- **Li** + wê dan = **lê**dan
- **Li** + wî bûrîn = **lê**bûrîn

- **Li** + wê man = **lê**man

Dêmeḱ" **li** wî cî" **û** " **li** wê malê" **û** "**li** wê derê", bi nenasî dibe " **lê** " ,balo- **ê** - ciyê (wî cî -wê malê- wê derê) digire ..

Ťêbînî :

boy tawangê (verêsê) ..di darêja
hevoḱê de ḱu nav rewṣ be.. **û** pendî be ,
bi taybeťî tîṕa " **a** " ťêde verês nabe..

Nimone :

- Ez çûm **a**ṣê bajêr

- Ew çû **a**ṣê gund

Tîṕa "**a**" di aṣ de weḱe xwe ma çiḱu nas **û** pendiye, **û** tîṕa "**a**" di bajar de bû "**ê**" çiḱu bajar nenase (kîjan bajar? çi bajar ?).. taybeťiye..

Lê - ḱu nav nenas **û** nepen be tîṕa "**a**" verês (tawang) dibe **û** dibe "**ê**",.. bitevayiye(giṣťiye)

Nimone :

- Ez ji **ê**ṣ vegeriyam

- Ew çûye êṣ

Tîṕa " **a**" ťewiya (verês bû) û bû "**ê**" çiḱu aṣ di evê darêjê de giṣťiye ne taybeťe,

Çend Mînaḱ:

Mînaḱên ṣaṣ

-Bajêrê Amûdê

-Nênê Sêlê

-Arvênê xwe ji aṣ ťîne

-Ardû dide agir

-Êṣê genim

Mînaḱên durusť

-Bajarê Amûdê

-Nanê Sêlê

-Arvanê xwe ji êṣ ťîne

-Êrdû dide êgir

-Aṣê genim

Ťêbînî :

Tîṕên ṕébest́ (bi kêṣe) tevde (hemû) cihêne.. û li gora raweya tîṕa (li) bikar t́ên.. (bi - di - ji "jê"- li "lê"…).. û alavên teḱeziya wan jî li dawiya kar cihêne ..(be - de - ře - ve …).

.....

10 – Weḱ:

ALAVÊN NERÊNIYÊ

Pêṣgirên (**ne - na**) nerêniya kar dinasînin ..û bi řaweyên hevoḱê ře darêj dibin ..

Mînaḱ :

- Dikene **na**kene
- Giriya **ne**giriya
- Saẍe **ne**saẍe

Pêṣgira (**ne**) ji hevoḱa bûrî ře bikar t́êt́..

Nimone :

- Ket́ = **ne**ket́
- Çûye = **ne**ç̣ûye

Di bûriyê berdewam de ..bi **(di)** ře t́êt́..

Nimone :

- Dixwar = **ne**dixwar

- Dikeniya =**ne**dikeniya

Pêşgira (**na**) ji nuhoḱ û ayinde ře bikar t́êt́..û xwe bi (**di – bi**) diguhêre..

Nimone :

- **Di**xwîne = **na**xwîne
- **Di**beze = nabeze
- Wê **bi**reve = **na**reve
- **Bi**st́irê = **na**st́irê

T́êbînî :

Di karê hevbend de ..ḱu bi pêşgir be (**ne - na**) xwe bi karê resen digihînin û pêşgirê li ṕê xwe dihêlin..

Mînaḱ :

- Raket́ = ra**ne**ket́ (bûrî)
- Radikeve = ra**na**keve (nuhoḱ)
- Wê rakeve = ra**na**keve (ayinde)

Di biryarê de,ne ṣaṣe ḱu (**ne**) bibe (**me**) .. **û** di ṣêwezarên kurdî de ev darêj peydaye .

Nimone :

- Meḱuje - meřeve - meyê -bazmede- mavêje – metirse….h..w ….

Piř darêjên řavekírinê di ***waneya*** *nerêniyê de berfireh ṣirove dibin..*

…….

11- Weḱ:

Pêṣgira (**î**) pêṣḱoḱeḱe ṕêgehe, ṣûngira ṕêrnavê nîṣandanê yê cihê (**vê**) **û** mêye , tenê boy navên (roj-ṣev-sal-car..) bikar t́ê **û** ṕêgeh dibe.

Mînaḱ :

- **Vê** ṣevê = **î**ṣev
- **Vê** rojê = **î**roj (îro)
- **Vê** salê = **î**sal
- **Vê** carê = **î**car (îca)

T́êbînî :

Alava (î) bûye pêṣgira ṕêgihêj , çiḱu mîna tîṕeḱe resen **û** xwecî holisiye.

……

AGAHDARIYEḰ

Ev pêṣḱoḱên ḱevan ḱirî (hev-pev-tev-jev-paṣ-rê-der-du-dû-cî-cê-nav-rû-ser-ba-ta..h..w..) goṫe û bêjene (bi hemû raweyên xwe),..ne alavin , bi bêjeyeḱe dîṫir ře hevbendiyê ava diḱin û dibin(nav- ḱaranav-pesind- rawe..h..w..), ẹiḱu ew bêjeya nû ḱu bi wan ava dibe ..waṫeyeḱe cîwaz (têvel) dide ..û alavên nerêniyê (neyinê) dibin pêṣgirên wan jî.. û dibin navbiřên wan û goṫeya hevbeṣî wan..

Mînaḱ :

-Hevkar - pevçûn - tevdan - paṣbend - rêzan - derdor - dubeṣ - dûbare - cîgir - navdar - rûgeṣ - serhildan - baḱur - tagir … h …. w …

(Peř) jî bêjeyeḱe ..

Weḱ : pervîṫî- perćiqî- perṕiṫî- peřćivî

…….

PAŞGIR

Alavên paşḱoḱ(paşgir) du beşin …
(ṕêgihêj) û (cihê).

Alavên paşḱoḱ bêjeyên (goṫeyên) lêḱdayî (hevbend) peyda diḱin (nav- ḱaranav- rengdêr- jêder- rawe- kar- ḱara..h..w..).

Cureyên paşgiran :

Pénc cureyên rengareng(curbecur) ji paşgiran ře hene:

I- Paşḱoḱên teḱeziyê : pir celebin..

1-Teḱeziya karên ṕênavan:

Alavên ṕênavên alavxwaz (**im- î- e- in**) paşḱoḱê karin ..ṕêgihêjin..

Mînaḱ :

- Ez ji dar keṫ**im**

- Ť̀u dixwî

- Ew biçe(here)

- Em-hûn-ew+(ên-an) reviyan.. haťin

Di hin ṣêwezaran de (eť-êt) li ciyê hinan bikar ťên..

Nimone :

- Ť̀ê = ťêť bê = bêť

- Dibêje= dibêjeť hebe = hebeť

Ť̀êbînî:

Karê pȅrnavên xurû {min- ťe- (wî,wê)- me- we- wan} ji xwe ve tekȅzin û tenê bikarê kȉrinî ře di darêja bûrî de ťên ..çikȕ ciyê kȁra û nav digirin, lê- di nuhokȁ û ayinde de bi raweya berkar ťên..(ên alavxwaz jî berkar ťên),di evê řaweyê de jî..bi alavên tekȅziya tîpȇn pȇbesť û pȇgehnavan waťeya karê wan tekȅz dibe (tekȅziya wan tekȅz dibe) û ev darêj bi xwe tekȅzkȉrina tekȅziyêye..

Mînaḱ :

- A ťeye - vê cejnêye
- Ên minin - wê mehêye
- Boy ťene - bi ťe řeye
- Ez birîndarê ťeme - ji wî řeye

2- Teḱeziya tîṕên ṕêbesť :

Tîṕên ṕêbesť [di- bi- ji- li…] alavên teḱeziya wan cihêne û ew jî evin [**de- be- ve- ře (řa)**..], piṣťî nav û ṕêrnav ťên..

Mînaḱ :

- Ji Salar de bi Aras ve
- Di perťûḱê ře li bajêr be

{ře(řa)- ve} paṣḱoḱên nav û ṕêrnavan ťên û berkaran bi wan peyda diḱin..

Nimone :

- Ji Şêro ve bi Hemrîn ře

-Ḱu di bûrî de teḱeziya wan tîṕan û ên ṕêrnavan pev gihijt́in û raweya merc û nîrî be ..(ba) bi dû wan de t́ê..

Nimone:

- Eger bi min ba

- Ḱu bi t́e ba

Tîṕa bûyinî (ba) bi řaweya dema bûrî û bersiva ṕêgehnav ře xwe guhert́iye ,.. û ṕêgehnav jî evin (eger- ḱu- lê- hey- ..h..w..)

- Ḱu ṕêrnavên nepen bin an jî pendî bin teḱeziya bûna karê wan di bûriyê berdewam de bi evan alavaye (ma- a "ya"- na) û ev rawe bersiv û saloxe,mercî û nîre û paṣḱoḱ jî ṕêgehin..

<u>Mînaḱ :</u>

- Li ba t́e bama (bersiv û saloxe)

- Ez haťibama ba ťe (bersiv û saloxe)
- Bi ťe dana (bersiv û saloxe)
- Eger ji min baya (merc û nîre)
- Ḱu ťu baya (merc û nîre)

Lê- di nuhoḱ de teḱeziya arziyê bi (me- ne -î - e"ye") li ṕêrnav vedigere û ev alav jî ṕêgihêjin.

Mînaḱ :

- Deh sêvên ťene
- Ez bi ťe řeme
- Ya wiye
- Ew direve
- Ewana, hûn ,em dudune
- Ez bi tenême
- Ťu li jorî
- Ew ji ťeye

3-Pêgehnav:

Pêgehnavên pêşgir (**ê ,"yê"- a , "ya"- ên ,"yên"- êd ,"yêd"**)..ku li pêşiya nav û kara û pêrnavan hatin .. û bersiva tekeziya arziyê li wan vegerandin (ciyê nav û tişt girtin û ew nepen kirin).. ewê cihê bin, … lê ku bûn paşgirên nav û rewş û pesind û řaweyan ..û arzî li nav û kara û pêrnavan vegerandin ..ewê pêgihêj bin..

Nimone :

- Destê mine = **ê** mine

- Serfiraziya Kurdan = **a** Kurda

- Gurên dev bi xwîn = **ên** dev bi xwîn

-Serok û rêberêd me = **êd** me

-Hempaziyêd dijmin = **yêd** dijmin

-Terş û talanid xwe = **êd** xwe

- Keça wî..kuřên wan..lawêd we..

çiyayên bilind..hespin qimer

(**a- ên- êd- yên- ên**)

Ê "**yê**" boy nêrê ḱeṫeye

A "**ya**" boy mêya ḱeṫeye

Ên"**yên**" û **êd** "**yêd**" boy komiya nêr û mêye

Rêzanîneḱ : karmendî û raweyên **(ê)**…

1- (ê): nîṣanḱa mêye mîna (o) ḱu nîṣanḱa nêre ..

Weḱ :

Zînê - Memo

2- (ê): alava danasîna nêre û bi navê nêr ře
hevalbende.. mîna (a) bi navê mê ře ..

Weḱ :

Karê me - ḱeçḍa kurd

ḱu piṣṫî nav rewṣeḱ haṫ (ê) paṣgira nav ṫêṫ û alavên teḱeziya p̀ênavêd koma (ez) paṣgirê rewṣan ṫên..

Weḱ :

Beranê qere - mîha ḱele

3- (ê): ḱu cihê be alava teḱeziya arziyêye..

Weḱ :

Hesṕ ê meye - bizin a meye

4- (ê): ḱu navê ḱarayê berkareḱî mê be di bûrî de..

Weḱ :

Mîheḱê gon xwar

5- (ê): ḱu nav berkarê eṣḱere û mê be û darêja dema nuhoḱ be..

Weḱ :

Şêrzad ḱeçeḱê dixwaze

6- (ê): ḱu nav berkareḱî nedurisṫ be hemû dem weḱe hevin..

Weḱ :

Şêro li ḱeçeḱê dinerî - dinere

7- (ê): ḱu cihê be ṕênavê ṕêgihîjt́inêye ..

Weḱ :

Ê ḱu ez birim - ê ḱu min dixwaze

8- (ê): kareḱî awarteye..ji ênanêye

Weḱ :

Ezê êm - t́ê(t́uyê) ê

9- (ê): kurt́iya alavên ayindê (dê-wê) t́êt́..

Weḱ :

Ewê bixwîne - emê herin

10- (ê): ḱu nav bersiv û saloẍ be û mê be (ê) paṣgire û ṕêgehe û dibe alava danasînê ..

Weḱ :

Roja înê - ṣeva sersalê - ḱeḉa malê

4- Komî :

(**an-ên**) dûvgirin ṕêgehin boy komêne

Mînaḱ :

- Mêr**ên** - jin**ên**

- Jin**an** - mêr**an**

5- Teḱeziya nîṣannavan :

Alavên teḱeziya nîṣannavan(**han-ha-he-hana**) boy dûr û nêzin..teḱeziya ṣanîdana navên nîṣandanêne,weḱî çawa ḱu (**dît́ir -din- dî**..) boy (**hin-hinên**..) ḱu nîṣandeḱên tibabin..teḱezîne,..

Mînaḱ :

- Ew mêrên **han**

- Ev jina **ha (he)**

- Ewan keçḱên **hana**

-Mêrên **din (dî)**

- Hinên **dît́ir**

****

II-Alavên samandariyê :

Waťeya heyinê li xwedî vedigerîne û mafê arziyê dide wî xwedî.

1- (**a**): alaveḱe paṣgire û ṕêgihêje, dibe dûvgira kar ..da ḱu ḱaraḱî peyda bike.

Mînaḱ :

- Zan**a**- ḱar**a** - xwend**a**

Di hin ṣêwezaran dedengedara (a) bi dengê (**e**)verês dibe ..

Nimone :

- Zan**e** - ḱar**e** - xwend**e**

2- (**ar**):alaveḱe paṣḱoḱe û ṕêgehe, paṣgira nav t́ê û ḱaraḱî ava diḱe ..

Nimone :

- Got**ar**-ḱevn**ar** -xew**ar**

3- (**at- dar)** :ku paşkokên kar tên ..rewşa kara ava dikin..(wateya xwedîtiyê didin)..û dibe ku (at) ji (**hat**)verês bûye..

Mînak :

- Dî**dar** - jiyan**dar** - div**at** - hil**at**.

Lê ku dûvgirên nav hatin ..karanavekî ava dikin..

Nimone :

- Dil**dar**- ol**dar**- biny**at**- mal**hat** (mal**at**)
- Fer**at** .

4- (**bar**): paşgireke pêgehe nav dike karanav.

Mînak :

- Tawan**bar**- co**bar**- rû**bar**

5- (**mend**): nav dike rengdêreke mîna kar û bi wateya bikêrhatinê têt.

Mînak :

- Hiş**mend**- huner**mend**- kar**mend**

6- (**yar-wer-wir**): paşgirin pêgehin ..nav dikin kara.

Mînak :

- Cotyar- hişyar- bîrawir- cinawer
- Omûdewer- bextiyar-bextewer .

7- (**baz**) : pêgeha nav tê û navekî hevbend (karanavekî) hîmde dike .

Mînak :

- Hunerbaz- rêbaz- şêwebaz
- Ciwanbaz - canbaz

……..

III-Alavên kar û pîşe :

Waťeya ḱirina kareḱî dinasînin.

1-(**ḱer- ḱir- kar- er**) : paşḱoḱên nav ťên û ḱaranaveḱî ava diḱin.

Mînaḱ :

- Zêr**ḱer**- zêr**ḱir**- kar**ḱer**- kar**ḱir**
- Nivîs**kar**- şêwe**kar**- ťêkoş**er**
- Xebať**kar**- nivîs**er**- bîn**er**- lêkol**er**
- Coťk**ar**- coť**ḱer**- koç**er**- hesin**kar**.

2- (**van- ṕêj- jen**): paşgirên nav ťên , ḱara ava diḱim.

Mînaḱ :

- Derge**van**- bilûr**van**- nan**ṕêj**- narîn**jen**
- Av**jen**..

Di hin şêwezaran de (**van**) bi (**wan**) ťê guherťin.

Nimone :

- Şêr**wan**- Sîr**wan**- Ḱar**wan**..

3- (**ger- gêr**): dibin dûvgirên nav **û** ḱaraḱî peyda diḱin..

Mînaḱ :

- Şoreş**ger**-dem**gêr**

- Wer**gêr**-leş**ger**(leşḱer)

4- (**gan- gîn**) : břiḱin paşgirê nav ťên **û** navê ḱara ťînin hebûnê..

Mînaḱ :

- Bazir**gan**- wer**gan**

- Xem**gîn**- mizgîn

……

IV- Alavên cî (deverê):

Cî û devera hebûna tiştan dinasînin.

1-**dan**(**dank**): lidû nav tê, pêgehe..û navê ciyekî şanî dide.

Mînak :

- Xwelî**dank**- gul**dank**- av**dan**- rê**dan** .

2- **ga**(**geh**): navê ciye, dibe paşkoka nav.. û bi taybetî boy hişdare .

Mînak :

- Kar**geh**- noş**geh**- derman**geh**

- Nij**ga**- xwende**ga**- seyran**geh**

3- **stan** : paşkoka nave,bi navê komelan re tê û wargeh û welatan jê dinasîne.

Mînak :

- Kurdis**tan**- Gurcîs**tan**

- Moris**tan**- Bîmaris**tan**

Dêmeḱî nijad û tuxûban bi cî û war diḱe.

4- **wend** : paṣḱoḱa nav ́tê û navê ciyeḱî dide nasînê.

Mînaḱ :

- Sema**wend**(zema**wend**)

- Ra**wend**- ro**wend** .

5- **xane** :paṣgira nav ́tê lê mexabin di hin ṣêwezaran de bi girêdanên hiṣmendiyê ře bikar ́tê û ev ṣaṣî û nezaniye

..,çiḱu ev alav boy bêmejiyan bikar ́tê.

Nimone :

- Peŕtuḱ**xane-** mey**xane** .

Ť́êbînî:

Dema em bêjin : dermanxane ..dêmeḱî

ciyê dermanê lawiraye..mîna dewar û ṕez,

û dema em bibêjin : dermangeh..boy mirovan ́têt́e nasîn

Lê ya herî balkêṣ ewe ḱu (geh) berferehṫire, ango (xane) waṫeyeḱe taybeṫ dide û (geh) waṫeyeḱe gelamperiye berferehe .

6-zar: paṣgira navên xuristî ṫê û ciyê komeḱê dinasîne..

Nimone :

- Gul = gulî**zar**

…….

V- Alavên karmend :

1- **ayî- ahî- tî** : pşgirên nav û pêrnav û kra tên, teva dikin rengdêrên makî(koka rewşê).

Mînak :

- Şînayî- ronahî-biratî

- Koletî- xwehitî- dûrayî

Û (y) navbiřa du dengdaran hatiye, lê (h) di hin şêwezaran de mîna(cezîra botan) şûngira (y) hatiye.

2- **ajo** : di hin şêwezaran de paşgira nav têt û raweyekê ravedike.

Mînak :

- Pêvajo- derajo .

3- **ane-anî** : paşgirên navan tên , rewşekê dinasînin..

Mînak :

- Rojane- mêranî- xortanî

- Kes**ane**- kurd**anî**- sal**ane**

4- **ber** : kurtiye ji (bar) ji navan ḱaranavan peyda dike..

Mînaḱ :

- Rec**ber**- tawanbar

5- **der-dêr** : paṣgirên nav t́ên û ḱaranavan ava dikin..

Mînaḱ :

- Jê**der**- rê**der**

- Renge**dêr**- denge**dêr**

6- **in-eḱ** : alavin dupîṣene..

A- rewṣa dikin ḱaranav:

Nimone :

- Şêraniy**in**- ṣêraniy**eḱ**

B- navan kom û ḱet́ dikin :

Nimone :

- Hesṕin- hesṕeḱ

Çiḱu (eḱ-in) nîṣandeḱên nenasiyêne.

7- ê : paṣgireḱe pirkare ..,

A- bi nav ře nîṣanḱa mêye û ṕêgehe..

Nimone :

- Ḱeḉê got́- Cîhanê dît́ .

(o) jî nîṣanḱa nêre, weḱ : Siwaro- Hevalo- Şiyaro- Ciwano..

B- nîṣanḱa berkarê nepene ..çi mê û çi nêr,..

Nimone :

- Min got́ê(min jêře got́) =
min ji (wî-wê)ře got́

C- nîṣandeḱa ṕêgehnavê nêr û nasînêye, herweḱî ḱu (a) nîṣandeḱa ṕêgehnavê mê û nasînêye..

Nimone :

- Hesṕê me = ê me , (nêr)

- Şêrê zozana = ê zozana , (nêr)

- Stirana xweṣ = a xweṣ , (mê)

- Civata zana = a zana , (mê)

Têbînî :

Di komî de nêr û mê ninin, wek:

- Civatên jina û civatên mêra

- ewan jina û ewan mêra.

8- êd-ên-êt : alavên komîne , di raweya palvedariyê dene,

Mînak :

- Kewêd me- ṣêrên çiyê- hespêt min ..

9- î : paṣkoka nav tê û karakî an jêderekî an raweyekê an rengedêrekê peyda dike..

Mînak :

- Dizî- azadî- bajarî- xizanî

- Şahî- dîtî- mirî- xuyanî

- Şaşî- pişt́î- şiyarî- biřî

10- **iḱ** : paşgira nav t́ê û biḉûḱḱirinê dinase..

Mînaḱ :

- Dar**iḱ** - gir**iḱ** - reş**iḱ** - şal**iḱ**

- Ḱar**iḱ** - şût́**iḱ** - hol**iḱ** - st́ê**riḱ**

11- **în** : nav diḱe rewş(rengedêr)..

Mînaḱ :

- Gula zêr**în**- rengê hingiv**în**

- Asîmanê jor**în**- qat́a jêr**în**

12- **iḱî** : paşgira nav t́ê û rewş an dûxeḱê ava diḱe..

Mînaḱ :

- Pişt́**iḱî** ket́in- şiṕya**ḱî**

- Ḱurman**ciḱî**- cewdi**ḱî**

13 - **oḱ-oneḱ** : paṣgirên rewṣan t́ên û dibin rewṣên ḱaranavan…

Mînaḱ :

- Fiř**oḱ**- balîz**oḱ**- ḉiv**oneḱ**(ḉivoḱ)

- Bizd**oneḱ**- tirs**oneḱ**- lez**oḱ**

T́êbînî:

(oneḱ) bi piranî kurt́ û verês dibe û (**oḱ-eḱ**) bikar t́îne…

Nimone :

- Revoneḱ = rev**eḱ** = rev**oḱ**

- Tirsoneḱ = tirs**eḱ** = tirs**oḱ**

- Bizdoneḱ= bizd**eḱ**=bizd**oḱ**

- Wêroneḱ = wêr**eḱ** = wêr**oḱ**

14- **wî** : rewṣeḱê an raweyeḱê bi nav ře ava diḱe..

Mînaḱ :

- Ta**wî**- ba**wî**- rêwî- ka**wî**

15 - **em-emîn** :paṣḱoḱên hejmarê t́ên,
rewṣeḱe ḱarayî ava diḱin

Mînaḱ :

- Yeḱ**emîn**- ṣeṣ**em**- deh**em**..

16- **ç**e : paṣgira nav t́ê û biċ́ûḱ diḱe..

Mînaḱ :

- Xalî**ç**e - keman**ç**e - daman**ç**e

17 - **end**e : paṣgira rewṣeḱê an naveḱî t́ê û
ḱaranaveḱî peyda diḱe..

Mînaḱ :

- Gewzende - ferzende

……

Tîṕên pevgirêdanê ên sade û hevbend:

Herdû- (her-dû) hevbende

Herḱu-(her-ḱu) hevbende

Herçi-(her-çi) hevbende

Herçend-(her-çend) hevbende

Çima(çiři)-(çi-ma-çi-ri) pevgirêdane

Heçî ḱu-(heçî-ḱu) pevgirêdane

Eger çi-(eger-çi) pevgirêdane

Viyê -(vî - ê) hevbende

(Bi) : tîṕa xemlêye : dikeve ser karê ayinde

Weḱ:

Dê bidim t́e..

(T́ir) : tîṕa birûmet́ ḱirinêye

(Lê) : tîṕa pevgirêdanê a sadeye

(Ta) : tîpa palavedêre

(Ji-li-bi-di) tîpên pêbest û palavedêrin

(viya-vêya-viyê-vana) ji nêz ře navên nîşandanêne

(wiya-wêya-wana) ji dûr ře navên nîşandanêne

……..

AGAHDARÎ

Dibe ḱu min hin alav (çi pêṣgir..çi paṣgir) ji darêjên hemû ṣêwezaran perû nekiribin, ew jî mîna ewan raweyên derbas ..t́êne darêjt́in..an jî xwendevanên xoṣewîst́ û bi rûmet́ dikarin binasin û ṣirove bikin , çikú ev ne biryareḱe ṣahaneye .

……..

Hojînî(berhev) :

Hevokên kêm bi tîpên palvedarî durust bikî:

Wekî:

Ez(li)malim

Sûnda min (bi)xwedan

Ez hatim (ba) wan

Ji amûdê (ta)qamişlo

Gir(bi)gir geriyam

(ta) gihiştim (serê) çiyayê bilind

Bazinekîî(ji) zêr kire destê xwe

Ev sol (ya)mine

Ev kar (ji) wî karî zortire

…….

KOMÎ

Komiya ḱirina kar

Dema bûrî bi hemû darêjên xwe ve komḱirinê li berkar(bireser) vedigerîne…ḱu ṕênav cîgirê nav û ḱara be, bi teḱezî ḱu ṕênav jî xurû be …

Mînaḱ :

- Min deh sêv xwaribûn

(xwaribûn) komiya sêvaye

- T́e çar sêv xwarin

(xwarin) komiya sêvaye

- Wî du sêv dixwarin

(xwarin) komiya sêvaye

- We sêveḱ xwaribû

(xwaribû) ḱet́eya sêvêye

- Wenê sêveḱ xwaribaya

(xwaribaya) ḱet́eya sêvêye

- Me sêveḱ xwar

(xwar) ḱeťeya sêvêye

- Wan sêveḱ dixwar

(dixwar) ḱeťeya sêvêye

Ťêbînî :

Ev rêzan bi karê ḱirinî ře saze , çiḱu berkar berya kar û piṣťî pḗrnav ťêť ..kar di evê rêjeyê de ťêpeře (derhingêve-gerguhêze) û berkaran belû diḱe..

Lê- dema ḱu hejmara ḱara û navdêran cîgir be û (eḱ) nîṣanḱa nenasiyê paṣgira berkar be..řêziḱ xwe diguhêře, komiya kar li komiya ḱara û navdêr vedigeře ..

Nimone :

-Azad û Řeṣo sêveḱ xwarin ...dixwarin ..wê bixwarana (xwaribana).

- Nijdevanan gundeḱ talan ḱirin .. diḱirin .. wê biḱirana (ḱiribana).

Paşgira (na) paşkokeke pêgehe şûngira (in) alava komêye weke çawa ku (ya) alava keteye û cîgira(a) a ku bi dengedareke dîtir ve gihîjtiye , tekeziya bersiva (eger) di bûriyê dûr deye.

Her weha jî dema ku pêrnav bi karê bûyinî ře be ..komiya kar li komiya pêrnav vedigeře, çiku berkarê karê bûyinî nine ..ne derhingêve (saltgêre - tênepeře)..

Nimone : (rewş - awa - dûx - rawe)

- Ez deh ketina ketim

- Hûn řevekê řeviyan

- Ewana carekê tenê hatin

Di nuhok û ayinde û biryarê (fermanê) de :

Karê bûyinî û karê kirinî hevwekin(mîna hev tên) herdû şêwe jî derhingêvin .

Lewra komî herdem bi pêrnav û kara û navan tekez dibe ..

Nimone :

- Ez deh hêviya dixwazim

- Em hêviyeḱê dixwazin (nuhoḱ)

- Ťê çar caran biçe

- Hûnê biçin (ayinde)

- Bibezin - dakeve " dayê" (ferman)

Ťêbînî : weḱe ḱu haťiye nasîn , pḱênav di kurdî de du komin :

1- Pḱênavêť Koma (EZ) : di dema bûrî de bi karê salťegêr (ťênepeř) ře ťên û cîgirên nav û ḱarane , lê heger ku bi karê derhingêv (gerguhêz - ťêpeř) ře haťin ew dibin cîgirêť berkar (bireser) , lewra kar dîsa li gor wan mêjer dibe û alavêť teḱeziya evê komê disťîne..

2- Pḱênavêť koma (MIN) : ev kom bi xwe di dema bûrî de bi karê derhingêv ře ťê , çiḱu berkar ji karê derhingêv ře heye û pênavêť evê komê pḱê teḱez dibin , êdî hew teḱeziyê dixwazin .., ango ku ew nav an ḱara bin hejmara raweya kar..çi kom be û çi ḱeťe be li berkar(bireser) vedigerînin …

Weḱ :

- Wan ez ḱujt́im .. min ew ḱujt́in
- Min ewana dît́in .. wan ez dît́im
- T́e em xapandin .. me t́u xapand
- Me t́u dît́î (dît́) .. t́e em dît́in
- We ew ṣande (ṣand) .. wî hûn ṣandin
- (wê-wî) hûn derbas ḱirin ..we ew derbas ḱir

Lewra dema ḱu em bibêjin ka ṣaṣî û rast́î di hevoḱan de bi çi awayî nas dibe .. ṕêdivêye ḱu em hin mînaḱan ṣirove biḱin ..

Mînaḱ :

- Wan pirt́ûḱeḱ derxist́in (ṣaṣe)

Lê : wan pirt́ûḱeḱ derxist́ (rast́e)

Çiḱu : karê derxist́inê li pirt́ûḱê vedigere, ango karê derxist́inê bi serê pirt́ûkê ve hat́iye .. ne bi serê ṕêrnavê koma sêyemê nedyer(wan) hat́iye.

- Wî deh pirt̂úḱ derxist́ (ṣaṣe)

Lê : wî deh pirt̂úḱ derxist́in (rast́e)

Çiḱu : koma pirt̂úḱan koma derxist́ina dixwaze .. ango hejmara kar ji hejmara berkare ..wî pirtûḱ yeḱa yeḱa hejmart́in daḱu bûn kom ..

Wî ew derxist́ (yeḱe-ḱet́eye)

Wî ew derxist́in (piřin-kome)

…….

BERÊ DUWEM

ṔÊRNAV

Raveḱirin:

> Ṕêrnav ciyê nav digire , li ṣûn ḱara(ḱirar) bikar t́ê û bi darêjên demê ře t́ê guhert́in , û desteḱên darêjî ji teḱeziyê ře bi xwe ře bikar t́îne... ev desteḱanan jî dibin paṣgir (dûvgir)ên kar(ḱiryar), û bi nav dibin: [desteḱên ṕêrnavan].

Lê mijara min.. darêjên guherṭina ṕêrnavên kesoḱ (kesane) bi bandora guherṭina nîrên demêye.

ṔÊRNAVÊD KESOḰ (KESANE)

Ṕêrnavê kesoḱ(kesîn) du curene:

1-ṕêřnavên bi alav: dûvgirên erêniyê boyî
ḱirina karê ḱara(ḱirar)bi kar vediḱin .

<u>Weḱ:</u>

Ṕêrnav :{ez-t́u-ew-em-hûn-ew(ewên-ewanên}

Dûvgirên kar :{im - î - e - in}.

<u>Mînaḱ :</u>

- Ez dibezim- t́u dixwî
- Ew dixwe- em diçînin
- Hûn diṣewit́in- ew digindirin

2-ṕêrnavên xurû:bê dûvgirin û kar li ṕê wan
teḱez t́êt́,

<u>Weḱ:</u>

Ṕêrnav : {min- t́e-(wî-wê)-me-we-wan}

Mînaḱ :

- Min bir
- Ť́e dar ṣiḱand
- Wî-wê silav diḱir
- Me agir dada
- We av ťanî(di anî)
- Wan ṣûr kiṣand(in)

Ť́êbînî:

(in) a li dawî alava danasîna komêye,

(ewana-evana) : ṕêrnavên nîṣandana komêne ji dûr û ji nêz(nêzîḱ) ře .

EZ.. .. .. MIN

EZ-MIN : pêrnavê axavtinkare , ciyê nav û kara digre, û darêjên demê bi evan durvan wî diguherin.. .. ..

1-di darêja buhêrkî (bûrî) de:

* Di bûriyê kutahî de wek xwe dimîne(ez) û desteka tekeziyê jêře .. im-ya dûvgira kare..

<u>Mînak :</u>

-Ez ketim- ez mirim (kutahî)

-Ez çûme- ez êşiyame (erênî)

-Ez çê bûm- ez şiyar bûm (bûyinî)

(e)alava erênî ji dûr re bêgûmaniye

… (buhêrkî di dûxa nêz û dûr de)…

* Di bersiva dûxa kar de dibe (min): an navek û an karak û an jî pêrnavekî dîtir bi darêj dibe, dibe ku pendî be û dibe ku nepen be

jî...tiṣteḱ heye ḱu ṕênavê (min) ṕê ře kar diḱe,

Mînaḱ :

- Min st́end - min revand

(min çi st́end?..min ew tiṣt́ revand)

- Min biriye - min ḱuṣt́iye

(min kî biriye?..min ew ḱuṣt́iye)

(buhêrḱî di dûxa nêz û dûr de)

* Di bûriyê berdewam de : (ez) û dest́eḱa teḱeziyê jêře (im) paṣgira kare..

Mînaḱ :

- Ez dikeṭim - hîn ez dikeṭim

(ez hê dikeṭim)

(bi-di)alavên berdewamiyêne , û (hîn)erêniya berdewamiya kar dide, belê (ê) kurṭiye ji (yê), ṕêgihêjnave,lê di hin darêjan de paṣṕênav ṭêṭ.

Mînaḱ :

- Ez ê biket́ama = ez ê ket́ibama (bûyinî).

- Ez a biket́ama = ez a ket́ibama (bûyinî).

T́êbînî : (ê = yê) arzî û samaniya karên ḱirinê û bûnê li ṕêrnavan vedigerîne , boy nêre..

(a = ya)nîṣanḱa mê ye ..

Nimone :

- Ê çû - ê dûr

- A baṣ - a bedew .

* Di bersiva dûxa kar de dibe (min)..

Mînaḱ :

-Minê st́endiba - minê st́endibaya

(ya-danasîna ṕêrnavê ḱet́e ye)

-Minê xwariba - minê xwaribaya

Herdû mînaḱ jî bersiva ayindê boy ḱirina kar di bûrî de didin, (di buriyê nêz û dûr de).

Berya (bi) a ayindê û (di) alava berdewamiyê, (ê) a ṕêgehnav di hin darêjan de paṣṕêrnav t́êt́,..û ḱu hevoḱ bersiva mebest́a bûyinê be

ṕêrnavê (ez)jî dibe ḱu bi kar bê..

Mînaḱ :

- Hîn(hên) ezê hat́ibama.

T́êbînî : ḱu ṕêrnav li paṣî (ḱu-xwezî-eger-kaḱu-t́a..)hat́,êdî hew (ê) a ṕêgehnav dixwaze..

Mînaḱ :

-Eger min bixwest́a

-Ka ḱu min bist́enda

-Xwezî min hiṣt́iba

(ê) ji darêja(dê-wê)herdû alavên ayindê ře kurt́iye.

2-di darêja nuhoḱ(nû- nuha)de:

* Di dûxa nuhoḱê kut́ahî de (ez) weḱe xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ez mirîme - ez birîndarim

- Ez ṣiyarim - ez kovanim

* Di nuhoḱê berdewam de ṕêrnavê (ez)weḱe xwe dimîne û desťeḱ jî(im) jêře dimîne,..

Mînaḱ :

- Ez dikenim - ez dixwînim

- Ez gulê hilm diḱim - ez dixwazim

(di)alava berdewamiyê li pêṣiya karê ḱirinê ťêť, û (im) a desťeḱ ji karře bûye dûvgir.

* Lê hin dûxên din(dîťir) ji ṕêrnavê (ez-min)ře li gor darêjên hevoḱênî*(1)* karî hene..

Mînaḱ :

- Ez direvim (bûyine)
(ez **dibim** reviyayî)

---

(1) -(nî) paṣḱoḱa teḱeziya komêye..mîna(ye) ḱu erêniya ḱeťe dide.

- Ez direvînim (ḱirine)
  (ez revandinê **dikim**)

- Min dêşîne (berkarî)

  (ew min dêşîne)

- Min dikenîne (berkarî)

  (ew dikḱe ḱu ez bikenim)

- Çi ji min ře dibêje (berkarî-ḱirin)

- Li min dinêre (berkarî)

- Min dibîne (berkarî)

- Kî min dixwaze? (berkarî -ḱirin)

- Çi bi min ře heye? (berkarî- pirs)

- Dilê min vedixume (berkarî-bûyin)

- Ji malê der dikevim (ḱirin)

- Xwarinê dixum (ḱirin)

- Vaye ez birîndarim (bûyin)

- Ez dibînim (ḱirin)

- Min dibîne (ḱirin)

- Min digirîne (berkarî)

- Ji min ře çi dibêje? (pirsyarî)

- Li min temaṣa diḱe
  (ḱirina karê ṕênavê ewe)

- Ez dixum û vedixum (ḱirinî)

3-di darêja ayinde û biryarî de (ez) û(min):

* Du alavên ayinde hene (dê-wê) û li gora darêja hevoḱê t́êne guherṕin û dibin (ê-yê) kurṕ dibin û axavṕinê zelal û ṣayiḱ diḱin ..

Mînaḱ :

- Ez ê dê herim mal=ez dê herim mal=ezê herim mal.

- Ez a dê herim mal=ez dê hrim mal = ezê herim mal

Dêmeḱ(ê)ṣûngira (ê dê) ye û (a) nîṣanḱa mê ye,

di dûxa zelaliyê de, li dawî verêsî dibe(a =ê) ,

û(im)a desťeḱ bi ṕênavê (ez) ře alîkara bêgûmaniyêye,ḱu li dawiya goťeyê dengedareḱ hebe.. dibe (yê-ya) .

- Ḱu alîkariya alav û gîť û nîrên demê di karê ayinde de nebe, dûr û nêzîḱaya dema ayinde nebelû dibe.

Ji we ře çend nimone ji ayindeyê ṕênavê (ez-min)..

- Ezê bixum (ayindê ḱirinî)
- Min biḱujin (biryarî)
- Min di bîra xwe bînin (biryarî)
- Ka ḱu (xwezî)ez bimrim(hêvî- bûyinî)
- Ka ez herim (xwesťeḱ- bûyinî)
- Ma(erê)ez herim (pirsyarî)

T́U(t́ê).. .. .. T́E

T́U-T́E: ṕêrnavê ṕêraxêve ji diyerê ḱet́e řeye , ew jî ciyê nav û ḱara digre , durv û rêbazên demê jêře bi evan darêjane :

1-di darêja buhêrḱî (bûrî) de:

* Di bûriyê kut́ahî de dimîne (t́u)..,

  dest́eḱ jêře nîne ,ew erêniye (bêgûmane).

<u>Mînaḱ :</u>

- T́u çû - t́u hat́ (kut́ahî û nêzîḱ)

- T́u çûbû - t́u hat́ibû (dûr)

(bûriyê bûyinî)

Bi ṕêrnavê (t́u) ře (bû) di dawiya kar de alava dûriyêye...

* Di bersiva dûxa kar de dibe (t́e).. .. ..

Mînaḱ :

- Ťe bir - ťe sťend (nêz)

- Ťe biriye - ťe xwarî ye (dûr)

* Di bûriyê berdewam de (ťu-ťe)desťeḱên paṣgirên kar jêře nînin,.. ..

Mînaḱ :

- Ťu diket - ťu hîn diçû

- Ťe dibir - ťe hîn dixwar

- Ťe rasť diḱir - ťu diçeřixî

.. (di) alava berdewamiyêye .. û (hîn) teḱeziya berdewamiyêye .

* Di bersiva dûxa kar de dibe (ťê)..

Mînaḱ :

-Ťê gotibaya-ťeyê ji zûv de anîbaya..(dûr)

-Ťê raza -ťê nimêj biḱira(ḱira).. (nêz)

(di bûriyê nêz û dûr de).

..(bi) pêşgira kar ji dema nêzîḱ řeye..

..(ba) paşgira kar ji dema dûr ře teḱeziye..

Ťêbînî:-ťê-kurťebêjeḱe ji(-ťu yê-ťe yê -ťe nê-)ye,

- Ťu + yê = ťu + ê = ťê
- Ťe + yê = ťe +ê = ťê

(ne) erêniya komêye, û (ye) erêniya ḱeťeye ..

(na) erêniya dûriya komêye, û (ya) erêniya dûriya ḱeťeye.. ḱu di hin şêwezaran de (yê)li şûna (nê) bikar haťe , ew li navhev xisťineḱe (hewdeliye).

2- di darêja nuhoḱ (nû- nuha) de..

* Di nuhoḱê kuťahî de (ťu) weḱ xwe dimîne..

û desťeḱ jî (e-î) jêře di dawiya kar de dimîne.

Mînaḱ :

- Ťu ẍemgînî - ťu birîndarî
- Ťu zanî ez kîme
- Ťu bexťiyarî

* Di nuhoḱê berdewamî de (ť́u) weḱe xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ť́u dibêjî - ť́u disť́irê
- Ť́u kêferať́ê diḱî - ť́u dibawiṣḱî

(di) alava berdewamiyê li pêṣiya karê ḱirinê ť́êť́.

(e-î) di dûxna (hin dûx ji dûxan) de verês dibe..(pevgihêjť́ina du dengedaran)..

Nimone :

- Disť́irê ---dibê---navê .....

(disť́ire-dibêje-naveť́).. .. ..

Hin darêjên nuhoḱ ji ṕêrnavê (ť́u) ře li gor rava hevoḱê evin..

Mînaḱ :

- Ť́u digirî (ḱaraye)
- Ť́u digirîne (ť́u diḱe ḱu ew bigrî)

- Ť́e digirîne (berkare)
- Ť́u dinêrî (ǩ́araye)
- Ť́u dibînî (ǩ́araye)
- Ť́e dibîne (berkare)
- Kî ť́e nas diǩ́e (berkare)
- Çend navê ť́ene (ť́e hene) ?
- Çi ji ť́e dixwazin ?(berkare)
- Ť́u li min digerî (ǩ́araye)
- Ť́u li kê dinêrî ? (ǩ́araye)
- Ť́u dixwînî.. (ǩ́araye)

3- di dûxa ayinde û biryarî (fermanî) de (ť́u - ť́e - ť́ê) ..

(dê-wê) gîť́ên ayinde bi darêja hevoǩ́ê řе ť́êť́in(ť́ên)guherť́in û dibin (ê-yê)..,

Mînaǩ́ :

-Ť́u yê dê bixwî = ť́u dê bixwî = ť́ê bixwî .

-Tu yê dê herî = tu dê herî = tê herî

-Tu bikuj -tu her -tu rab (biryarî)..

Dibe..(bikuj-her-rab), boy zelal kirina gotеyê pêrnav wenda dibe.

Têbînî : ku alîkariya alav û gît û nîrên demê di karên ayinde de tunebe ... dûr û nêzîk tê de nebelûye ..

Mînak :

- Tê salekе dîtir bimirî

Ku (yê - dê) dibe (ê) axavtin pê nerm û şayik dibe.

Çend nimone ji ayinde û biryara pêrnavê

(tu-te-tê)..

- Tê bibêjî-tê mukurê, (ayinde)
- Tu bibêj-tu mukurê(mukur wer), (biryar)
- Ka tu bibêj-de tu bibêj (biryar)

EW.. .. .. (WÎ- WÊ)

EW -WÎ-WÊ: ji ḱeṫê nedyer řeye,..ciyê nav û ḱara digre, û mîna hemû ṕêrnavan darêjên demdarî jêře hene.. ..

1- darêja buhêrḱî (bûrî) :

Dûxên ṕêrnavê(ew-wê-wî)..

di dema bûrî de berḉav diḱe.,û alava desṫeḱa teḱeziya kar ji (ew) ře (e) dimîne..

* Di bûriyê kuṫahî de (ew) dimîne..

<u>Mînaḱ :</u>

- Ew derkeṫ - ew fiřiya (nêz)
- Ew fêr bûbû - ew ṣewiṫî bû (dûr)
- Ew ṣewiṫî-ew ṣiyar bû (jîwer û salox)
- Wî xebaṫ ḱir - wî soz da (nêz)
- Wê ṣirove ḱiribû - wê nas ḱiribû (dûr)
- Ew ho bûbû (dûr)

- Ew řeviya (nêz)

Bûriyê bûyinî bi alava (bû) ya paşgir dûr dibe..

û dîsa di hin şêwezaran de, rêzaneḱe awarte derṭê, ew paşgira (e) bikar nayê;

Nimone :

- Ew çuwe = ew çû

- Ew haṭe = ew haṭ

* Di bersiva dûxa kar de dibe (wê) ji mê ře û (wî)ji nêr ře..

Mînaḱ :

- Wî goṭ (nêr)

- Wê kiřî (mê)

(boy nêz)

- Wî şandiye (nêr)
- Wê dîṫiye (mê)

(boy dûr)

(ye)alava erêḱirina kar û dûrdemêye..

T́êbînî : ṣaṣe ḱu (wî-wê)bibe (ewî-ewê),..jiber ḱu (ewî-ewê) ṕêrnavê nîṣandanê boy kesê dûre, her weḱî ḱu (evê-evî)

ṕêrnavê nîṣandanê boy kesê nêzîḱe, û bi kurt́ayî hat́ine ..rewanbêjiyê zelal diḱin.. .. ..

Mînaḱ :

- Hawî(hawê) çêḱir =ewî (ewê) çêḱir
- Havî(havê) çêḱir =evî (evê) çêḱir
- Ehvî(ehvê) çêḱir =evî (evê) çêḱir

* Di bûriyê berdewam de :

Nêr û mê t́ê de xuyan dibe,..

Mînaḱ :

- Wê dişewit́and
- Ew a digot́ (ewe ya digot́=ewê digot́)
- Wî t́anî - wê dişiḱand

- Ew av diherikî

- Wî lawirî bazdida

- Wê kewê dav bi xwe re bir

Ravekirin:

- Wê =ew+ya (ê = ya=a) nîşankên mêne
- Wî =ew+yê (î =yê=ê) nîşankên nêrin..

Mînak :

- Mê : wê dibir = ewe ya dibir = ewe a dibir..,

- Nêr : wî dixwar = ewe yê dixwar = ewe ê dixwar

* Di bersiva dûxa kar de..(wê-wî) ,...

Mînak :

- Wî biçandaya

- Wî bi xwe = (e wî) birevandaya (dûr)

- Wê birijanda

- Wê bi xwe=(e wê) rijandiba (nêz)

(bi) di pêṣiya kar de bersiva berdewamêye.,.

(ba)di dawiya kar de ..gewre û spehîbûna erêniya kare..

(ya)ji ḱeṫe ře, û (na) ji komê ře..di paṣiya kar de,boy dûriya demêne..

2-nuhoḱ (nuha):

* Di nuhoḱê kuṫahî de (ew).,weḱ xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ew evîndare
- Ew bexṫireṣe
- Ew ḱare biçe
- Ew niḱare ṣirove biḱe

* Di nuhoḱê berdewam de p̀êrnavê (ew) weḱ xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ew dikene - ew dixwîne

- Ew disẗirê - ew xwar dibe

(di) gîẗa berdewamiyêye di pêṣiya karê ḱirinê de ẗêẗ .

Hin darêjên dîẗir ji pḗrnavê (ew) ře di dema nuhoḱ de li gora řava hevoḱê hene:

Mînaḱ :

- Ew dêṣe-ew dêṣîne (wê-wî)têṣîne

- Ew diṣiḱê-ew diṣiḱîne(wê-wî)diṣiḱîne

- Kî wê(wî)dibîne ?

- Ka ew zane?

- Çiqas navê wê hene?
- Ew dikeve kwîderê?

- Ew jina han dinivîse
- Wî xorẗî dixwaze

- Ew ḱeç temaṣa diḱe
- Ji wê ře dibêje

- Ew ê (yê) diṣewiť e

3- ayinde û biryarî :

(dê-wê)alavên ayindêne , û bi darêja hevoḱê ře ťêne (ťêťin) guherťin ..

Mînaḱ :

- Ewê biçe = ew wê biçe = ew ê(yê) wê biçe ..

Ťêbînî : (dê-wê)...ji ayinde ře alavên pêṣewaziyêne ,di hin darêjan de bi kurťayî sivik dibin , û (ê) ciyê wan digre..

Mînaḱ :

- Ew wê here mal = ewê here mal
- Ez dê birevim = ezê birevim
- Em dê biçin = emê biçin
- Ťu dê rabe = ťê rabe

- Wan wê bigoťana =wanê bigoťana

(dê) bi pêrnavên{ ez-min \ ťu-ťe-ťê \em-me \ hûn-we }ře bi kar ťêť ,..

(wê) bi pêrnavên{ ew-wî-wê \ ewên-wan } ře bi kar ťêť ,..

Jiwe ře.. ev çend mînaќ, ji ayinde,.. boy pêrnavê (ew)..

Mînaќ :

- Ew wê bibêje - ewê ṣa bibe

- Ewê muќurê - ew yê wê bikene

- Ew ya wê bisťirê

- Wêya ќu bibiṣќive

- Wêya wê bibiṣќive

Ji biryarî(fermanî) ..çend nimone ... :

Nimone :

-Bila ew bixwîne - da ew bigirî

-De bila biřeve - wî bíkuj

-Hela wê veṣêr - divê ew jî ṣiyar bibe

-Divê ḱu ew here - bila(ew) ne wê bihêle

……..

EM .. .. .. ME

EM-ME : pêrnavê koma axavtinkare , ciyê kara û nav digire..û bi demê re hevokên bi darêj dadimezrîne ,.

1- di buhêrkî (bûrî)de bi darêje :

* Di bûriyê kutahî de wekê xwe dimîne(em-me) û destekа bêgûmaniyê jêre (in) dûvgira kare ,..

Mînak :

- Em hiştin - em rabûn, (nêz)
- Em şiyar bûne - em hilkişiya bûn, (dûr)
- Me arek dada - me av vexwar , (nêz)
- Me hev dîtibû - me stendibû , (dûr)

(bûriyê bûyinî di dûr û nêzîk de)

* Di bersiva dûxa kar de dibe (me)..

Mînaḱ :

- Me da - me dayê - me xwar, (nêz)

- Me ḱuṣt́ibûn - me birî ye, (dûr)

* Di darêja bûyinî de dibe (em)..lê ṕêrnav di dûxa berkar de xwe dinasîne…

Mînaḱ :

- Em ḱuṣt́ibûn - em hejandin

(ṕêrnav di rewṣa berkar deye)

* Di bûriyê berdewam de (em-me)..û desṭeḱa paṣgira kar boy bêgûmaniyê (in) ji (em) ře paṣgire..

Mînaḱ :

- Em dihaṭin - me guhdarî diḱir
- Em digeřiyan-me ṣêranî vedixwar

- Em dilerîzîn - em dixebiṭîn

(di) alava berdewamiya kare .

* Di bûriyê bûyinî de hin caran tîṕa (bi) ciyê (di) digre..

Mînaḱ :

- Emê bireviyana - emê reviyabana

(bi) bi (di) hat́iye guhert́in çiḱu ayinde li vir bûyiniye,dêmeḱî (di) a berdewamiyê ..ji (bi) a bûyinê cudaye , lewra ciyê (bi) t́ê guhêrt́in ..lê ciyê (di) nayê guhêrt́in.

T́êbînî : ṕêrnavê (em-me).. ew jî mîna hemû ṕêrnavan , di dema berdewamî de, ḱu dikeve dûxên jîwerî..an weṣ û rewṣ û bara de û ḱu darêj bûyinî be ..ṕêrnavên bingehî bikar t́ên (ez-t́u-ew-em-hûn-ewên) ,..lê ḱu li piṣt́î ṕêrnavan kareḱî ḱirinî hat́..dibin ṕêrnavên durvguhêr (min-t́e-wî\wê-me-we-wan)..

Mînaḱ :

Weṣ û bara (rawe)..

- Ez-t́u-ew-em-hûn-ewên..(dihat́im-dihat́î-dihat́e-dihat́in-dihat́in-dihat́in)

Desťekên bêgûmaniyê ji wan ře(im-î-in-e)hene.

Berya karê ḱirinê..

- Min-ťe-wî\wê-me-we-wan..

(digoť-digoť-digoť-digoť-digoť-digoť),

Desťekên teḱeziyê li paṣ kar ne girîngin.

* Di bersiva dûxa kar de (bersiva mercîn) pêrnavê (me) bikar ťêť:

Mînaḱ :

- Menê ṣiḱandibana (ji dûr ře)
- Menê sûnd bixwara
- Me soz bida (ji nêz ře)

Ťêbînî: min yê-ťe yê-wî yê-wê ya-me yên-we yên-wan yên.,di ṣêwezarên hineḱ herêman de.. ev darêj siviḱ û nerm dibe bi guherťinê ře û dibin :

minê-t́ê(t́eyê)-wiyê..wêya-menê-wenê-wanê.,

Mînaḱ :

- Min yê bazda - t́e yê bibiraṣt́a
- Wî yê bifrot́a - wê ya bibira
- Me yên bixwara - we yên bixwest́a
- Wan yên temaṣe ḱiribana

Dibin :

- Minê bazda - t́ê bibiraṣt́a
- Wiyê bifrot́a - wêya bibira
- Menê bixwara - wenê bixwest́a
- Wanê temaṣe ḱiribana

(ê)kurt́iye ji (yê) û (a) li dawiya kar.. kurt́iye ji (ya),..û (na) berdêliya(ṕêguhêra) (ên) a komêye, herdû alav jî alîkarên berdewamiyê û erêniyêne.

Darêja hevoḱê darêja ṕênav jî li gora darêja xwe a darêj ḱirî di tibabên nîrên demê de didarêje(darêj diḱe),..û ṕênav jî hema her weha wî karî bixwe diḱe.

2-di nuhoḱ (nû-nuha) de jî ṕênavê (em) cîgire..

* Di nuhoḱê kuťahî de (em) dimîne.,.

Mînaḱ :

- Em ṣarezane - em we nas diḱn
- Em bê kesin - em hevalbendê dozêne

* Di nuhoḱê berdewam de ṕênavê (em) weḱe xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Em avê dirêjînin
- Em sťiranan dibêjin
- Em maf dixwazin
- Em hundurê xwe dimalin(řêṣ diḱin).

(di)alaveḱe..bersiva ḱirina kar dide boy berdewamiyêye ...

Hin darêjên nuhoḱ ji ṕêrnavê (em-me) ře hene..

Mînaḱ :

- Em radizên-em radizînin-me radizînin
- Li me dinêrin-em dibînin - me dibînin
- Çima em dikenin? - çi ji me divên?
- Me çawa dinerxînin? - em kîne?
- Me ṣîreṭ diḱin … û wilo..h ..d ..

3-di darêja ayinde û biryarî de..ṕêrnavê (em-me) weḱ xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Em dê zana bin
- Wê bi me kar biḱn
- Emê herin cengê
- Wê me nas biḱin

- Dixwazin me bikirin lê em ne t́êne kirîn û ne t́êne frot́in.

- Niḱarin weḱ me biḱin û nabe li niḱ me rûnên..

Ji hêvîdariyê ře ..:

Mînaḱ :

- Xwezî em herin
- Xwezî(xwesḱa)me ji bîr neḱin.

Ji biryariyê ře .. ..

Mînaḱ :

- De em herin - heydê em herin

- Da me biḱujin - ka em bazdin

- De me bi xwe ře bibin

Jipirsyariyê ře.. ..

Mînaḱ :

- Ma em bên?
- Gelo wê me jî bibin?
- Ma em jî herin?
- Ka qey me nabin?
- Gelo em bixwazin?
- Wê me bi ku de bibin?

HÛN.. .. ..WE

HÛN-WE : pêrnavê komela diyere.. ..ciyê nav û kara digre, û durv û weşên demê jêře di hemû nîran de bi evan darêjane…

1-Di darêja buhêrkî (bûrî) de..

* Di bûriyê kutahî de(hûn)dimîne..destek jêře (in) e , ew erêniya bêgûmaniyê dide (teqez dike),..

Mînak :

- Hûn ketin - hûn hatin (nêz)
- Hûn çûbûn - hûn şiyar bûbûn (dûr)
- We vegerand - we kujt(kuşt) (nêz)
- We danîbû - we zanîbû (dûr)

Têbînî: (bû) ji bûriyê kirinî û bûyinî řeye..

Ku du dengdar pêrgî hev bibin, yek tenê ji wan dimîne, ew jî a bilind û dirêje,..

Mînaḱ :

- Bû + in = (bûn)

(bû): karê bûyinêye,..û (in) : dûvgira kare, boyî erêniya karê pêrnavê komêye..dêmeḱ :

Bû in = bûn

Mîna hemû pêrnavan pêrnavê (hûn) jî nîṣanḱa kuṫahiya dûr jêře (bû)ye.."

* Di bersiva dûxa kar de dibe (we) û desṫeḱa paṣgira kar jêře (ye)ṣana dûriya kare,..

Mînaḱ :

- We welaṫ rêzgar ḱir
- We gul hilm ḱir (nêz)

- We biryar daye
- We ṣîv xwariye (dûr)

Çawa di darêja ḱirinê de (we) bikar ṫê, weha jî di darêja bûyinê de pêrnavê (hûn) bikar ṫêṫ ..

Nimone :

Bûyinî	ḱirinî
- Hûn çûn- hûn haṫin	- we bir - we veṣarṫ
- Hûn lerizîn	- we ṣewiṫand

(ḱirin bûn= ḱirinî ,..û bûnḱirin = bûyinî)

Danasîna şaşiyeḱê :

Dema ḱu em dibêjin : (we ḱuṣṫin) hevoḱ ḱême,
û (in) bersiva du darêjaye.. ..,

a-"in" nîṣandeḱa koma ḱaraye

Nimone :

- Dijmina we ḱuṣṫin = dijmina hûn ḱuṣṫin

b-"in" nîṣandeḱa hejmar û koma berkaraye

Nimone :

-We dijmineḱ ḱuṣṫ = we dusê dijmin ḱuṣṫin

-We sêveḱ xwar = we ṣeṣ sêv xwarin

***** Di bûriyê berdewam de (hûn-we)..desteḱa paṣgira kar (ya ḱu kar teḱez diḱe) " in " bi pêrnavê " hûn " ře dimîne..,

Mînaḱ :

- Hûn diket́in - hûn diçûn
(saloẍiya weṣ û raweyê)

- Hûn diçeřixîn - we dibir
- We rast́ diḱir - we hîn dixwar
(ḱirinî)

(di) û (hîn) gît́ên berdewamiyêne..

* Di bersiva dûxa kar de (we) dimîne.. ..

Mînaḱ :

Baṣ meyzeḱin ka kîjan ji evan herdû durvên hevoḱan rast́e ?

Şaş	rast́
- Weyê got́ibaya	-wenê got́ibaya (dûr)
- Weyê xwest́ibaya	-wenê xwest́ibaya (dûr)

- Weyê bifiroșta -wenê bifiroșta (nêz)

- Weyê sûnd bixwara -wenê bixwara (nêz)

..(bi) berya kar ji dema nêzîḱ řeye..

..(ba)li dawiya kar ji dema dûr řey

Ťêbînî :

- We + nê = We ên(yên) = wenê,
(nê) Pêguhêra (ne)ye .

- Ťe + yê = ťe ê (yê)= ťeyê(ťê),
(yê) Pêguhêra (ye)ye.

(ye) erêniya ḱeťeye (ḱeťe teḱez diḱe)

Hespên ťene
Boy berkare..(arziyê dinasîne).

(ne) erêniya komêye (komê teḱez diḱe)

Sêva weye
Boy berkare..(arziyê teḱez diḱe)

Weḱ :

- Hûn mirîne ...hûnin yên mirîne

- We ḱujt́ine...we ew ḱujt́ine

Nimona dawî koma ḱuṣt́iyan dide xuyan..û darêj dibe :

- We yeḱ ḱujt́iye (ḱet́eye)

- We pir ḱujt́ine (komin)

(ne) koma berkaran teḱez diḱe..

<u>Rêzanîneḱ</u> :

Bi bûyinê ře û di bûriyê berdewam de,ṕênavên maḱî ên desṭeḱ(alavên teḱezî)xwaz , cî digrin û bi kar t́ên..û ṕênavên maḱî jî evin :

(ez-t́u-ew-em-hûn-/ewên,ewan/).

Bi ḱirinê ře û di bûriyê berdewam de..ṕênavên durvguhêr (xurû) û jixweber teḱez, ew cî digrin û bikar t́ên..û ṕênavên xurû jî evin :

(min-/t́e,t́ê/-/wî.wê/-me-we-wan).

…….

2-Di darêja nuhoḱ (nû-nuha) de..

* Di nuhoḱê kuṫahî de (hûn) dimîne..

Mînaḱ :

- Hûn ṣiyarin hûn siwarin
- Hûn comerdin hûn hejarin
- Hûn serkefṫîne hûn bêkarin

B-di nuhoḱê berdewam de, ṕêrnavê (hûn) weḱe xwe dimîne û desṫeḱ jî jêře (in) dimîne..

Mînaḱ :

- Hûn dilîzin
- Hûn di wî agirî de diqiḉqiḉin
- Hûn diṣopîninin
- Hûn bi gaziya wan ve diḉin

(di) alava berdewamiyêye û pêṣgira karê ḱirinêye.. û (in) a desṫeḱ , dûvgira kare , nîṣandeḱa komêye..

Lê hin dûxên dît́ir ji ṕênavê (hûn - we) ře li gor darêjên hevoḱênî karî hene.,.

Mînaḱ :

- Hûn kurdin - hûn serť́in
- We diḱujin - we qir diḱin
- Ji we ře dibêjim - boy we dişînim
- We şiyar diḱe - kî bi ya we diḱe
- Çima hûn ne lihevin ?
- Boy çi hûn ditirsin ?
- Ka hûn kîne ? - hûn bi kê řene ?
- Hûn tu karî naḱin - em we nas diḱin
- Hûn me dibînin - ji we dist́îne
- Hûn talan dibin - we talan diḱin

3-di dareja ayinde û biryarî de (hûn - we)..

Ayinde bi herdû alavên xwe ve di dema hat́ina kar de ṕêḱ t́êt́, an jî herdû alav siviḱ dibin, boy rewanbêjî durust́ bibe û zelalî

t́ê de bikar bêt́..
(dê -wê) dibin (ê-yê) û desteḱa bêgûmanî (in) jî dibe (ên)a dûvgira kar..

Mînaḱ :

- Hûnê t́ê bighêjin - hûnê fêr bibin

- Hûnê berdênê - wê we rahêjênê

- Hûnê pavêjênê - wê we bibizdîne

- Hûn dê muḱurên - bila we eṣḱere biḱe

T́êbînî(1) : di evan mînaḱan de ..(rahêjênê-berdênê) alava(ên) desteḱa karê komêye , û danasîna koma ḱirara (ḱara)ye , û (ê)ya dawî danasîna berkarê keṕeye..(rahêjin ewî an ewê) û (berdin wî an wê) û di mînaḱa.. (eṣḱere biḱe) de .. (e)ya dawî danasina pêrnavê nepen û keṕeye, û darêj bi evî durviye :

- Bila ew we eṣḱere biḱe .

T́êbînî(2): di ṣêwezarên kurdî de li hineḱ herêman dibêjin (ûn), belê ev ṣêwezar

rêzimaniyê diṣḱîne, çiḱu (û) serkêṣa
tu goṫe û bêjeyên kurdî nabe.., lê hey
ḱu bibe (win) durisṫ be,

EW + (ÊN-IN-AN).. .. ..WAN

EW +(ÊN-IN-AN)..WAN: ṕêrnavê koma nedyere., ev ṕêřnav jî mîna hemû ṕêrnavên kesaneye.. ciyê nav û ḱara digre ,belê (ew)

mîna ṕêrnavê ket́ê nedyer dimîne çiḱu desťeḱên erênî (in-ên-an) di dawiya kar de kamala evî ṕêrnavî berḉav diḱin..

EW +(ÊN-AN-IN)=EWÊN-EWIN-EWAN

1-di darêja buhêrḱî de :

* Di bûriyê kuťahî de weḱ xwe dimîne (ew) û desťeḱa teqeziyê (in) jêře dûvgira kare... û ḱu bi taybeťiyê ře hať.. (ên-in-an) bi (ew) vedibin û dibe (ewên - ewin - ewan) (in) ji (ên) verêsiye û herdû jî (an) haťine ..,

<u>Mînaḱ :</u>

- Ew çûn - ew haťin

(kuťahî û teḱûzî)

- Ewên ketîne - ewin yên ṣewitîne
(erênî û taybetî)

- Ew rabûbûn - ew hatibûn
(bûyinî)

(buhêrkî di dûxa nêz û dûrde)..

(e) alava erênî ji dûr re bêgûmaniye..

* Di bersiva dûxa kar de dibe (wan) .. navek an karek û yan jî pêrnavekî dîtir bi darêj dibe, hey ku pendî be û hema nepen be jî dibe.. (dêmek pêrnavê (wan) ne bi tena xwe kar dike..

Mînak :

- Wan anîn - wan bir

- Wan çi stendin ?

- Wan tiṣtek revand

- Wan nan xwariye

- Wan tiṣtek hiṣtiye

- Wan kî biriye ?

- Wan Azad tenê biriye

(buhêrḱî di dûxa nêz û dûr de)...

* Di bûriyê berdewam de : (ew) .. û desťeḱa bêgûmaniyê jêře (in) desťeḱa kare û .. xuyanḱirina komêye..

Mînaḱ :

- Ew dixebiťîn - ew difiriyan

- Ewê bihaťana - ewên haťibana

(bi - di) alavên berdewamiyêne..

(ê) paṣpêrnave ..û kurťiye ji (yê) a ḱu nîṣandeḱa danasîna navê ḱara rave diḱe û arziya bûn û ḱirina kar li ḱara vedigerîne..

* Di bersiva dûxa kar de dibe " wan "....

Mînaḱ :

- Wanê kiṣandiba - wanê kiṣandibana

- Wanê hiṣťiba - wanê hiṣťibana

(di bûriyê nêz û dûr de)

Herdû mînaḱ,bersiva nîrên ayindêne ,.. di dûxa ḱirina karê bûrî dene ...

(na) : danasîna koma ḱaraye...

Ťêbînî : (ê) paṣṕêrnav ťêť , lê ḱu pêrnav piṣťî (ḱu - xwezî - eger- ťa -çi- kê -... h …w..) haťibe tîpa (ê) ne gereḱe..

û (kî +yê=kî ê= kê) û ev ṣirova verêsiyêye...

Mînaḱ :

- Eger wan desť bidana hev
- Ḱu wan bixwarana

- Kê wan diḱujť ?
- Çi wan ṣiyar diḱir ?

2-di darêja nuhoḱ (nû – nuha)de:

* Di dûxa nuhoḱê kuťahî de (ew) dimîne û desťeḱ jêře (in) dimîne...

Mînaḱ :

- Ew ṣervanin - ew zanyarin
- Ew sorin - ew hejarin
- Ew hêjane - ew hêvîdarin
- Ew rêwîne - ew merdin

Ḱu dawî dengdar be (ne) ciyê (in) digire..

B- di nuhoḱê berdewam de ṕêrnavê (ew) weḱe xwe dimîne..

Mînaḱ :

- Ew dixebiṫin
- Ew diṕeyivin
- Ew ḉiya dihejînin
- Ew dijminan dibizdînin
- Ew ṕezkoviyan diḱujin

(di) nîṣanḱa berdewamiyêye.. û (in) dûvgira kare û erêniye...

Hin darêjin dîtir boy pêrnavê (ew-wan) hene:

Mînak :

- Ew koça bar dikin,..
- Ew gula hilm dikin .
- Wan nas nake !
- Wan dadixîne .
- Çi ji wan ře çê dike .
- Li wan mukur têt !..
- Wan dêşîne .
- Wan dinerxîne .
- Çi bi wan ře heye ?
- Serê wan dêşe !
- Ew ji Şivan û Şiyar mestirin .
- Dijminan ditirsînin .
- Nuha ew nexweşin .

- Ew dikiřin .

- Wan ṣiyar diḱin .

- Siwar wan perîṣan diḱe .

- Boy wan çi diḱe ?

- Li wan vedigerîne .

- Ah wane ew …

- Ew wan t́înin ,..

- Ka ew kanîn ?

- Waye ew t́ên ..

Gît́ û nîrên demê di ayinde de ber çavin ...

3- di darêja ayinde û biryarî de (ew - wan)..

A- du alavên ayinde hene : (dê , wê).. û li gor darêja hevoḱê t́êt́in guhert́in û dibin (ê , yê), rewanbêjiyê durist́ diḱin...

Mînaḱ :

- Ewê herin malê= ew yê dê herin malê= ew dê herin malê .

(ê) ciyê(yê dê) digire û (in) alîkara pêrnavê (ew)e..

B- û evana jî çend nimone boy we ..ji ayinde û biryaran..

Mînaḱ :

- Ewê biçin - ewê herin (ayindê bûyinî)

- Wan bibîn - wan şerjêḱ (biryar)

- Wan ji bîr meḱe - ji bîr nebiḱ (biryar)

- Xwezî ew bihaṫana - ka ḱu rabana (hêvîdarî)

- Bila ew werin - çima ew narin ? (xwesṫeḱ + pirsyarî)

- Gelo wê bixwînin?-ma wê ṣiyar bibin ?
(pirsyarî)

- Ta ku ew jî werin - wê bi wan ře bêt
(peywendî)

- Ji wan bistînin - wan bi xwe ře bîn
(biryarî).

Agahî:pêrnavê(hev) ji hevdû kurtebêj bûye û ê komiye.., pêrnavê (xwe) jî ji ket û kom řeye, ji hemû pêrnavaye , lewra gişti ye.

(hev-xwe) du pêrnavên nêtarin û bêhêlin..

Mînak : Em bi hevdû ře çûn(em bi hev ře çûn).

Li hevdû kirin = levkirin

Min ji xwe ře got-Ez ji xwe ře dibêjim

Wan xwe bi xwe çareser kirin

Hûn xwe dipârêzin.

.....

TÊBÎNEKÉ PUXTÉ :

Alavên tekéziya pêrnavêd alavxwaz (im-î-e-in), di dûxa(raweya) bersivê de, kú dibin paşkokên navekî an rengedêrekî , kú li dawiya nav û rengedêr ..tîpeké dengedar hebe,.. ev alavên tekéziyê xwe diguhêrin û dibin (me-yî-ye-ne).

Mînaḱ :

Hevokên rêzanşaş

- Ez zanaim -tu rêwîî -ew torîe
- Em-hûn-ew+(ên-ana) bajarîin

Hevokên rewanbêjî şaş

- Ez zana im -tu rêwî î -ew torî e
- Em-hûn-ew+(ên-ana) bajarî in

Hevokên rêzan û rewanbêjî durist

- Ez zaname(zanayim)-tu rêwiyî-ew toriye
- Em-hûn-ew+(ên-ana) bajarîne

Du rêzanan bi xwe ře teḱez diḱin..

Ji ewan mînaḱên bûrî teḱez dibe ḱu ev alavên han ..hem paṣḱoḱên ṕêgihêjin ..hem jî li ṕê hev nehátina du tîṕên dengedar ṣityar (xuyanê) û teḱez diḱin :

1- paṣḱoḱên ṕêgehin, çiḱu boy ḱu rewanbêjiyê bikar bînin,..rengê xwe diguhêrin, lê dema ḱu cihê bana..rawestéḱ bi tîṕa dawiya bêjeyê dihaá (tîṕa dengedar) û ṕeyveḱe dîtír desṕê dibû , ..dêmeḱî negereḱî guherínê bû..

2- ji evê rolê t́ê nasîn ḱu du dengedar li ṕê hevdû nabin , çiḱu eger bibana…ṕêdivê bû ḱu (im-î-e-in) xwe bi (me-yî-ye-ne)… neguherína ..û mîna vê raweyê jî (me-yî-ye-ne) di darêja bûrî de bi hevalbendên nîr û merc û xwestéḱ û hêviyê ře (ḱu-kaḱu-eger-hey-xwezî…h…w..) û bersiv bi herdû alavên ayindê (dê-wê)..dibin (ma-ya-na)..,

Mînaḱ :

- Ḱu ez azad bama

- Kaḱu t́u çûbûya(biçwaya)

- Eger ew bimiraya

- Hey em ḱuṣt́î bana

- Xwezî hûn biket́ana

Ku karê ḱirin û bûyinê alîkarbin ,..xwe bi wan ře darêj diḱin (dibin paṣgirên wan),..
weḱ: bibana-biḱiraya-bihat́ama.

RAVEKÍRINEḰ :

- Di zimanê Ingilîzî de (verb to be) hemberî karê bûyinê di kurdî deye..

Mînaḱ :

- To be = bûyin

Pêrnavê koma (ez) : di bûrî de bi karê salt́egêr (t́êneper) ře bikar t́ê, ango berkar ji karê wê komê ře nine, lewra alavên erêniyê karê wê komê teḱez diḱin.

Lê di nuhoḱ û ayindê de, bi karê têper (derhingêv) ře jî bikar t́ên û di hemû darêjên demê de jî ciyê nav û ḱara digirin .

Koma ṕêrnavê (min) : di raweya bûrî de bi karê t́êper (derhingêv) tenê ře bikar t́ên , ango berkar ji karê wê ře hene, ew berkar erêniya kar didin.

Lê di nuhoḱ û ayinde de ..ew kom bi xwe dibin berkar , êdî hew (nema) ciyê nav û ḱara digirin.

(yê-ya) jî koḱa wan(ê-a)ye , lê bûne paṣgirên got́eyên ḱu dengedareḱe paṣgir ji wan ře heye ,

lewra (y) bûye navbiřa du dengedaran..da ḱu rêzimanê neṣiḱîne û rewanbêjiyê durisṫ biḱe.

Hin nerîn ji ḱevn de hene .. dibêjin :

(im-î-e-in) .. ne paṣgirên teḱeziya koma ṕênavê (ez) dibînin , dibêjin ew karê bûyinêne, bi van nerîna em dikarin bipirsin ..gelo pîtoliya zimên bi her raweyeḱê ře amadeye ḱu rêzanên cihêreng di darêjeḱe yeḱser de peyda biḱe..? ma gelo hewdelî (linavevxisṫin).. ziman ṣaṣ û lawaz naḱe ?

Nimone :

- Ez bû bû im

Yeḱemîn (bû): karê ṕêvajoya bûyinêye, duyemîn (bû) ..karê dûriya bûyinêye , ḱu (im) jî karê bûyinî be..ṕirseḱe balkêṣ xwe dide der :

Gelo sê kar û nemaze du karên bûyinî… tevḱu karê alîkar bin jî …li ṕê hev hevoḱeḱê ava diḱin (mebesṫ du karên alîkar bi kareḱî dîṫir ře) ..? û ev çi hevoḱe ..?

Belê dema ḱu (im) weḱe daçiḱ an alaveḱe paṣgir(teḱeziya karê ṕênav) bête nasḱirin..t́ê nasîn ḱu ṕêgehe û hevoḱ ṕê serrast́ dibe..

Nimone :

Di bûrî de: - ez ket́im = ez bûm ket́î

Di nuhoḱ de:- ez dikevim=ez dibim ket́î

Di ayinde de:- ezê bikevim=ezê bibim ket́î

Di biryarê de:- bikev = bib ket́î

Ev jî nayê wê wat́eya ḱu me hevoḱeḱe navdêr di nav malbata zimanê Hindoroṕî de peyda ḱir, çiḱu karê bûyinê nedyere ..t́êḱve çûye .. û ma dibe ḱu em bêjin weḱe qalibeḱî hindewroṕî heye ḱu rêzimanên hemû zimanan bi tûziḱ û rêzanên xwe ve t́ê de dilûsin ..?

Nimone :

- Ez dikenim = ez dibim keniyayî

Dêmeḱ ez bi tiṣt́eḱî dikenim , .. berkareḱî nepen heye..,lewra ṕêjna (dibe) jê t́ê pelandin.. (im)dîsa dimîne paṣgir ..û her weha jî (î-e-in).

Ya dît́ir jî ..dema ḱu ew alavên bûrî karê bûyinê bin çima bi koma ṕênavên xurû ře (min-t́e-wî-wê-me-we-wan) bikar nayên ..?

Nimone :

- Min xist́-t́e ḱujt́(ḱust́)-wî ḱir-wê da

- Me girt́ - we st́and - wan nan bir

Bi karê derhingêv ře ḱirin t́ê û bi karê salt́egêr ře bûyin t́ê.

Dêmeḱî karê bûyinê ..di bûrî de..bi koma ṕênavê (ez) ře teḱezî bi alavên paṣgir (im-î-e-in) t́ê, lê koma ṕênavê (min)..di bûrî de kirina kar bi berkar teḱez dibe, lewra paṣgir ne girîngin..lê di nuhoḱ û ayinde de ..çiḱu koma (min) dibe berkar û koma (ez) tenê li ciyê ḱaranav tê ..loma alavên teḱeziyê t́ên ,..û koma (ez) di çi darêjê debe ev alav bi wê komê tenê ře t́ên,lewra tenê teḱezîne û ne karê bûyinêne(karê alîkar).

T́êbînî: koma (ez) di bûrî de bi karê salt́egêr tenê ře ḱara t́ê ..lê bi karê derhingêv ře dibe berkar, û di nuhoḱ û ayinde de bi

karê salt́egêr û derhingêv ře jî ḱara t́ê,…
belê koma (min) di bûrî de bi karê
derhingêv ře ḱara û berkar jî t́ê.. û bi
salt́egêr ře jî weḱe berkar t́ê , lê di
nuhoḱ û ayinde de ev kom ḱara nayê ..
hew tenê berkar t́ê.

dêmeḱî koma(ez) di hemû deman de bi karê derhingêv ře ḱaraye(ḱirdeye) , lê bi karên derhingêv ře tenê di nuhoḱ û ayinde de ḱaraye, her weha jî bi nav ře û bi alîkariya karê(bûn) t́êt́e bikaranînê, weḱ: Ez Arṣeḱim .

Lê koma (min) di nuhoḱ û ayinde de dibe berkarê durist́ û nedurist́ jî, weḱ:

Seyranê t́e dixwaze

Wê Cîhan min ṣa biḱe

Xunavê xweṣiyê dide min.

Hemû ṕêrnav , ji herdû koman bêyî regez û zayindin, ji bilî ṕêrnavê kesê seyemê nedyer tenha ji koma min, ḱu(wî) nêre û (wê) mêye.

.....

Şîrovekirinekе bi kurtî :

Heger em (im-î-e-in) evan alavêt tekeziya koma ez bikine karêd yarmetiyê û cihê binivîsin ..em guneh karin û ji evan mînakên yekser belû dibe :

Ez im- tu î- ew e-em/hûn/ew in

Bi çi mafî emê lêvokekê bikine du perçe û rawestekekê tê de peyda bikin û nemaze di (tu î) de , çiku em dibêjin (tuyî)..(y) navbiřa du dengedaraye..gelo em ewê (y) a derbasî karmend tevlî (î)yê cihê bikin û ev jî herişandinek ji rêzanên pîtoliya zimanî sirûştî řeye û rewan bêjî li kuderê ma ?

Aya zimanê kurdî ewqasî lawaze?

……..

Ravekirinekê gîrîng :

Pêrnav rastire ji **Cînav** çikû: Pêrnav watêya nav pê řeye dide ..lê cînav hevbendiyekê berovaciye watêya navê cî dide..ango di pîtoliya zimanê Kurdî de, mîna malbata Hindoropî .. palvedar diçe paş û palvedêr li pêş têt ..

Mînak :

Stana kurda = Kurdistan

Stana gula = Gulîstan

Besta dar = Darbest

Navê cî = cînav - ciyê nav = navcî

Girtê cî = cîgir

Giraniya bar = bargiranî

Mêsa kelê = Kelmêş

Xwarina kurtêla = kurtêlxurî

Yek Hesp = hespek

Rêzanên du dengedaran:

Mexabine ḱu em rênivîsa ziman ji rêzimaniyê û bilêvḱirinê cihê biḱin, çiḱu bi çi awayî t́ê bilêvḱirin weha jî t́ê nivîsîn, gelo ma ne ew nivîs t́ê xwendin..?

Rêzanên jevcudaḱirina du dengedaran:

Dema ḱu du dengedar di goṫe an bêje an zarave an ṕeyveḱê de..çi lêḱdayî (hevbend) û çi sadeyî resen (rehmaḱ)..pev bigihêjin ..giraniyê di bilêvḱirina zimên de peyda diḱin , sekn û rawesṫanê ṕêře t́înin,..her goṫineḱ bi rawesṫanê ře biř bi biř t́ê biřîn, ango her goṫeyeḱ dibe dusê goṫin,..lewra em jî evan rêzanan ṣirove diḱin ,

Nimone :

- Gîa - çîa = giya (giha) - çiya

- Sîuî - rêuî = sîwî - rêwî

(in) hem paṣgira jêderiye û hem jî alava tekeziya koma (ez)e ji ṕêrnavên komî řeye.

1 - Ḱu du dengedar di goṫeyeḱê de pevře haṫin :
Yeḱ ji wan dengê dirêj be û a dîṫir ḱin (kurṫedeng) be,..pîṫoliya ziman dinasîne ḱu dengedara ḱin a dirêj boy rewanbêjiyê tavêje,..

Nimone :

- Çûin = çûn

- Bûin = bûn

lê di hin şêwezaran de ḱu (e) bi dengedareḱe dirêj ře were (h-y) diḱine navbiř ..

weḱ : Şêwe**ê** = şêwê = şêwe**yê**

Berate**a** = berata = berate**ya**

2 - Ḱu du dengedar li ṕê hev haṫin :

Yeḱ ḱin be û a dîṫir dirêj be .. û berya herduwan .. tîṕên bêdeng (d) an (b) haṫin , herdû tîṕ xwe diguhêrin û dibin (ṫ) û (ṕ) ,..

Nimone :

- Diêşe = dêşe =ṫêşe

- Diaxive = daxive = t́axive

- Diên = dên = t́ên

- Biavêje = bavêje = ṕavêje

- Biaxive = baxive = ṕaxive

- Biîne = bîne = ṕîne

Her weha jî li gor vê darêjê ..di hin ṣêwezaran de , ḱu (hev) an ṕênavê kesê sêyemê nediyer (wê-wî) an jî ṕênavên nîṣandana dûr û nêz (ewî-ewê-evî-evê).. li dû (di- bi) hat́in û dengedareḱe ṕêgeh li paṣ wan hat́ ..dîsa pevguhert́in ṕêḱ t́ê,..

Nimone :

- Bi hev ře = pevře

- Di hev derbas bûn = tev derbas bûn

- Bi wî - wê ře = ṕêře

- Di wî - wê ře = t́êře

- Bi ewî-ewê ře = ṕêře

- Di evî-evê ře = t́ěře

3 - Ḱu du dengedar pev gihijt́in .. du nîvdengên cihêḱirinê bikar t́ên..dêmeḱî (w-y) nîvdengin .. navbiřê dengedarane û girêḱoḱê biřên goṭeyêne ,.. dema ḱu du dengedar peve gihîjt́in..(w) bi(u-û-o) ře t́êt́ û (y) bi (î- ê) ře t́êt́.. li pêṣiya wan (î) dibe (i) û (û) dibe (i/u) û(ê-o) weḱe xwe dimînin, ev rêzaneke ji xwezaya pît́oliya zimane..

Nimone :

- Şîar = ṣiyar

- Sûar = siwar

- Ḉîa = ḉiya

- Cûan = ciwan(cuwan)

Di hin ṣêwezaran de ..li ciyê (y) tîṕa (w) bikar tînin..û ji dêlva(i) li deverna tîṕa(u) bikar t́înin,

Nimone :

- Sûar = siwar = suyar

- Duem = diwem =duyem

Lê di hin ṣêwezarên dîtir de jî..(Botanî..) .. tîpa (h) li ciyê (w-y) bikar tînin ..

Nimone :

- Şîar = ṣiyar = ṣihar

- Gîa = giya = giha

Ku du dengedarên wekhev hatin dibin yek deng,. lê hin ṣêwezar dîsa(h-y) tavêjin nav wan..

Nimone :

- Cook = cok = cihok

- Kaa me=ka me=kaya me

- Taa = ta = taya

4 - Ku sê dengedar pev gihijtin ..an du dengedarên ku (î-û) di orta wan de ..dîsa (w-y) li nav wan cîgirin lê bêyî ku (i-u) li pêṣiya xwe bikar bînin çiku ew xwe tavêjin nava du dengedaran..lewra (i-u) ne gerekin ,

Nimone :

- Koleîe = koleye
- Şaîan = ṣayan
- Rauan = rawan
- Rêuî = rêwî
- Şêuaz = ṣêwaz
- Kaua = kawa
- Zêua = zêwa
- Kauî = kawî
- Sêuî =sêwî
- Bûîin = bûyin

Dêmeḱî di pevgihîjt́ina sê dengedaran de (w-y) dibin cîgirên tîṕa navîn(ort́ê)..

Arîşa(aloziya) tîṕa /y/ di axaf́tin û rênivîsa kurdî de

Masî- azadî- sêwî

Rê- dê- şê

Ga- ba- ćiya

Şêwe(hawe)- xurme- gewde

Rû- mû- st́û- şû(şo)

Ć́o- ho- ro …..

Dema ḱu em li ṕîvera zimanê kurdî dinêrin .. em pêrgî piř arîşên dûvdirêj dibin, çi di warê axaf́tinê de û çi di warê nivîsê de, bindest́iya zimanê kurdî û ewê jiyana gundît́î û bêyî zanîn …h..w..d..bi bandora şêwezarên deverḱî, holeḱe mezin ji şaşî û çewt́iyê ře di cewşena kêferat́a pît́olî de ava ḱiriye… lewra roj bi roj alozî mezint́ir dibe û arîşe berfireht́ir dibe.

Emê nuha ji evan arîşeyên bêyî bingeh..a herî eşḱere û berćav şîrove biḱin.. ango bi alîkariya ewan bêjên(bêjeyên) jorîn emê şaşî û xwariyê ji rast́iyê bidine nasḱirin .

Ê-A-ÊN : sê alavin heyina samanî û arziyê tekẻz dikín, ango dema kú dibin paṣkokên cihê..(ê) dibe alava arziyê ji nêr ře û (a) boy mêye û (ên) alava arziya komêye…

Dema kú (ê-a-ên/êd-êt́/) ji got́inê cihê bibin ,ew hersê alav ên tekẻziya arziyêne..dêmeḱ arziya tiṣt́an li tiṣt́inî dît́ir vedigerînin ..

Weḱ : Ew bar ê meye

Pert́ûḱa mêjoyî a me bû

Ew dibist́an ên/êd-êt́/ mene

Lê kú paṣgirên ṕêgeh(pêvegihîjt́î) hat́in nivîsandin ew hersê dibin ṕêrnavêt́ ṕêgehî (pêgihîjt́î)..

Weḱ : Ew barê meye

Pert́ûḱa mêjoya me bû

Ew dibist́anên-êd-êt́ mene

Mebest́a me ji evê ṣîroveḱirinê ewe kú em di rêya berfireh ře xwe bi xwest́eḱa xwe bigihêjînin û xwest́eḱa me jî her ew got́e an

bêjeya ḱu di dawiya xwe de li ser tîṕeḱe dengedar radiweste..

Mînaḱ : ji mînakên despêḱa mijara me..

Masî- azadî- sêwî- rê- dê- ga- ḉiya- xurme-gewde....

Her goṫineḱ ji evan mînaḱan bi du darêjan li gor mebesta me bi (ê-a-ên..) ře ṫêṫe darişṫin :

1- (ê-a-ên...) alavên arzî û samaniyêne: paşgirên cihêne..

Weḱ : Ev masî ê deryaye ne ê robaraye (..ên-êd-êṫ deryane...)

Azadî a hişmendaye ne a bêhişaye (..ên-êd-êṫ hişmendane...)

Ew sêwî ê zîreḱ bû (...ên-êd-êṫ zîreḱ bûn...)

Ev řê a gunde ne a bajêre (..ên-êd-êṫ gundin...)

Ev dê a meye ne a kesên dîṫire (..ên-êd-êṫ mene...)

Ga ê Mîtane ne ê Misťoye (...ên-êd-êť Mîtanin..)

Ḱa a nîsḱaye ne a genime

Ev xurme a Cîhane ne a Navdare (..ên-êd-êť Cîhanin..)

Ew gewde ê mêre ne ê jinêye (..ên-êd-êť mêrane ..)

2- (ê-a-ên…) pêrnavêd pêvegihîjťî : paṣgirên pêgehin..

Weḱ : Ev masiyê deryaye ne masiyê robaraye (masiyên-êd-êť deryane)

Azadiya hiṣmendaye ne azadiya bêhiṣaye (azadiyên hiṣmendane)

Ew sêwiyê zîreḱe (sêwiyên zîreḱin)

Rêya gunde ne rêya bajêre (rêyên gundin)

Dêya meye ne dêya kesên diye (dêyên mene)

Gayê Mîtane ne gayê Misťoye
(gayên Mîtanin)

Ḱa(ḱaya) nîsḱaye ne ḱaya genime

Xurma Cîhane ne xurma Navdare (
xurmên/xurmeyên/ Cîhanin)

Gewdê(gewdeyê) mêre ne gewdeyê
jinêye(gewdên mêrane)

Li gor herdû darêjan (1-2-) ťêťe nasîn ḱu arîșe nine, çiḱu di rêzanên durisť ře derbas bûne..

Lê arîșe û pisgirêḱ ewe a ḱu em wê (y) a navbiřa du dengedaran di darêja duwem de vegerînin darêja yeḱemî ḱu (ê-a-ên..) ťê de alavên arziyêne û cihê ťêťin nivîsandin , em wan alavan tevlî (y) a navbiř cihê bibêjin û binivîsin .. ev șașiya herî beloqe..

Weḱ : em bibêjin

Ev masî yê meye.... **yê** ....

Azadî ya hișmendaye.... **ya** ....

Ew sêwî yê zîreḱe …. **Yê** ....

Ev rê ya gunde .... **ya** ....

Ev dê ya meye .... **ya** ....

Ga yê Mîtane .... **yê** ....

Ḱa ya nîsḱaye .... **ya** ....

Ev xurme ya Cîhane .... **ya** ....

Ew gewde yê mêre .... **yê** ....

Heger em evî ṣêweyê axaft́inê û nivîsandinê hilbijêrin û rast́ bibînin ṕêdivêye ḱu em tîṕên (w-h) jî di evê darêjê de biḱin karmend û bi ṕîvera evî biwarî (sebaret bi evê ṕîvanê) biṕîvin , ṣiḱu ew jî mîna rola (y) di navbera du dengedaran de bi kar t́êt́in...

(h) di hin ṣêwezaran de li ṣûna (w-y) bi kar t́êt́..

Weḱ :

Masihê me- rêha gund- xurmeha Cîhan- gewdehê mêr....h ..w..d.

(w) bi dengedarên(u-o-û) ře bi kar t́êt́..

Weḱ : Rû+ê = ruwê bedew

Mû+ên = muwên bizinê

Stû+ê = stuwê te

Şo(şû)+a = şuwa înê

Di evan mînaḱan de (a-ê-ên..) pêrnavên pêvegihîjtîne û (h-w) karmendin di rajeya navbiřiyê dene, ew jî pêwîstin mîna (y) .. ango ku em li gor çewtî û şaşiyê herin pêdivêye em mafê (y) bidine (h-w) jî, herweḱî ku bi çi awayî em (y) hildigirin û bi darêjê ře diguhêzînin raweya pêrnavêd tekeziya arziyê (yê-ya-yên..), (h-w) jî wê bibine (hê-ha-hên..) û (wê-wa-wên..)..

Weḱ : Azadiya me = azadî ya me

Masih ê me = masî hê me

Ruwê me = r u wê me

Û ev arîşe dinasîne ku em di guhêztina (y) de jî bi evî awayî şaşin...

(h-w-y) derbasî navbera du dengedarêd pevgihîjtî dibin dakû rawestinê di navbera du dengedarên li pey hev de bikujin û bilêvkirinê şayik û zelal bikin û mafê rewanbêjiyê bidênê..

Lê kû dengêd paşgir(ê-a-ên..) cihê bûn ango ji raweya pêrnavêt pêgihêjtî derketin û bûn alavêd arzî û samaniyê ..tu rola (y) êdî namîne , herwekî kû mefaya (h-w) jî namîne..

.....

ALAVÊN NERÊNIYÊ (NAYIN)

1- **Bi karê tenê ře** : navekî an karakî an pêrnavekî jêderî û hevdûdanî bi van alavan (ne-na) ..ji karê xurû(bêcan) belû dike ..

Nimone :

- Dikeve = nakeve = nakev (nuhok)

Şûna (di)ya berdewamiyê

- Radiket = ranediket = ranekетî (bûriyê berdewam)

Berya (di)ya berdewamiyê (ne)ya nerêniyê hatiye .

(di) di dema bûrî de (di bûriyê berdewam de) li ciyê xwe dimîne ..daku berdewamiya bersivê , di nerêniyê de jî tekez bike, lê di nuhok de xwe bi (na) di dûxa nerêniyê de diguhêre .

Nimone :

- Radiweste = ranaweste

- Ez dikenim= ez nakenim

(ne - na) du alavên neyinêne di ayinde de xwe bi pêṣgira (bi) diguhêrin.

Nimone :

- Ewê bikeve = ew nakeve (ayinde)

- Bikeve = nekeve (ayinde)

Di raweya bersiv û saloxê de darêj bi (na) hevweḱ dibe..

Nimone :

- Nuha dixebiťe = naxebiťe (nuhoḱ)

- Wê bixebiťe = naxebiťe (ayinde)

Lê di bûriyê derhaťî(mercîn) de (ne) dîsa dibe ṣûngira (bi) .

Nimone :

- Ḱu ew biketa = ḱu ew neketa

- Ewê biketa = ewê neketa(nediket)

Lê bersiva mercîn di dema bûrî de xwe bi darêja bûriyê berdewam bikar t́îne û (di) a

berdewamiyê dibe berdêliya (bi) a nîṣandeḱa ayinde..

Nimone :

- Wê biket́a = nediket́

Bi (wê-dê) alavên ayindê ře û di dema bûrî de..alava berdewamiyê (di) dibe navbiřa (ne) û karê bûrî.

Nimone :

- Ez dê biket́ma = ez nediket́im

- Ew wê biket́a = ew nediket́

Berya tîṕên ṕêbest́ (ne) cihêye çiḱu tîṕên ṕêbest́ tevde (di-bi-ji-li..) ne ṕêgihêjin û her weha jî alavên teḱeziya wan(de-be-ve-ře..) cihêne.

Nimone :

- Di hundir de = ne di hundir de

- Bi darê ve = ne bi darê ve

- Ji wan ře = ne ji wan ře

Bi bêjeyên hevbend ře: ḱu pêṣgirên ṕêgihêj beṣdarê hevbendiyê bin , di hemû darêjan de (ne-na) xwe bi karê rehmaḱî di gihêjînin û pêṣgiran li ṕê xwe dihêlin (dikevin navbera pêṣgirê û kar de).

Nimone :

- Rakét = ranékét
- Vexwar = venexwar
- Hildigire = hilnagire
- Dátê = danayê
- Wergerîn = wermegerîn
- Vêxim = vênexim

T́êbînî: pî́toliya ziman dinasîne ḱu di raweya nerêniyê de karê resen tenê nerên dibe û pêṣgira ṕêgeh karmenda hevbendiyêye …nabe ḱu bi reha kar re dûxa nerêniyê biśtîne dêmeḱ:

Narazê ṣaṣe .. û ranazê raśte.

Alavên nerêniyê di dûxa biryarî (fermanî) de:

Di biryarê(fermanê) de : (ne) dibe (me)..

Nimone :

- Bikev = mekev
- Bíkuj = mékuj

(me) tenha di biryarê de cîgire ..dáku bi hin karan ře dûxa bersivê ji darêja fermanî venasîne.., nemaze bi karnav û jêderan ře..û bi taybétî boy ayinde.

Nimone :

- Ḱewa wî ne reve ha (haydarî)

(tékeziya t́oniya(raweya) neyinê)

- Bila ew meřeve (biryar)
- Ne dizin , dibe ḱu ew rêwî bin

(karê diziyê nákin, dûx û řaweye)

- Medizin , diziyê mékin (biryar)

- Ne tirs û ne rev li ba min heye .

- Metirse , xw mexe tirsê (biryar)

- Memir, canê xwe mede (biryar)

Rêzanînek(rêzikek) :

Dêmekî ku (me) alava nerêniyê di biryarê de .. ciyê (bi) di toniya biryarî de bikar bê ,..darêja nerêniyê pê rewanbêjtir dibe ji (ne),ewkî çawa ku (na) di berdewamiyê de ciyê (di) digire û rewanbêjiyê bi cî dike.

2- Bi du karan û bêhtir re : ..an jî bi pevguhertina wateya çavkaniyan û makan.. (ne-na) di vê darêjê de dibin pêşkokên heçê pêşgirên pêgehên kar jî.

Nimone :

- Diket û radibû = ne diket û ne radibû

(bersive û tekeziye ..di bûrî deye)

- Diçe û radizê = ne diçe û ne radizê

(bersive û tekeziye .. di nuhok deye)

- Hilkiṣandin = ne hilkiṣandin

(jêder waẗeya ċavḱaniyêye)

- Hilkiṣandî = hilnekiṣandî

(rewṣ û dûx û baraye)

Ev ṣêwe heyḱu bi kareḱî tenê ře gumana waẗeyeḱe dîẗir ava biḱe..

Nimone :

- Ew ne dixwe û ne vedixwe

Dêmeḱî belû dibe(ẗê nasîn) ku ew kareḱî dîẗir diḱe , ċiḱu ev bersiv kareḱî nepen li piṣẗî nerêniyê bi guman diḱe û teḱeziya wî gumankarî bi (lê-welî- belê-balo…h..w..)

Nimone :

- Ez diṣewiẗînim = ez na(ne) diṣewiẗînim

lê ez dikelînim ,belê ez dibirêjim..û ku bibe ez naṣewiẗînim ..dêmeḱî ez biryara bidawî kirina kar disẗînim ,lewra nema gereḱe ku ez li dû binêrim,bi vê darêjê dibe ḱu hevoḱeḱe dirêjî neyinî bibe

daḱu bersiveḱe ji gumanên nuh bi erênî jêře peyda bibe û teḱez bibe..

-Azad û Şahnaz bûn..ên ḱu li ahengê bûn =

Ne Azad û Şahnaz bûn..ên ḱu li ahengê bûn, balo Ferhad û Şîrîn bûn , an jî Azad û Şahnaz ne li ahengê bûn, belê Azad û Şahnaz li malê bûn … û her weha di hemû darêjan de…

Ťêbînî: nas bûye ḱu (di) alava berdewamiyêye di bûrî de bi alav nerêniyê (ne) ře ťê û di nuhoḱ de bi alava nerêniyê (na) ťê guhêrťin , lê hindeḱ raweyên awarte bi dûx û rewṣan ře jêře hene , di(jêderan û ḱaranavan de…h..w..) ṣiťyare.. ango alaveke nerêniyêyî dîťir (ni) xwe berz diḱe û bikar ťê û di erênî û nerêniyê de rola (di) dimirîne…

Mînaḱ:

- Diḱare = ḱare = nediḱare = niḱare

- Dizan=zane(zana)=nedizan=nizan

- Zanîbû=nizanîbû

- Zanibe = nizanibe

- Diḱarim =ḱarim = niḱarim

Her weḱî ḱu (bi) tîpeḱe ṕêbest́e û (bê) bûye alava nerêniyênî ne yeḱser:

- Bi xweṣî = bê xweṣi

- Bi zanîn = bê zanî

…….

Nerênî û nerêniya nerêniyê :

Ťêbînî:

Ḱu (na) bi tenha xwe (cihê) haťew alaveḱe neyinê teḱez diḱe.

Nimone :

- Na ezê biḱujim - na ez naxum

Lê ḱu (na) pêgihêj haťew jî mîna (ne) li henkûfî darêjên hevoḱê..karê nerênî teḱez diḱe.

Nimone :

- Ez naçim - ew nayê(na+ê)

- Ťu nediçû- em nereviya bûn

Di dûxa biryarî de (ne) di hin şêwezarên kurdî de (weḱe ḱu me berya nuha şanî daye) ..dibe (me) ,çiḱu giringe em jî pirbare diḱin .

Nimone :

- Mekene- megirî- metirse

- Mavêje- meleyzin- meyên

Lê hin durvên resen hene ḱu nerêniyê nerên diḱin..lewra ṕêwîst́î bîranînêne:

1- Ḱu (na) cihê hat́ û bi dûvre nerênî dîsa bi (na) hat́..dibe nayin û t́onî bersiv û fermane û darêj nuhoḱe..û ayindeye..

Nimone :

- Na naxwe (na xwarinê naxwe)

- Na natirse (na ji tiṣt́eḱî natirse)

2 - Ḱu (na) cihê be û (ne) nerêniyê bide..dibe nerêniya neyinê ..û darêj di bûrî de bersive.. lê di nuhoḱ û ayinde de biryare û (ne) dibe (me)..

Nimone :

- Na nema - na neçû (bûrî)

- Na meyê - na meken (biryar)

- Na merev - na meḱ (biryar)

3 - Dema ḱu (na) cihê be û (ne) di nuhoḱ de berya (di)ya berdewamiyê hat́..dibe nerêniya

raweyê bi tevayî û raweyeḱe dît́ir dinasîne..
lê di bûrî de bersive û teḱeziya saloxêye ..

Nimone :

- Na nedidize , dêmeḱî ne bi ḱarê

diziyê radibe..kareḱî dît́ir diḱe dibe ḱu eṣḱere be. (nuhoḱ)

- Na nedikeniya .. û hew..!!

4 - Ḱu (ne) bû pêṣgira (na-ne) herdû pêṣgirên nerêniyênî pḱêgihêj.. dibe raweya nerêniya nerêniyê û bersiveḱe nû..an saloẍeḱe nû dinase û teḱez diḱe…

Nimone :

- Ne naxwe = dixwe

- Ne nagirî = dêmeḱ digirî

- Ne neraśte = dibe ḱu raśt be jî.

- Ne nedidît́ = didît́

Lê di raweya pirseyarî de .. pḱêwîśtî bersivêye..

Nimone :

- Ne naxwe ? .. de bila nexwe..

- Ne nerasťe ?.. ka a rasť çiye ?

5 - Ḱu (hew-tenê) li dû evan darêjan hatin ..waťeya nerêniya raweya kar..û raweya kareḱî an rewṣeḱê an naveḱî dîťir jî dinasîne û an jî neyin diḱe.

Nimone :

- Ne tenê neqence = dêmeḱ hin rewṣên dîťir jê ře hene.

- Ne qence û ne paḱe .. û derewîne.

- Ne hew ew nehať ..Aras jî nehať û Azad jî nehať .

- Ne nekeniya tenê .. negirnijî û xeyidî û werezdar jî bû .

- Na hew naçe mala Azad..dibe Ku biçe mala Memo .

- Na bitenê neyê..bi hinî dîťir ře wer .

- Na hew nediçû .. lê wê bileyizt́a .. rûniṣt́a .

- Ne tenê nagirî..napeyive jî .

T́êbînî :

Di ayinde de bi karên gûmanî ře (ne) alava nerêniyê bikar t́ê..

Nimone :

(eger- hey- kaḱu- t́a ..) nereve..

Bi alavên merciyê ře :

Nimone :

- Ḱu nereve

Bi (divê- nabe) û bi biryarê(fermanê) ře (ne) bi (me) hevgel dibe..

Nimone :

- Neḱuj = meḱuj

- Mekene- divê meçe- mexwe nabe- medize .

Erêniya erêniyê (teḱeziya teḱeziyê)

Dûbareḱirina rewṣeḱê(rengedêreḱê) an dûxeḱê (raweyeḱê) teḱeziya erêniyê bi cî dibe..

Nimone :

- Mêrê mêr bû - jina jin bû

- Baṣê baṣ - qenca qenc

Alavên paṣgir .. ên nijadî ḱu tuxum dinasînin

(ê) boy nêre û (a) boy mêye û (ên) boy komêye, lê di raweya nenasiyê de (eḱ) boy ḱet́e û (id-in) boy komê ..dibin paṣgirêd rewṣê.

Paṣgira nijadî (î) boy tuxumê nêre û (e) boy mêye..

Nimone :

- Mêreḱî mêre - qîzeḱe qîze

Û boy komê (inî-ine-id-êd..) paṣgirin ..

Nimone :

- Xorṫinî xorṫin - ḱeçine ḱeçin

- Xurṫêd xurṫin - ṣêrid ṣêrin

PÊRNAVÊD NÎŞANDANÊ

{NÎŞANNAV}

Pêrnavêd nîşandanê :

Şûna ka̕ra û navan bi şêweyê nîşandanê digirin, ew jî mîna Pêrnavên kesane du komin:

1- (ev-ew-evana-ewana) .. bi teke̕ziyê re dibin (eve-ewe-evin-ewin)..zayinda nêr û mê nine.

Mînak̕ :

- Ev dize = eve diz
- Ew mêre = ewe mêr
- Evana şêrin = evin şêr
- Ewana ke̕çin = ewin ke̕ç

Di bûrî de bi karê salte̕gêr re cîgirê ka̕ra bikar te̕n û di nuhok̕ û ayinde de bi hemû darêjan ..bi karê salte̕gêr û derhingêv re jî ka̕ra bikar te̕n.

Mînak̕ :

- Ew gur reviya (bûrî)
- Ev dar diheje (nuhoḱ)
- Evana dê birevin (ayinde)
- Ew xorťana wê ṣiyarbin (ayinde)

(ana) paṣgira nav ťê nîṣandeka komêye.

2- {evî(vî-viya) -evê(vê-vêya) -ewî(wî-wiya) -ewê(wê-wêya) -evan(van) -ewan(wan)}..di bûrî de bi karê derhingêv ře weḱî ḱara bikar ťên ..lê di nuhoḱ û ayinde de bi hemû dûxan ře dibin berkar..

Mînaḱ :

- Evî ḱarî ṣîrê dê mêť
- Viya ṣîrê dê mêť (bûrî)
- Siwar li ewê hesṕê digere
- Siwar li wêya digere (nuhoḱ)
- Heval wê ewan dara bibiře
- Hevalê wan bibiře (ayinde)

Rêzan(rêziḱ):

Ḱu ṕênavên nîṣandanê..çi nêz û çi dûr.. bi nav ře haṫin ew nîṣannavin, lê ḱu keṫin ṣûna nav de.. dibin ṕênavêd nîṣandanê .

Mînaḱ :

- **Ev** gul ji **wê** gulê bihinxweṣ́tire
  Ev boy nêz û wê boy dûr nîṣannavin
- Evê ew dît́ û ewê(wê) ev nedidît́

Evê- ew- ewê- ev . . ṕênavêd nîṣandanêne .

- Ewana mirovêd mene

(î) ji nêr ře û (ê) jibo mê.. herdû dibin paṣgirên navê nîṣandayî..

Mînaḱ :

- Evê ḱeçê - ewî ḱurî

Tevî ḱu ṕênavêd nîṣandanê û nîṣannav jî cihê t́êne nivîsîn .. lê ḱu (evê) bû pêṣgira (salê- carê- rojê- ṣevê) .. xwe bi (î) diguhêre û(î) jî ṕêgihêj dibe..

Mînaḱ :

- Evê salê = îsal
- Evê carê = îcar
- Evê rojê = îroj
- Evê ṣevê = îṣev

Ťêbînî :

(han-hanê-ha-he) alavên teḱeziya
ṕêrnavêd nîṣandanê û nîṣannavane..

Mînaḱ :

- Ew ḱeçḉa ha qence
- Ewa hanê qence
- Ev xorťê ha(he) ciwanmêre
- Evê ha ciwanmêre
- Evêd-ewêd han(hanê) zarxweṣin

Di hevoḱa dawî de tibab û babeťên celeb ťêne nasḱirin.., dêmeḱî êd ne zarxweṣ jî hene..

Nimone :

- Ev dara ha ṣêne

Ango ji dara ev ṣêne û heyḱu ên neṣên jî hebin.

Agahî: ṕêrnavên nîṣandanênî ḱu dûr û nêzîḱ nanasînin jî evin : (ê-a-ên-êt́-êḱ), lê hejmar û zayindê(nêr-mê) dinasînin.., herdem ḱarane û alav girêdanê(ḱu) bi wan řeye.

Weḱ : Ê haťî Azade- A ḱu ťu dibêjî Bêrivane- Êt́ nezan hûnin- Êḱ here mêre- Ên çûyî piřťirin.

(ev-ew) mîna ṕêrnavê kesîn(ew) ji koma (ez) di hevoḱê de bikar ťên, (evî-evê-ewî-ewê) jî mîna ṕêrnavêd kesîn(wî-wê) ji koma (min) di hevoḱê de bi kar ťên.

ṔÊRNAVÊD ṔÊGIHÊJTÍÎ

Ṕêdivêye ḱu hevoḱa ṕêgeh saloxî be daḱu ṕêrnaveḱî ligor ṕêgihêjt́inê t́êde peyda bibe , ew havila ḱu di pevgihêjt́inê de xuyan dibe bi navê berya wê ve girê bide , .. û ṕêrnavêd ṕêgihêjt́inê jî evin :

(ê ḱu - a ḱu) boy nêr û mê , û (ên ḱu) boy komîne.

Nimone :

- Ê ḱu pert́ûḱ xwendiye
- A ḱu karmende
- Ên ḱu ṣoreṣgerin

Ṕêrnavê ṕêgihêjt́î bi tena xwe ḱaraye:

Nimone :

- Ê ḱu agir dada
- A ḱu çû bêriyê
- Ên ḱu dibist́an ava ḱirin

Pêrnavê pêgihêjtî dibe berkar jî ku kara nepen be.. û (hat- tê- hatin- tên- pên- werin) li pê pêrnavê pêgihêjtî û berya kar tên ..

Nimone :

- Ê ku hate kujtin
- A ku tê vesartin
- Ên ku pêne revandin

Dibe ku alava (ku) bête avêjtin boy sivikkirina devikî ..

Nimone :

- Ê ku hate dizîn = ê hate dizîn
- A ku çû = a çûyî
- Ên ku reviyan = ên reviyan

Bi devokê ev pêrnav verêz bûne, wek:

Evê ha=(vîna-viya-evîna..), eva ha = (evêna-vêya..),(vana-wîna-wêna-ewaya-wana..û..h..w.)

ṔÊRNAVÊD PIRSEYARIYÊ

(gît́)

Ṕêrnavêd pirseyariyê :

(kê-kî- kîjan) boy hişmend û candaran , û (çi- çima-çawa-çilo..) boy babet́ê bêcane , şûna nav bi darêja pirseyarî digirin,(çend) ji hejmarê ře,(kengî)ji demê ře,(ku) ji cîh û deverê ře,(ma-gelo-qey-erê-aya...)..,tevde şûna nav û ḱara û di hin raweyan de ciyê berkar jî digirin.

Mînaḱ :

- Ew kiye ? - Şêrzad kîjane ?
- Çi kese ? - çi renge ?-Kengî hat́in?
- T́u ji kuyî? (ji ku der û deverêyî)
- Ma t́u ji vire?- Çend birane?
- T́u çawayî? - Hûn çilo(çer) diḱin?
- Gelo dibe?

Agahî:

- Kîjan = kî ji wan - kî ji van

Ťêbînî :

- Kî û kê ?

Kî: di bûrî de bi karê salťegêr ře ṣûngirê ḱara û pêrnav û nave , û di nuhoḱ û ayinde de bi karê derhingêv û salťegêr ře jî dibe ṣûngirê ḱara û berkar jî ..

Nimone :

- Kî çû ? (ḱara- bûrî)
- Kî reviya ? (ḱara- bûrî)
- Kî diçe ? (ḱara- nuhoḱ)
- Kî biçe ? (ḱara- ayinde)
- Ew kiye ? (berkar-nuhoḱ)
- Ťê kî be ? (berkar-ayinde)
- Ťê kîjan be ? (berkar-ayinde)

Lê di bûrî de bi karê derhingêv ře ṣûngirê berkar t́ê ..

Mînaḱ :

- Kî revand ? - kî xwar ? (berkar)

Kê : di bûrî de bi karê derhingêv ře dibe ṣûngirê ḱara û bi karê salt́egêr ře ciyê berkarê nedurist́(neyeḱser) digire ..

Mînaḱ :

- Kê dar ṣiḱand ? (ḱara)

- Kê paleya we ḱir ?

- Bi kê ře çû ? (berkar)

Lê di nuhoḱ û ayinde de bi karên salt́egêr û derhingêv ře jî dibe cîgirê berkarê neyeḱser..

Mînaḱ :

- Bi kê ře dikene? - bi kê ře direve ?

- Ji kê ve xuyan be ? kê nas biḱe?

P̀ÊRNAVÊD ARZÎ

P̀êrnavêd arzî : ṣûna navên tiṣt́an digirin..û
p̀êrnavên arzî evin (ê)jibo nêr û
(a) boy mê û (ên) ji komê ře..

Mînaḱ :

- Birê(birayê) min
- Xûṣḱa t́e
- Xûṣḱên me
- Birayên we
- Xûṣḱa min û birayê wan

P̀êrnavê arziyê (xwe) giṣt́iye..bi hemû darêj û raweyan ře bikar t́ê..

Mînaḱ :

- Beranê xwe - hevalêd xwe
- Min xwe - t́e xwe - wî xwe - wê xwe

- Me xwe - we xwe - wan xwe

- Ez xwe - t́u xwe - ew xwe

- Em xwe - hûn xwe - ewên(ewan) xwe

ṔÊRNAVÊD NEPEN

Ṕêrnavêd nepen: (yeḱ-tu-her-hin-piř- hemû) bi (kes-mirov-tiṣt) ře t́ên..û bi awayeḱî veṣirt́î nasîn û xuyanḱirineḱê dide.

Mînaḱ :

- Yeḱ kes (keseḱ)
- Tu kes- tu tiṣt́-tu mirov
- Hin kes (hineḱ-kesin)
- Hin tiṣt́(hineḱ tiṣt́- tiṣtin)
- Hineḱ mirov(mirovin)
- Her kes-her tiṣt́-her mirov

BERÊ SÊYEM

NAV

Nav : lêvokeke xweguhêre(sanbole) boy nasiya mirov … lawir … û tiştaye …

Nimone :

- Mirov: Kawa - Zuhrab - Binefş -Zîn

- Lawir: şêr - kerqolan - kew - ejdîhar

- Tişt: çiya - asîman - ziving - zemîn

Û jibo wateyeke nepelandî û nediyer :

Nimone :

- Bext - derd - dawer - hêvî

Nav bi du cureyan şirove dibe :

1- Nasenav :

Nimone :

- Kîwan - Amed - Zîlan

2- Hevbendenav (jêpernav):

Goťeyeḱ bi pêṣgir û paṣgiran ře..
an jî bi goťeyeḱe dîťir ře….

Nimone :

- Gulîzar - Şahyar - Ciwanmêr

- Dilṣad - Serkan - Gulîsťan

Nav û dûnav :

Nimone :

- Bavê Şêrzad - Diya Kawa

Rewṣenav:

Ji qencî an keçiyên pesinda řeye..

Nimone :

- Rêber - Ḉavbeq - Serxur

- Bêbexť - Şervan- Sermezin

Dûxên nav:

1- Bêcan : du curene..

A- Xwenav :

Navê xurûye û xwewaťeye..

Nimone :

- Mirov- zêr- berf
- Baran- ḱevir- ar
- Zar- ḱew- masť

B- Rezbernav:

Navê tiṣťê nepelandî û nedîťî dinasîne…

Nimone :

- Zanesťî- reṣayî- kovanî
- Ronahî- mêrxasî- hingivîn

2- Jêpernav :

Navên jêper ji bilî xwe haťine..

Nimone :

- Zana- Hozan- Rêwî

Jêdernav:

Navên jêderî bi xwe maḱin..

Nimone :

- Bez- rev- ken-girî
- Kirîn- firoṣ́tin-bazirgan

Celebên nav: du celebin..

1- Navên Şênberî :

Tiṣ́tê pelandî û diyer dinasîne

Nimone :

- Ḉiya- Dar- Ax
- Hesin- Gul- Mêwe

2- Navên rezberî :

Nimone :

- Hay- hesṕ- hiṣ
- Bîr- xewn- raman

Navêd koman :

Komelêd candaran dinasîne..

Nimone :

- Civaṫ-leḱ(leq)-êl-hoz.. (boy:mirovan)
- Naxir (boy:dewaran)
- Ḱerî (boy:ṕez)
- Garan (boy:ḉêleḱan)
- Boṣ (boy:deveyan)
- Ref (boy:balindeyan)
- Biř(biřiḱ) (boy:hindeḱ ji hemûyan)

Ṫêbînî:

Navêd nêr û navêd mê ligor bihîzṫinê ṫên.., dema ḱu ne jêper bin..

Nimone :

- Ḱeḉ - ḱuř
- Bizin - nêrî(nîrî)

- Mîh -beran

- Mirîṣḱ- keleṣêr(dîḱ)

- Hesṕ - mehîn

Bi piřanî (dêl) boy lawirên diřende û(mê) boy fiřînḱ û balindeyan mêbûnê dinasîne..

Nimone :

- Şêr = dêleṣêr

- Sah = dêlesah

- Gur = dêlegur

- Ḱew = mêḱew

- Ḱund = mêḱund

Lê bi hin raweyên dît́ir ře jî (mam- da- dê- nêriyê- beranê- ṕeza ..) bikar t́ên..

Nimone :

- Mambiz- daṕîr

- Dêker (kermaḱ)

- Nêriyê ẍezalan- beranê kwêvî (kovî)

- Ṕeza reṣ- ṕeza kovî

Navêd regez :

Her naveḱ danasîna celebê xwe dide..

ew navên ḱu babet́ û regezên tiṣt́an dinasînin..(boy jevcihêḱirina celeban)..

Nimone :

- Dewar- mal- ḉem

- Jin- ax- keṕez- qelaḉ

- Ḉilo- berg- mêwe

Regezê her yeḱî an yeḱê ji wan jev cudane.. ango Dewar.. hemû dewar.. û Jin ..hemû jin.. û Keṕez.. hemû keṕez.. h…w…

Navêt́ amûrê :

Ewz û amûran dinasîne.. û ew jî du curene :

1- Xurû :

Ji xweber ve hene..

Nimone :

- Meř - bêr - řim - peyal - hîz

2- Hevbend :

Bi paṣgirên (dan- danḱ- ḉîv- eḱ- ing-) ava dibin..

Nimone :

- Ḱildan- Ḱevḉîdanḱ

- Biřeḱ - derzîdanḱ- pêḉeḱ

- Ḱilḉîv- rojing- badeḱ

Navên cî :

Ên xurû: ji xweber ve hene..

Nimone :

- Xanî- pîn- rez

Ên hevbend: bi evan paṣgiran (dan- sťan- geh- xane- zar) ava dibin

Nimone :

- Xwelîdan- meyxane

- Kurdisťan- gulîzar- seyrangeh

Navê biçûḱirinê :

Bi paṣgira (iḱ) biçûḱirin peyda dibe..

Nimone :

- Berx = berxiḱ

- Gwîz = gwîziḱ

Û hin caran bi paṣgira (çe) jî biçûḱirin ťê..

Nimone :

- Par = parçe
- Baẍ = baẍçe
- Daman = damançe
- Nave = navçe

NÊR Û MÊ DI NAV DE

Di zimanê kurdî (kurdmancî) de nav bi du nijadan nas dibe...nêrza û mêza , nijad û regez ..nêrza û mêza jev dinasîne ..

Mînaḱ :

- Mîh û bizin mêne
- Beran û nêrî nêrin

Di kurdî de ji bilî navên ḱu hatine naskirin .. navin dîtir jî hene ḱu di her ṣêwezaran de ne hevweḱin, ango li gor bihîstinê nêr û mê dibin..

Mînaḱ :

- Evî bayî = evê bayê
- Hesṕê me = hespa me

Lê bi nîṣandeḱên nêr û mê (ê-o) ku dibin paṣgirên ṕêgihêj û bi ṕêrnavêd arziyê(ê-a) û bi ṕêrnavêd nîṣandanê(evî-evê-ewî-ewê…) tiṣtên xwestî ..nêr û mê dibin..

Mînaḱ :

- Mêro- jinê- Memo- Zînê
- Ḱewê min- Ḱewa min
- Evî berxî - evê berxê
- Ewî ḱarî - ewê ḱarê

Navên nêr: ji evan hejmaran t́êne nasḱirin:

1- Seqa û keṣ:

- Ba - ewr - asîman - kej…

2- Xaḱ û zemîn:

- Ḉiya - gir - qelaḉ - baẍ - werz - ḉem - robar -zinar - nizar - tulm - ḱendal- tixûb - sînor - kaṣ -ṣênḱayî - ṣewl - giya - ḉilo - tevayên darên hiṣḱ ji bilî ṣivê {dar-text́-beṣt́-t́îriḱ-beyiḱ-mircaq(mirdiyaq)} - ḱevir - hîm ….

3- Cîh û war :

- Welaṫ - bajar - gund - xanî - hundur - ḳavil - lehn - ḳon - dîwar ….

4- Laṣ û gewde :

- Por - mû - ser - mejî- hiṣ - ḉav - ṕoz - guh - dev - deng - rû - diran - ziman - husṫ(sṫû) - pî - hesṫî - dil - desṫ – ḉeng - ziḳ - hur- rîv - durv - pîsî - ṣermecî - ling - cerg - hinav - gulî - ḉerm - pergal - bez - hay - hesṫ - ṫerm - cendeḳ - can - giyan - mêr - law - ḳur - bexṫ - hinav - kar ….

5- Xwarin û firaxên malê:

- Nan - genim - ceh - ṫirî - zebeṣ - kaliḳ - ṫaliḳ - ṫirozî - arû - encûr - hingiv- masṫ - ṣîr - ṕenîr - dew - rûn - goṣṫ -ṣeḳir - ṣîranî - gezo - êmîṣ - dahn- sindiḳ - misîn - çaydan - kwîz

- cewdiḱ - hesťe - ḱevçî - qazme - hîz
- hac - şûr - mertal - çenbil - desťiḱ ..

6- Cil û berg :

- Kiras - xifťan - kum - koloz -
şal - şapiḱ - çakêť - panťol -
qapûť - derpî - şerwel - guhar -
bazin - caw - ťa (dezî) - ben -
yeleḱ(êleḱ)- gomleḱ- rexť - zirx ..

7- Navên jêderî :

- ken - girî - navên rengan(
sor- şîn- keşḱ- reş- zer….) - ji
hejmarê (deh- sed- hezar-
melyon …) ..

Navên mê :

Tişťên mayî ji ewan mêjerên jorîn ..
bi piřanî mêne tevlî darên ťer û şîn .

Ťêbînî(1): hejmar li gor nijad nêr û mê dibe ..

Ťêbînî (2): herçi navêd komelên(cêzên) tuxum û mêwe û ṣêndar û qatix û piř tiṣtên dîťir…. di darêja pirs û bersivê de ḱu nêr bin ḱeť bi darêj dibin , çiḱu merce ḱu ew nav babeť û cure ḱeťe diḱe.. lê ḱu mê bin komdarêjin , çiḱu merce ḱu ew nav babeť û cure kom diḱe … ango navêd babeť nêrza kom dinasîne û mêza ḱeťe dinasîne

Mînaḱ : dema ḱu kesek pirsa hebûnê bi gelamperî diḱe.. û bersiv ťêťe dan

(raweya pirs û bersivê).

Mê …

- Nîsḱ = nîsḱ hene ?
- Noḱ = noḱ tunene
- Zeytûn= zeytûn hene?
- Dendiḱ tunene?
- Mewîj ninin
- Sêv tunene

- Hejîr hene
- Xurme hene?
- Êzing hene
- Mîh tunene
- Bizin hene?
- Ḉira hene?
- Bêr hene
- Gul.. an.. ḱulîlḱ.. hene?
- Ṕîvaz mane?

Nêr…

- Genim = genim heye
- Ceh = ceh tuneye..
- T́irî = ́tirî heye
- Ṕenîr heye
- Mast́ tuneye

- Sindiḱ heye

- Goṣt́ nine

- Giya(gîha).. an .. Pincar.. heye

Û hin awarteyên evê rêziḱê hene dema ḱu ji nêr ře tibabê kom dide nasîn û ji mê ře tibabê ḱet́ dinasîne..

dêmeḱî navên babet́î ḱet́ê nêr ḱet́e dihêlin , û ḱet́ê mê kom diḱin.. lê navên tibabî .. dibe ḱu hindeḱ tiṣt́an ji ḱet́ê nêr jî kom biḱin û ḱet́ê mê jî ḱet́e bihêlin, çiḱu bi terazûya tibab diṕîvin.. ne bi a babet́ … lewra hin navêd nêrza jî kom t́ên û hin navêd mêza jî ḱet́e t́ên..

Mînaḱ :

- Libeḱ heye?

- Zebeṣ hene

- Xirt́iḱ (dolme) tunene

- Şiḱêr tunene?

- Darçîn heye?

- Şêranî heye

- Govend tuneye

KAR

Kar : ṕeyveḱe xweguhêre , kareḱî an bûyereḱê (ḱirinî- bûyinî) bi demeḱê ře dinasîne..

Mînaḱ :

- Min Şêrîn **dît́**
- Ez **dilezîn**im
- Bekoyê ewaniyê **biḱe**

Rewanbêjiya (Bekoyê) ji (Beko wê) haṭiye.. çiḱu (wê) ji ṕêrnavê (ew) ře (eger ḱeṭe be û eger kom be jî) alava berdewamiyêye, herweḱî ḱu (dê) boy ṕêrnavêd (ez-ṭu-em-hûn).. alava berdewamiyêye..û raweya (ê) dibe ḱu bibe ṕêrnavê arziyê jî di dûxa nîr ûmercîn deye… Beko ê ewaniyê diḱe..

Rêziḱ(rêzanînḱ):

Berkar berya kar ṭê .. û ḱara.. an nav.. an ṕêrnav jî .. berya giṣṭan (tevan- hemûyan) ṭê ..

Mînaḱ :

- Ez mêweyê ji darê diḱim
- Çeṕo ava germ sar diḱe
- Nivîser perṫuḱa xwe belav diḱe

KÊŞAN: guhêzṫina kar bi awayeḱî berbi qewaraḱe nas de .. û di demeḱe xwesṫî de …

Kar bi rêzanan ava dibe :

1- Tiṣṫên kesane…

2- Tiṣṫên tibabî..

3- Çaẍ û dem…

4- Pîvan û dûzan û sazî..

Hêmenên avakirina kar :

Rakêşa rûxsarên kêşan û vewêniya tûzik û rêxistinên darêjên sazkirina rêzimaniya kare.

1- kesane : her karek xwedî karaye (nav - pêrnav) û kar pêve girêdayiye .. û ew kes dibe karayê kar,.. û di her karekî de sê kes têne nasîn ..

1- Axavtinkar :

Wek :

Min kir - min bir

2- Diyer (pêřaxêv) :

Wek :

Te kir - tu çû

3- Nediyer :

Wek :

Wî dizî

2- Tibab : kar di kurdî de du tibabin (kete-kom)

1- Ḱu ḱara û berkar ḱeṫe bin kar jî ḱeṫe ṫêṫ..

Weḱ :

Azad Şêr dîṫ

Wî dar biřî

2- Ḱu yeḱ ji wan an tev kom bin kar jî kom ṫêṫ..

Weḱ :

Ferhad û Salar guleḱ çinîn

Kardox Şîrîn û Leyla dîṫin

Di hevoḱa pêşî de ḱara kome.. û di a dawî de berkar kome.. lê kar di herdiwan de kome.

3-Çaxên kar : darêjên demê ji kar ře hene dako toniya kar di çaẍ û heyamê kar de belû bibe, dem berdewame û kar jî pḗře bi darêj dibe.. û ev alav jêře alîkarin(bû-ba-be-ḱir -ye-me-ne..)..bûyer û kar di rêkefṫeḱê (demeḱê) de pḗḱ nayên û dem jî di yeḱ radeyê de nayê .. balo

dem berdewame , lewra kar jî beyî demê ṕêk nayê..

1- Dema bûrî (buhêrḱî) : ragihana bûyina ḱirina kar di berî dema axaf́tinê de diḱe (dema berya axaftinêye)...

Mînaḱ :

- Xwend - kiřî

- Firotibû - dikeniya

Bi herdû komêd ṕêrnavan (koma-ez-t́u-ew-em-hûn-ew+an-) û (koma-min-t́e-wî-wê-me-we-wan-) li pêṣiya xwe qayile..

Mînaḱ :

- Min xwarin xwar

- Ez ji ber gur reviyam

Qonaẍêd bûrî : dema bûrî bi du qonaẍan nas dibe.. dûr(mêj) û nêz..

1- Bûriyê dûrê guhêzt́î : dema neberḉave .. dûrî dît́inêye gûman t́ê de heye..

Weḱ :

Ez çûme - min dîtiye

(e) paṣgire .. ṕêgihêje .. nîṣanḱa dûriyêye

2- Bûriyê nêz (durist): dema berḉav û yeḱsere .. gûman t́ê de nine .. teḱeze..û darêj bi avêjt́ina paṣgirê serast́ dibe..

Weḱ :

Ez çûm - min dît́

Ew ket́in - wan revand

Beṣên bûrî : du beṣin .. berdewam û teḱûz(kut́ahî)..

1- Bûriyê berdewam: bi alîkariya (hê-hên) li pêsiya kar berdewamiya

bûrî nas dibe û pêşgira pêgihêj
(di) alava berdewamiyêye ..

Mînaḱ :

Dixwar = hê dixwar

Difiřiyan = hên difiřiyan

2- Bûriyê teḱûzê dûr : bi karê bûyinî û ḱirinî ře
di dema bûrî de alava
(bû) dibe paşgira pêgihêj

Mînaḱ :

Keťibû - reviya bûn

Saẍ bû - mirî bû

Lê ḱu gûman an pirs xwezî…h..w.. peyda be (ba-be-bana) li gor komê û ḱeťe dibin paşgirên pêgihêj..

Mînaḱ :

Ḱu haťiba

Kaḱu miribana

Eger reviyabe

Raweya bûriyê bersiva ayindê jî ji bîr nabe :

Mînaḱ :

Minê bixwara

Ezê bihátama(hátibama)

2- Dema nû (nuhoḱ) : ev dem bixwe dema axafd̀inêye (heyine) nederbase.. hê em têde dijîn …du beṣe..

1- Nuhoḱê sade: kuta û teḱûze ..

Mînaḱ :

- Ez saẍim - t́u heyî

2- Nuhoḱê berdewam :

Alava berdewamiyê (di) pêṣgire û alavêd teḱeziya ḱoma pênavê (ez) paṣgirin..

Mînaḱ :

- Diṣewit́e - dinivîsin - dixwazî

(ni-na-ne) alavên nerêniyê û (ṕê-jê-lê…) gît́ên saloẍî ji nuhoḱ ře alîkarin…

Mînaḱ :

- Tu kes nizane wê di siṕê de çi bibe
- Ême em jê t́înin û em ṕê dikenin û em lê dimînin….

3- Ayinde û biryar(ferman) : ew dema ku li pişt́î axaf́tinêye (hê wê bêt́).. û (bi) pêşgira kar pişt́î nîşandeḱên ayindê (wê-dê) t́êt́..

Mînaḱ :

- Ez dê biçim
- Ew wê koçber bibe
- Meřev- mediz - meken (biryar)
- Ezê biçim gulîst́anê
- Zînê bêt́e dibist́anê

Raveḱirin:

- Ji ezê (ê) xurdebêjeḱe paşgire û kurt́e wat́eya dûxa (ê-yê) ṕêrnavê kesînî veşirt́î dide û darêj jî eve : **ez ê (yê) dê biçim gulîst́anê**

-Ji zînê (ê) nîşanḱa mêye weḱî ḱu (o) nîşanḱa nêre û darêj jî eve : **zînê wê bêt́e dibist́anê**

Şêrîn(ew+ê) biçe malê = şaşe û keć́e

Şêrîn(ew+a) biçe malê = durust́e

Şêrîn(ya+wê)biçe malê = darêje

Dêmeḱ:

(ew wê) biçe malê

-Girînge ḱu mafê(w)winda nebe û (wê) ne lihevxist́iye .. (ew) pêrnave ji hevoḱê dert́ê .. lê (wê) alava ayindêye û hevalbenda (dê)ye di axaf̌tinê de dimîne..

Weḱ:

Şêrîn wê biçe malê

Û beṣnî dît́ir ên cuda hene:

Weḱ:

Ť́u xwe ji bîr meḱe

Ḱu hûn herin malê

Eger bimirin

Û ayinde bi çaẍ û demên dûr û nêz ře piř durv û ṣêweyan ravediḱe.

Di ayindê de (wê-dê) nîṣandeḱên ayindê û (na-ne-ni) alavên nerêniyê .. û (ḱu-eger……) nîṣandeḱên gûman û pirs û xweziyê û (ji-jê-lê-di-bi- da-t́a….) tîṕêd ṕêrbest́ …dest́eḱ û alîkarin..

Weḱ:Wê baran bibare

Ť́u min nabîne

Ḱu hûn nimêjḱin

Eger ji hev belabin

Eger jê ḱir

Û nuhoḱ ḱu piṣt́î (na) durist́ be nîṣanḱa ḱiryare

Weḱ:

Naxwîne

Û divê di dawî de tîṕeḱ ji vana hebe (im-in-î-e)

û ṕêwîst́e ḱu dest́ṕêḱ jî bi (di) be.. lê dema ḱu (ne) nîṣanḱa nebûnê be wê bibe (na) û (di) t́ê hilanîn.. çiḱu alavên nerêniyê(ne-na) bi (di)ya berdewamiyê û (bi)ya ayindê t́êne guhêrt́in …

Weḱ:

Dixwe-naxwe

Biryar :divê ḱu tiṣt́ piṣt́î dema axavt́inê bibe ..

Weḱ:

Bixwîn-biřev-her wer

Û (bi-wer-her-bib-biḱ..)nîṣandeḱên biryarêne..

Weḱ:

Bimir-wer ḱuṣt́in - her bimîn
Saẍ biḱ - ṣîyar bib

Ťêbînî : Nîṣanḱên biryarê:

Di pêṣî de	goṫe	alavên dawî
Wer	ḱuṣṫ	in
Wer	vezel	andin
Xwe	ramed	în
Xwe	vezel	în
Bimîn	rabû	yî
Weha	rabû	yîb(ḱirîb)
Bib	rabû	yî
Bib	mir	î
Bi	mir	e
Bi	mir	în
Bila(bera)	wer	in

Pêṣgirên ṕêgihêj tevde alîkarêd biryarêne (bi-ve-ra-hil-da-vê-me…h..w..) ji bilî(di) alava berdewamiyê..

Cureyên kar : kar bi tibabê babeť û cureyan û durv û raweyan xwe dinasîne..

Karê kesane bi alîkariya du ṕênavaye.. ango ji têḱiliya du ṕênavên kesane ava dibe

Weḱ :

Min xwe ḱujť (min + xwe)

Ť̂êbînî :(xwe) ṕênavê giṣťiye .. û di evê darêjê de - nemaze -bi koma (min) ře di bûrî de giringe.. û bi koma (ez) ře di nuhoḱ û ayinde de ṕêdivêye..

Weḱ :

Min-ťe -wî -wê … xwe ji bîr ḱir --bûrî--

Ez-ťu-ew-em… xwe ji bîr (diḱim-diḱî-diḱe-diḱin)--nuhoḱ--

Ez-ťu….ê xwe ji bîr (biḱim-biḱî-biḱe-biḱin)..-- ayinde --

…….

DERHINGÊV (t̕êpeř)

Û

SALT́EGÊR (t̕ênepeř)

Danasîn(1): (karê t̕ênepeř) berkar venagire

Weḱ:

Derket̕ ṣa bû

Danasîn(2) : (karê t̕êpeř) berkar vedigire û ew çar berin…….

1-Bereḱ jê berkareḱî vedigire

Weḱ:

Av vexwar-pere st̕end

2-Û bereḱ du berkara vedigire (koḱa wan dest̕p̕êḱer û saloẍe)…

I-Erêna- (jêwerê-gûmanḱer-weḱ ḱu -heyḱu - hiṣt̕ ḱu-bû ji-çeng bû-- --û ..wilo)

II-Bahwerî-(dît́-ho bû-dî-nas ḱir-fêr bû-hay jê bû…û…w..)……

Weḱ:

Min mareḱ dīt́-min Aram nas ḱir

-Dagerandin-(rakiṣand-vegerand-ajoṫ-hiṣt́-
sṫand-ḱir ḱu-da- ḱir xelaṫ…û…h..w..)

Weḱ:

Min gûman ḱir ḱu ev saloẍ rasṫe

Jê werê ḱu ew piṣt́î wê haṫiye guherṫin

Ez ho bûm bê evana çi dibêjin

Min Siyamend vegerand

Şahîn gul sṫend

3-Û bereḱ du berkara vedigire (koḱa wan ne
desṫpêḱer û saloẍe)….

Weḱ:

(da-pirsî-xelaṫ-nehiṣt́-girṫ ser-wer
ḱir -lê ḱir… û…w…)

Nimone:

Min pirṫûḱeḱ da ê rewṣenbîr

Min diyarîḱ ji ê jîr ře da xelaṫ

4-Û bereḱ sê berkara vedigire (dibînim-dizanim- dibêjim) ……..

(jêře goṫ-salox da-gîhandin-ṕeyivî)

Weḱ:

Xwedan hisreṫ bi ser wan de karê wan pêṣ wan diḱe

-Û ḱiryar ṫênepeře:

1-ḱu ji der comerdiyê be

Weḱ:

Fermo ḱir- xweṣiḱ ḱir

2-ji derê ṣahiyê an nîṣanḱa rengeḱî an ṣermeḱê an ṫeṕeḱê an ṣahiyeḱê an behiyeḱê ….

valabûneḱê an dagirṫineḱê bide..

Weḱ:

Sorbûn-pîsbûn-ṣabûn-valaḱirin-tijebûn-

3-ji derê ṕêqayilbûna ṣûnmaya karê t́êpeřê berkareḱî…….

Weḱ:

Min ḱevir ṣiḱand û ṣiḱest́

û min gindirand û gindirî

4-An jî zîvirî û bû (ḱirî) di pesindan û devavêjt́inê de

Weḱ:

Fêrḱirî bû(hat́ibû fêrḱirin) dêmeḱ fêr bûbû……

Ḱiryar t́ênepeře :

1-ḱu (da) ya t́êper derbasî bûbe

Weḱ:

Pirt́ûḱ daxist́ ser t́e bi rast́î û tewrat́ û Incîl ji berê de daxist́iye rast́erêyeḱ ji mirovan ře bû…

2-ḱu nîṣana berkar da

Weḱ:

Min hevaldariya xurt́a ḱir

3-ḱu nîṣana xwest́inê û jêrnavê (malbat́ê) da

Weḱ:

Min dirav bi derxist́in da

Min set́em da xoreḱirin

Rêzimanî: berkar berî kar t́ê û ḱara (ḱiryar) berî herduwan t́ê û weha jî ṕêrnav...

Hin nimoneyên dît́ir:

Daryos sênî ṣiḱand	t́êpeř
Wan rahiṣt́in Masiya	t́êpeř
Berzan xwendin vexwend	t́êpeř
Şiyar keniya	t́ênepeř
Çeleng xwe di ser coḱêře avêt́	t́ênepeř
Rûmet́ pirt́ûḱ çiřand	t́êpeř
Zinar çû	t́ênepeř

Çeto şîvê dixwe têpeř

Bi karê derhingêv û bi ê salṫegêr ře jî (bi) tîpeke pêbesṫî navgire..

Weḱ :

Min bi xwe dîṫ

Ez bi xwe çûm

Karê salṫegêr: ṫênepeře berkar jêře nine çiḱu bûyiniye (tiṣṫeḱî nepen û nediyer heye diḱe ku ew kar bi ṣêweyeḱî neyeḱser bibe)…

Mînaḱ :

- Çûn = ez çûm
- Mirin= ez mirim

Di bûrî û nuhoḱ û ayindê de tenê bi koma pêrnavê (ez) ře bikar ṫê,..

(keṫin-revîn-çûn-haṫin- ken-girî….h…w..).

Karê derhingêv : t́êpeře.. bi berkare çiḱu
ḱiriniye ,di bûrî de bi koma
ṕêrnavê (min)ře bikar t́ê ..lê
di nuhoḱ û ayinde de bi koma
ṕêrnavê (ez)ře jî bikar t́ê…

Mînaḱ :

- Rewṣê xwarin xwar

- Zêno karê xwe ḱir

(xwarin-ḱirin-ḱujt́in-hiṣt́in-xist́in-birin..h..w..)

Karê derhingêv bi pêṣgira (dan) dibe xwedî du berkar..û karê salt́egêr jî bi (dan) ře t́ê..

Weḱ :

Dan revandin - da ken

Dam ḱujt́in - da girî

Karê derhingêv ji nav û rewṣan .. bi alîkariya (ḱirin) bi darêj dibe..

Weḱ :

1- Ji nav : Ḉavḱirin - ṕêlḱirin

2- Ji rewṣê : sarḱirin - reṣḱirin

Ṕêbînî:

Hin karêd salt́egêr hene dibin derhingêv ḱu alava (andin)a řeh û paṣgira jêdernavan ji wan ře bibe paṣgir…

Weḱ:

Revîn = ez reviyam

Revandin = ez revandim

Ken = ez keniyam

Kenandin = ez kenandim

Hin karên salt́egêr hene xweguhêrin daḱu dibin derhingêv jî ..

Weḱ :

Çûn = birin

Haṕin = anîn

Keṕin = xisṕin

Herweḱî ḱu hin řewṣ bi (bûn) ře dibin karê salt́egêr … {karê salt́egêr .. dibe ḱu ji rewṣeḱê û bi alîkariya (bûn) bi darêj bibe..}

Weḱ :

Sorbûn - derbûn - geṣbûn

Raweyên kar :

Dûx û raweyên kar bi hemû darêjan ře di pêvajoya dem û çaẍên axafťinê de..

Hin karên dîťir hene…

1- Karê pendî : diyere.. ḱara û berkarê rasť û eṣḱere û yeḱser jêře hene..

Weḱ :

Şêrzad gotarê dinivîse

2- Karê nepen : nediyere .. ḱara jêře ne diyere..

Weḱ :

Haťa kiřîn - haťa avêjťin

Haťe firoṣťin - haťe dîťin

Û karê nepen bi alîkariya karên alîkar bi darêj dibe (haťin-ťê"diê"-bûn-bê"biê"-were..)

Weḱ :

Bûrî : Ajoťî bû - bû ajoťî-haťiye ajoťin

Hatibû ajoẗin - haẗ ajoẗin

Nuhoḱ : T̈ê(di ê) ajoẗin(ẗêẗe ajoẗin) –

Ayinde : Bêẗe (biêẗe=ṕêẗe) ajoẗin

Were ajoẗin.

Lewra ew karên alîkar karḱerên avahiya karê nepenin , .. û bi nav dibin (karên kesane)..

Darêjên kar :

1- Saloẍî : bûrî- nuhoḱ- ayinde(di biřa çaẍên kar de ṣirove bûye)

2- Mercîn : gûman-lavij- hez û vên-xweziya ayinde- gûmanrawe- raweya bijoḱ..

A- Gûman: alavên alîkar ji gûmanê ře (bûm-bim-be-bî-bin-ba-bama-baya-bana-bin..) di piřên řaweyan de paṣḱoḱên ṕêgihêjin …

Mînaḱ :

- Ez çûbûm - ez çûbim

- Ew çûbe - ẗu çûbî

- Em..hûn..ew çûbana+çûbin

B- Lavij : ḱu alava teḱeziya ayindê (bi) berya kar bêt́ û alava (a) paṣgir be lavijê dinasîne..

Mînaḱ :

- Ez biçûma- t́u biçûya

- Ew biçwa- tevde biçûna

C- Hez û vên: (a) li paṣ alavên alîkariya gûmanê ṕêgihêje…

Mînaḱ :

- Ez siwarbûma- t́u hat́iba

- Ew xuyaba - me dît́iba

D- Xweziya ayinde: (ya-na) paṣgir be

Mînaḱ :

- Em bihat́ana - ew birevyaya

E- Gûmanrawe: ṕêrnava ṕêgihêj(ê) paṣgira ṕêrnavê kesane û alavên

alîkariya gûmanê paşgirên kar bin…

Mînaḱ :

- Ewê reviya be- hûnê reviya bin

Ê- Raweya bijoḱ: (ê) paşḱoḱa ṕêrnav û (ya- na) paşgira kar t́ê …çiḱu (ê) paşgireḱe ḱara dinasîne û (na) paşgireḱe komiya berkaran teḱez diḱe ..

Mînaḱ :

- Minê ḱujt́ibaya- t́ê bibiraya

Karê alîkar .. karê dubeş ava diḱe..

Weḱ :

Hat́ibûm- çûbe.

Karê neyinê di bûrî de bi (ne) û di nuhoḱ û ayinde de bi (na) û di biryarê de bi (me) serrast́ dibe..

Weḱ:

Nedît́- nabîne-mebîn

Pirsyarî jî bi (ma-gelo-erê-heye…) roldare.. û dirêjḱirina dengedara dawiyê giringe..

Weḱ:

Gelo kiyeee?

Navên ḱara : (a-ar-e-oḱ-wer-naḱ…) dibin paṣgirên kar..

Weḱ: xure-xewar-zana-kenoḱ-tirsnaḱ-bîrawer…

……..

Karên awarte : bi du raweyan t́êt́in dît́in…

1- ew raweya ku tîṕeḱ diḱare bi
alîkariya alavêd paṣgir û pêṣgir
wat́eya got́e û bêjeyan ava biḱe
… û rola hemû beṣ û cureyên
karê resen bistîne..

Ênan- xist́in- ḱirin- ket́in- niyandin- bûn- çûn- vêt́in- dan(dayin-danin)- zayin….û ..h..w.., ev karêd awarte tevde makên jêderîne ..eger paṣgirên jêderî ji ewan bêt́in avêjt́in .. her yeḱ ji wan tîṕeḱ dimîne û bi alîkariya pêṣgirên ayindê û berdewamiyê û neyinê (bi-di-na-ne) û hûrbînên paṣgir li gor darêjên çerx û demê karên bi wat́e ji wan peyda dibin ..

Mînaḱ :

- (ê): ewê bi ê = ewê bê (ayinde)

Hûn di êin= hûn t́ên (nuhoḱ)

- (x): emê bixin (ayinde)

T́u dixî-naxî (nuhoḱ)

- (Ḱ): ezê biḱim-naḱim (ayinde)

Ew di<u>k</u>́in-na<u>k</u>́in (nuhoḱ)

- (k): di<u>k</u>et́in-na<u>k</u>evin- ne<u>k</u>et́

Bi<u>k</u>eve - bi<u>k</u>et́a - ne<u>k</u>et́iye

- (n): di<u>n</u>ê- na<u>n</u>ê

Bi<u>n</u>ê(t́ê<u>n</u>ê)

- (b): bi<u>b</u>e-bi<u>b</u>a-bi<u>b</u>aya-bû<u>b</u>ana-ne<u>b</u>a

Di<u>b</u>e- na<u>b</u>e- ne<u>b</u>e

- (ç): di<u>ç</u>e- na<u>ç</u>im-ne<u>ç</u>in

Bi<u>ç</u>in- bi<u>ç</u>ûna- ne<u>ç</u>e

- (v): di<u>v</u>a- na<u>v</u>ê

Bi<u>v</u>ên- ne<u>v</u>en

- (d): di<u>d</u>in- na<u>d</u>in

Bi<u>d</u>e- ne<u>d</u>an

- (z): ewê bi<u>z</u>ê- hûn na<u>z</u>ên

Ew di<u>z</u>ên-hên ne<u>z</u>aye

Têbînî:

Pevguherîna tîpa (a) û tîpa (ê) di bûrî de derbas bûye ku mercekî verêziyêye..

Wek :

Anîn = ênan

Aş = êş

2- hin kar hene darêjên dem û çaxê wan diguhêřin…

Mînak :

- Min got (bûriye)
- Ez dibêjim (nuhoke)
- Ew çû - hat (bûriye)
- Ewê here-bêt(were) (ayindeye)

……

Karê qetirme : durenge .. durûye .. dudarêje .. duraweye,.!

Bi darejên demê ře t́êt́e guhert́in:

Weḱ : çûn - hat́in- got́in

Berhev (hevot́) :

Bûrî	Nuhoḱ	Ayinde	Biryar
Çû	dihre(diçe)	here(biçe)	her
Hat́	t́ê(diê)	bê(biê)	wer
Got́	dibêje	bibêje	bibêj(bêj)

.....

KARNAV

Danasîn : ew ṕeyva ḱu nîṣana karnasiyê dide û bi nîṣanḱa kar qayil nabe…….

Karnav sê curene:

1-karnavêd bûrî (derbas):

Weḱ:

Heyhaṫ û heyçû ji boyî dûrbûnê

Navbera ji boyî cudaḱirinê

2-karnavê nuhoḱ:

Weḱ:

Wey-wa ji boyî seyriḱ ḱirinê

Of-ah-ax.. jiboyî ṕingiřandinê

3-karnavê biryar(fermanî):

Weḱ:

Hus: bêdengḱirine

Kaḱu: bersivdane

Biřên karnav:

1- bê live : mîna ên çûyî

2-guhezt́î : ew tîṕa ḱu ne di karnav deye lê jêře hat́iye guhezt́in

Û guhezt́in jî an ji serkêș û ṕêbest́e….

Weḱ:

Li ser t́e

Ji min wir de heř

Û yan ji nîre :

Weḱ:

Heř pera (bist́în)
Li cê xwe be (melive)

An jî ji maḱe :

Weḱ:

Xwe li min ragir

Hêviyê bibiř

Dûxa karnav : li ťe-li wan-li wî-li we-li wê..

JÊDER(MAḰDER)

Jêder : ew bêjeya ḱu rehmaḱa kare … rûdaneḱe dem û ḱara jêře nînin ... û bi ṕîvera komiya kesê sêyemê nediyer berṕîvan dibe , û paṣgirên peydaḱirina jêderan derbas bûne (di waneyên bûrî de) …

Mînaḱ :

- Guhêzt́in-revandin - xwarin- çûn-bazdan-avdan- çandin- barḱirin-mêjt́in- ḱujt́in-bizdandin- razan-raket́in-rabûn- rûniṣt́in…..

……..

Hevoṫ:

A- kêṣana evan jêderan (maḱa) di hemû curên (bûrî-biryar- ayinde) de bi darêj bik….

Firoṣ́tin-sṫandin-rabûn

Firoṫin:

Pḗrnav	bûriyê durisṫ	bûriyê berdwam
Min	firoṫ	difiroṫ
Ṫe	firoṫ	difiroṫ
Wî-wê	firoṫ	difiroṫ
Me-we	firoṫ	difiroṫ
Wan	firoṫ	difiroṫ

Bûriyê guhêzṫî	bûriyê dûr	bûriyê ressen
Firoṫiye	firoṫibû	dabû firoṫin
Firoṫiye	firoṫibû	dabû firoṫin

Firoťiye	firoťibû	dabû firoťin
Firoťiye	firoťibû	dabû firoťin
Firoťiye	firoťibû	dabû firoťin

Ayinde	fermanî(biryarî)
Ezê (dê) Bifiroşim	ka ez bifiroşim
Ťê bifiroşî	ťu bifiroş
Ewê bifiroşe	bera ew bifiroşe
Emê Bifiroşin	ka em bifiroşin
Hûnê bifiroşin	hûn bifiroşin
Ew(dê)wê bifiroşin	bila bifiroşin

Śtandin :

Pśêrnav	bûriyê durisť	bûriyê berdewam
Min	śtand	disťand

Te	sta̕nd	dista̕nd
Wî-wê	sta̕nd	dista̕nd
Me-we	sta̕nd	dista̕nd
Wan	sta̕nd	dista̕nd

Bûriyê guhêzti̕	bûriyê dûr	bûriyê ressen
Sta̕ndiye	sta̕ndibû	sta̕ndin ki̕riye
Sta̕ndiye	sta̕ndibû	sta̕ndin ki̕riye
Sta̕ndiye	sta̕ndibû	sta̕ndin ki̕riye
Sta̕ndiye	sta̕ndibû	sta̕ndin ki̕riye

Ayinde	biryar
Ezê bista̕nim	de ez bista̕nim
Te̕ bista̕nî	bista̕n
Ewê bista̕ne	bila bista̕ne

Emê bisťînin	ka em bisťînin
Hûnê bisťînin	bisťînin
Ewê bisťînin	bila ew bisťînin

Rabûn:

Pêrnav	durusť	berdewam
Ez	rabûm	radibûm
Ťu	rabû	radibû
Ew	rabû	radibû
Em	rabûn	radibûn
Hûn	rabûn	radibûn
Ewana	rabûn	radibûn

Guhêztî	dûr	ressen
Rabûme	rabûbûm	rabûyîbûm

Rabûyî	rabûbû	rabûyîbû
Rabûye	rabûbû	rabûyîbû
Rabûne	rabûbûn	rabûyîbûn
Rabûne	rabûbûn	rabûyîbûn
Rabûne	rabûbûn	rabûyîbûn

Ayinde	biryar
Ezê rabim	divê rabim
Tê rabe	tu rab
Ewê rabe	bera rabe
Emê rabin	divê em rabin
Hûnê rabin	hûn rabin
Ewana wê rabin	bera ewana rabin

B-Rêziman bik:

Xwarin-bazdan-lerizandin-

Di bûriyê berdewam û ayinde di dûxa nerênî de

1-bûriyê berdewam di dûxa nerênî de:

Pêrnav	xwarin	bazdan	lerizandin
Min-ez	nedixwar	baznedida	nedilerizîm
Te-tu	nedixwar	baznedida	nedilerizî
Wî-ew	nedixwar	baznedida	nedilerizî
Me-em	nedixwar	baznedida	nedilerizîn
We-hûn	nedixwar	baznedida	nedilerizîn
Ewana	nedixwarin	baznedidan	nedilerizîn

2-biryara ayindêsozdar di dûxa nayê de:

Pêrnav	xwarin	bazdan	lerizandin
Ez	hew dixum	hew bazdidim	hew dilerizim
Tu	hew dixwe	hew bazdide	hew dilerize
Ew	hew dixwe	hew bazdide	hew dilerize

Em	hew dixun	hew bazdidin	hew dilerizin
Hûn	hew dixun	hew bazdidin	hew dilerizin
Ewana	hew dixun	hew bazdidin	hew dilerizin

<u>Karên biryarî di dûxa na de</u>:

Wer	meyê
Lêde(lêxîn)	lêmede(lêmexîn)
Guhdarîḱin	guhdarîmeḱin
Bixun	mexun

C- navê berkar ji jêder : (N) ji karnav bisṕîn û di ṣûna wê de (Î) ya berkar bi cî biḱ

<u>Jêder</u>	<u>navê berkar</u>
Guvaṣṕin	guvaṣṕî
Çûnin	çûyî
Goṕin	goṕî

Bihîśtin	bihîśtî
Şuṣtin	ṣuṣtî
Şewiťandin	ṣewiťî

D-van hevoḱa biḱe dûxa nayê:

Ev male	ev ne male
Ev ḱale	ev ne ḱale
Ewana ċiyane	ewana ne ċiyane
Evana qîzin	evana ne qîzin
Derî veḱiriye	derî ne veḱiriye

…….

DENGENAV

Dengenav :du curene:

1-ji boyî tiṣt́ên bê hiṣ

Weḱ:

Hîř- ji ṕez ře

Hoh- ji ḉêleḱê ře

Hoṣ- ji ker ře

Oṣt́- ji sah ře

2-jiboyî denga:

Weḱ:

Qebqeba ḱewê

Qidqida mirîṣḱê

Zûřezûřa gur

Ḉîviḉîva ḉûḱ

Xuṣxuṣa avê

Xumxuma baranê

Bařîna mîhê

Şîhîna hespé

Tevde jî guhdêrin

-Dengên nepen:

Himên-himehim-pinipin-
pistepist-niřeniř-xiřexiř…

-Dengên liv û tevgerê:

Ringîn-(rîngerîng)-
řepîn(řepřep)-pitepit-
çipeçip(çipîn)……

-Dengên xurt (tundî):

Qîřeqîř-zařizař-şîřişîř-waqwaq-
qîjîn(qîjqîj)-waqînî-(wîqiwîq)-

fîřefîř-fîzefîz-fikandin- lorandin
(oyoy-ayyay)-kalîn-viřîn-
nûzenûz-xuřexuř-hêlihêl….

-Dengên bangîn ên pirsyarî:

Hoş-şoş-çoʻ(ji ker ře)-pişpiş-
piş́t-(ji pisîḱê ře)-ḱûḉ- Oş́t-
t́îdî (ji sah ře)-t́ût́û-kiş(ji mirîş́ḱê
ře)-yeḧ-ḧaş(ji bizinê ře)……..

-Dengên mirovî:

Hîqeḧîq-tîqitîq-huş-fîḱefîḱ-oxox-
mirḉemirḉ-fiřefiř-niḉniḉ-qiḉqiḉ-
kizeki-horbehorb-Xiřîneḱa
mirinê - nûřenûř-oh-of-ax-niřeniř
-ayay-Hayho-lûbelûb-haṫhaṫ-
xîzexîz-tewandin-oxweş-ṕiliṕil-
Ṕit́eṕit́-zûḱzûḱ-nûzenûz-ḉinivin-
polepol-firxefirx-puxipux-
Kuf́tekuf́t-kuxuḱ-pişḱandin-
baweşḱandin-ḉîrḱeḉîrḱ-qirḉeqirḉ
-teṕreṕ-quřequř-qirḉîn-fişifiş-
t́iřit́iř-viřeviř -fiş́tefiş́t-virḉevirḉ-
virqevirq- ….û..h..w..

-Dengên ḉimdaran:

(hesṕ)şîḧya(ḧîreḧîr ḱir)-
(ker)ziřiya….

-Dengên dewaran:

Boř̂ina ç̂eleḱê-bař̂în(mař̂mař̂a)
mîhê-kalîna bizinê-Biř̂ibiř̂a
beranan..û..h..

-Dengên dř̂îndeyan:

Hirmîna(zîř̂îna)ṣêr û ṕiling-
zûř̂ezûř̂a(gur)-Ḱewt́eḱewt́a(sah)-
nûř̂inûř̂a(pisîḱê)-ḱûst́eḱûst́a
(ç̂êlesahan)-qûř̂îna(hirç̂ê)-
waqîna(ç̣eqel)-Wîqîna(rovî)…..

-Dengên balindeyan:

Zîvizîva(ḱevoḱa)-qîjîna(qazê)-
qîrîna(dîḱ)-qidqida(mirîṣḱê)-
qebqeba(ḱewê)-ç̂îviç̂îva(ç̂ûḱan)-
qiẍîna(qit́ḱê)-qajîna(qiralḱê)-
vîqîna(ḱund)…..

-Dengên mêṣ û moran:

Fiṣîn-kufekufa (mar)-ç̂îzîna
(miṣḱ)-vingîna mêṣan-quř̂equř̂a
(beqê)-ç̂iř̂eç̂iř̂a(kêziḱan)……

-Dengên avê:

Xuṣxuṣa(avê)-ḉiřa (ṣîr)-
ḉipḉipá(dilopán)-ṣîrqîn û
zurpî́na(t́avan)- xumxuma(baranê)
-ṣirṣira(cuhoḱê)…….

-Dengên hev beṣ:

Bulqîn-ṣîpṣîp-píḉpíḉ-ḉizḉiz-
kizekiz-vîzevîz-xîzxîz-Şîrqîn-
qurequr-gřîn-ḉingîn-t́ingîn-zingîn-
biřbiř-Lewlew-zurmîn-gurmîn-
teqîn-řeqîn-çerqîn-ẍřîn-Xuřîn-
řepî́n-viřîn-fîzfîz-vingîn-ḉivḉiv-
guveguv-Wîzwîz-zîqîn-ḉîřeḉîř-çîř-
pirt́epirt́-firt́firt́-wîřwîř-Kuṣt́ekuṣt́-
qiḉeqiḉ-qiḉîn.....

ZORGIR(jêpeř) Û BÊZOR(bêcan)

1-Bêzor (xuřû): karê ḱu tîṕên wî tev yên ziḱmaḱîne (koḱin)……

Û ṕîvan jêře hene:

Weḱ:

Ḱir-diḱe

Mir-dimre

Haṫ-ṫê

Ket- dikeve

Şewaṫ- diṣewiṫe

Gindirî-digindire

Gindirand- digindirîne

2-Zorgir: yê ḱu tîṕên din derbas dibênê..

Weḱ:

Hingivîn ji hingive

Derḱirin- der diḱe

Tevdan- tev dide

Hobûn- ho dibe

DURISŤ(bêjan)
Û
NEDURISŤ(jandar)

Durisť:

Ê ḱu bi wî û ḱara hevoḱeḱ
berdewam dibe……

Weḱ:

Yezdan hilovan û dilovan bû

Û karên durusť evin:

Bû-bûbû-dibe-bibe-ma-dimîne-
bimîne

-(bû ṣev-bû roj-bû êvar-bûsibeh
.....) ťa ḱu.. Jêve-hînḱu-kaḱu-ne-
haha-of-nêzîḱ-.....

Dêmeḱî bûyiniye û salťegêre…

Bû sermaḱe zor

Bû buhar

Dibe ṣev

Ma êvar

Dimîne berdewam

Ťaḱu tev bên

Ka ḱu herin

Haha ḱarî bû

Nêzîḱ haťin

Ne durisť:

Ê ḱu bi wî tenê bêyî ḱara û berkarê ḱara… hevoḱ durusť nabe….

Weḱ:

Azad ḱujť

Peřťûḱ xwend

Min hesṕeḱ dîť

Dêmeḱî ḱiriniye …lê dibe ḱu berkar an ḱara jî nepen be .

……

PENDÎ Û NEPEN

Pendî(diyer):

Yê ḱu ḱara jêře heye û t́ê goṭin û diyere(ḱara belûye) ..

Weḱ:

Azad ṣaẍ biřî

Nepen(nediyer):

Yê ḱu ḱara nade xuyanê(ḱara ne belûye) ….

Weḱ:

Şaẍ haṭe biřîn----

Ḱu di dema bûrî de be (haṭ-dan) dikevin pêṣiyê .. û (n-in-din-ḱirin) dikevin dawî de

Weḱ:

Haṭ ezberḱirin-çûn-haṭin-mirovên din

Û di nuhoḱ de (t́ê) dikeve pêṣî de û(în-an-in…) li dawî t́êne danîn..

Weḱ:

Şaẍ t́ê biřîn.....

T́ê xwarin……

Didin ḱujt́in….

Bi wan t́ê vedan….

ḰARA (ḱirar)

Ḱara:

Naveḱe kar li ṕê t́ê (bi nkareḱî radibe)..

Weḱ:

Dara çû derve

Divê ḱu xuyan be û (nav-ṕěřnav) be (nêr be an mê be) û ḱet́e be an kom be ..

-Ḱu nuhoḱ be an berdewam be:

Tîṕa (di) dikeve pêṣiyê…

Weḱ:

Zara didît́

Zara dibîne

-Ḱu ayinde be:

Alavên ayindê (wê-dê = ê) li ṕê t́ên û dibe ḱu berya ḱara jî bêt́in û pêṣgira (bi) dikeve pêṣiya kar de..

Weḱ:

Ezê bilezînim

Zara wê bibîne

Wê Şivan pez bînin bêriya

-Di komê de:

Alava teḱeziya koma EZ (in)
dikeve dawiya kar de….

Weḱ:

Mêvan hat́in

Elalet́ (cemawer) feřiḱîn

DESṔÊḰER(serwer) Û SALOẌ

Serwer û saloẍ :

Du navin hevoḱeḱê didin
(hevoḱeḱê ava diḱin) …..

Weḱ:

Jîr zanaye

Şahyar seṫemkare

Ê yeḱem ṕeyv li sere

Ê duwemîn ṕeyv bi wiye

Desṕêḱer: nasiye… nase û nasḱiriye…

-Û dibe nenas: ḱu saloẍa nîr(hoḱer) ṕêře haṫ

Weḱ:

Başiyeḱ bi ṫe ře heye..qenciyeḱ ji ṫeye

-Û dibe nenas: piṣṫî pirsyarê an piṣṫî (ne-na)

Weḱ:

Û ne nêreḱ dizê…

Gello xorṫeḱ li vire…

Yeḱî baṣ jî tune….

-Û dibe nenas: ḱu bû rewṣ û palvedar…

Weḱ:

Xweṣmêreḱ ṫê…

Qencîxwazeḱ li vire…

(eḱ-eḱî)alavên nenasyêne..

<u>Hevoḱên saloẍî</u>:

Mêranî serê mêr hildide

Ṕingiřandin dawya wê poṣmaniyeḱe

-Û saloẍ dikeve pêṣiya despêḱer jî

Weḱ:

Di mal de Azadeḱe

Her wareḱ buhareḱe

-Despêḱer dikeve pêṣ de:

1-ḱu ji zaravên serkêṣiyê be

{pirsenav-merbend-(çi) a seyriḱê-(çend) a saloẍî-(wê) a desťpêḱî

Weḱ:

Kiye ťu

Kî rabe ezê pêře rabim

Çi baṣťire rasťî

Çend kolê min hene?

Ew xwedayê bi tenê

Wê Dara ṣiyar bûbe

2-Dikeve ser saloẍ de :

Weḱ:

Lê Hejar lehenge

Balo Behzad mêre

3-Xwe diḱe ḱara :

Weḱ:

Şeṕal fêr bû

Rewṣen kar bû

Mîral t́ê gihîjt́

4-Xwe diḱe mîna saloẍ :

Weḱ:

Dijminê t́e dost́ê mine

Ji t́e çêt́ir ji min çêt́ire

Hevalê hevala hevale

-Saloẍ dikeve pêṣî de:

1- Ḱu Ji bêjeyên serkêṣiyê be:

Weḱ:

Ka bavê t́e

Heye ew roj

2-Derbas be ser despêḱer :

Weḱ:

Lê ê mêr Arase

Qaṣo a qenc Zînêye

3-Xwe biḱe rewṣ û pesindan :

Weḱ:

Li ba min heye hesṕeḱ

T́e dibînim ṣêreḱ

4-Ḱu li xwe vegere ṕêrnaveḱ di desṕêḱer de :

Weḱ:

Di xanî de xwediye

Di malbat́ê de aẍaye

Di ṣer de ṣêre

Desṕêḱer û saloẍ… herdû jî ji hevoḱê t́êne rahiṣt́in(avêjtin) : Ḱu rêzaneḱ hebe rêzaniya wan bide…

Weḱ:

Bersiva pirsê :

Azer çawaye ? … nexweṣe

kî li hundure ? …. Şivane

Kê guneh ḱiriye ?... min

ALAVÊN BI NAV Û BI SALOẌ

Êḱu-weḱu-lê-kaḱu-heyḱu-ne-hey-tu. . . . .

Weḱ:

Arase ê ḱu miriye

Weḱu Aras maye

Lê Araseḱ çûye

Kaḱu Aras miriba

Heyḱu Aras bazdabe

Ne Araseḱ şiyare …

……..

BERKAR

Berkar:

Naveḱe ê ḱu kar bi ser de haṫiye(nav lê bûye) ṣanî dide…….

Weḱ:

Azad mamosṫe dîṫ

Mamosṫe ez ho ḱirim

Birayê min ez dîṫim

Ji ṕêvî min ře nedabû

Min ji zaroḱê xwe ře mal ava ḱir

Serdar dirindeyeḱ ḱujṫ

Berzan pirṫûḱ bir

Pirṫûḱ Berzan ew bir

-Berkar bi alavên pirsyarî ṫê dîṫin.. (kê-ku-kî-çi..)

Kê(kî+ê)-ku :

Ji bûrî ře .. bi alîkariya tîpên pêřbesť(di-bi-ji-li) û alavêd tekeziya wan .. û raweya tevayî pirse..

Azad li kê dixisť ?

Azad di ku ře hať ?

Azad ji kê disťand ?

Wê Azad bi ku de biçwa ?

Ji nuhoḱ ře ..

Azad kê di ḱuje ?

Azad ku dibîne ?

Ji ayinde ře ..

Wê Azad kê biḱuje ?

Azad wê kê biḱuje ?

Wê Azad ji ku bîne ?

Kî :

Ji bûrî ře ..

-Şivan kî girt́ ?

Çi :

Ji bûrî û nuhoḱ û ayinde ře. . .

Hozan çi ḱuṣt́ ?

Hozan ga ḱuṣt́ ?

Ciwan çi di ḱuje ?

Ciwan ga di ḱuje ?

Wê Şêro çi biḱe ?

……

ṔÊKARÊ AZA (berkarê riha û berdewam)

Jêdereḱe(koḱeḱe) ji ṕeyva kar t́ê û cure û hejmarên kar erê diḱe û dide xuyanê…

Weḱ:

Yezdan bi Mûsa ře ṕeyivandin ṕeyivî

Siwar Azad dît́in dît́

Ew got́in got́

Cure:

Ê reviyayî vegeriya (ê reveḱê reviyayî vegereḱê vegeriya

Hejmar:

Zengil du caran lê da

……

JÊŘEKAR (kargir)

Naveḱe dide xwiyanê bê kar ji boyî çiye

Weḱ:

Bajar xemilandin rêzdariyeḱ ji Serdar ře

Çû pera (çû ji pera ře)

Ji xwendinê ře řûniśt́

Da min ji boyî ez t́ê bibihûrim

……

TÊŘEKAR

Naveḱe dema kar dide xwiyanê û cîhê wî jî..

Weḱ:

Bi ṣevê çû gund

-Û navê demê dibe(demnîr)

Weḱ:

Şev-roj-meh-sal-çaẍ-dem-nuha-sipêde
-Demiḱ-sibeh-êvar-nêvro. .û w. .

-Û navê cîh dibe (cîhnîr)

Weḱ:

Jor-jêr-ser-bin-çep-rast-pêṣ-paṣ-vir-wir
Mal-mizgeft-xwendegeh-zemîn- xaḱ-
ezman-goř-dûr-nêzîḱ... û .. w..

Dûr çû

Di mal de řûniṣtim

Min li mizgefte nimêj kir

Roja te rojek pîrozkiriye

Ji doh de ez hatime

Hêç:

Nîrek dûdirêjî dema bûriye

Bilî(pêvî):

Nîrek dûdirêjî ayindeye

Û herdû jî pişti nerêniyêne

Hîn-hîna(hê): bi berdewamiyê reye

Hîn ez rûnişti bûm çîko hat

Berî-pişti-li dû-li ba -pê re : Wek hevin

Lê li **ba** min(bi min- bi te…):

Nîrê xuyanî û nasiya (diyer û nediyere)
nuhok û buhêrk û ayindeye…

Bi min ev goćin rasťe(li ba min ev...)

Û bi min ře:

Nîrê nasiyênî nuhoḱ û buhêrḱ û ayindeye

Bi min ře pere hene (ji nuhoḱ ře)

Li ba min pere tune bûn(ji bûrî ře)

…….

PÊŘEKAR

Naveḱe berî wî (û) ye ..weḱ nasiya (pêře)ye û cîhê (bi) digire..

Weḱ:

Ez û xwedê …t́u û xwedê
(min t́u sipart́ xwedê)

Leṣger û mîr veçûn

(leṣger bi mîr ře çûn)

Aras û Dara pev çinîn

(herdû bi hev ket́in)

JÎWER(weṣ-rawe)

Naveḱe çeṣna ḱara an jî a berkar di dema bûna kar de dide xuyan..

Weḱ:

Rasṫ bi ṕeyiv

Saloẍa durisṫ biguhêz

-Bê liv ṫê :

1-ḱu nîṣanḱa weḱheviyê da…

Weḱ:

Şêrîn derhaṫ heyveḱe

Azad direve ẍezale

2-ḱu nîṣanḱa ḱirinê da…

Weḱ:

Min firoṫê desṫ bi desṫ

Me li hev nerî ć̣av li ć̣av

3-ḱu nîṣanḱa dûrêziyê da…

Weḱ:

Yeḱa yeḱa vala ḱirin

Rûpel rûpel ez verêjê dixwînim

4-ḱu nîṣanḱa buhayê da…

Weḱ:

Min genim firoṫ çapeḱ bi pûleḱî

Min caw kirî gazeḱ bi çerxîḱî

5-ḱu nîṣanḱa pesindêr bide…

Weḱ:

Min ew goṫineḱe rasṫ dîṫ

6-ḱu nîṣanḱa weṣê bi xwe be…

Weḱ:

Sorbûn- mirin-rabûn-sorḱirin-reṣayî. . .

-Û jîwer dibe hevoḱ jî:

Derxisťin ji malên wan û ew bi hezara bûn..

-Û dibe nîr jî:

Min heyv di nêv ewran de dîť

-Û ťê hejmarťin:

Ez poşmaneḱî ṕingirî li zaroḱê xwe vegeriyam…

REWŞ

Rewş : ew goẗeya ḱu hevalbenda nav be û çeṣn û ṣêl û rengên wî binasîne.. û rewṣ jî du curene…. **xurû** û **hevbend ..**

Rewṣên xurû : ṣeṣ beṣin

1- rewṣa mêjerî : hejmar bi nav ře..nav û regezan biř diḱe û tibab û pileya evan nav û regezan berz û xuyan diḱe…û hejmar du beṣin..

I- sade : hejmara nav xuyan diḱe …

(yeḱ- du.. çar.. heft́…..û…h..w..)

II- hejmarên bi pile û paye : ew jî sê beṣin..

a- coẗepar : dûbareḱirina her hejmareḱê rewṣeḱe teḱez dinasîne ..

Weḱ :

Yeḱayeḱa(yeḱ yeḱ) xwe vedizîn

Leṣker çaroçaro(çar çar) dihaẗin

b- komîṣan : komhejmareḱê dinasîne..

Weḱ :

Şeṣeḱ- hefťeḱ- heyṣťeḱ….

c- payhejmar : pirťiḱ û ṕiçên hûr bi alîkariya paṣgira (yeḱ) dinasîne…

Weḱ :

Duyeḱ (nîv) = 1/2

Sêyeḱ = 1/3

Ṕêncyeḱ=1/5

2- <u>rewṣa saloẍî</u> : saloẍa reneg an çeṣn an ṣêl an an raweyeḱê dide ..

Weḱ :

Qenc- ťal- zer- tijî

Hin rewṣ bi xwe nava didin …mîna navin..

Weḱ :

Belengaz- ṕîr- dewlemend- zana

3- rewşa nîşandanê : bi alavên nîşandanê nas dibe (ev- ew- vî- vê- wî- wê- wan..)…

Weḱ :

Vî lawirî- wê t́ariyê

Boy darêjên dema (roj-şev-sal-car..) ṕênavê nîşandanê (ev-vê) di darêja nuhoḱ de bi (î) t́êt́e guhert́in…(îroj-îşev-îsal-îcar..)..lê ji darêja bûrî ře (ew-wê) bikar t́êt́ ..

Weḱ :

Ew roj- wê şevê- ew cara ha…

4- rewşa arzî : (a) ji mê ře û (ê) boy nêr û (xwe) ji hemû raweyan ře arziye…

Weḱ :

A wan - ê min

5- rewşa pirsyarî :

Weḱ :

Çend- kê- kî- ku- çi

6- rewṣa nepenî : tiṣtekî nediyer û nepen dixwîne..

Weḱ :

Tu- her- hemû- kes- tenê- piř- tev…

Rewṣên hevbend :

Ji paṣgiran (dar-yar-mend-gîn-ḱer- în- î ..)

Weḱ :

Dildar- hoṣyar- ẍemgîn-hiṣmend-
xebat́ḱer- hingivîn- bajarî-….

Ji got́eyên paṣbend (giran-řût́-xwas-mêr-qot́..)

Weḱ :

Bargiran- pîrût́- ṕêxwas- serqot́-
ciwanmêr- bavḱujt́î- bêbext́- nanḱor…

Ji pêṣgiran (hev-hem)..

We ḱ :

Hevbend- hemaheng

Rewşên yekser(serast) :

Sor- reş- kevn- nuh- mezin

Rewşên rûmetkirinê : (tir-tirîn)

Bilndtir- pîstir-paktirîn

……

BIRNEDER(jevderxisťin)
NÊVNASḰER

Naveḱe rênasiya xwesťeḱeḱê ji naveḱî çûyî
dide û dibe ḱu pir tiṣťan ṕê bixwaze

Weḱ:Min riťileḱ gulav

û telîseḱ xurme

û çend gaz caw

û bîsť piřťûḱ

û du ṕênûs kiřîn

BANGEWAZÎ (BANGÎN)

BANGÎN :Naveḱe piṣt́î (wa)ya ḱu alava bangînê ye t́ê got́in….

Weḱ:

Wa Kadar

Û mîna (wa) ha .. hê ..hey..ho..

Ha Şivan.....

Ho Kamîran.....

Hê Gulbarîn.....

Hey Dara

Bangîn :

1- an ji naveḱî ře palvedêre :

Weḱ :

Ho qencîxwazo

2-Û yan mîna palvedêre (benzerê palvedêre)

Weḱ :

Wa ê ḱu bi qenciyê ře ye

3-Û yan nenaseḱe bê neyaze (nexwesťiye)

Weḱ:

Wa serxweçûyo serxweçûnê berde

Nimone:

Hê mamosťa

Wa Azadno

Ha gundîno

Navê piṣťî banḱer bibe pesnê palvedêr :

Wa hey mirov çi ťu ṣaṣ ḱir

Wa Bawerê xweda zanesťî

Navê piṣťî banḱer bibe palvedêr :

Ho Ciwanê bavmerd

Ha Şiyarê paqij

TÎṔÊN ṔÊBEST́

Çar tîṕên ṕêbest́în û çar alavên teḱeziya wan hene û her alaveḱ bi herçar tîṕan ře t́ê lewra dibin (16) tîṕên ṕêbest́ ..(li-bi-ji-di) + (ře-ve-de-be)..û ṕêbest́ên avaḱirî jî hene(jê- ṕê- t́ê-lê)..û hinên dît́ir jî evin(t́a- bilî- ṕêvî-hingî….)..

Nimone:

Ji t́e ře - ji t́e ve - ji t́e be - ji t́e de

Jêře nivîsî

Ji nîvro t́a êvarî

Li ser řûpelê nivîsî

Di ṣevê de çû

Giṣ çûn ji ṕêvî yeḱî

Hingî ez řazayî bûm derket́in

Hîn ez řûniṣt́î bûm řabû

Bi wî dest́ ṕê ḱir

Tê çû -pê çû

Pêbestên hevbend:

1-ji du xurdebêjan…

2-yan jî bêjeyek û xurdebêjek….

Wek:(jê-ře)-(lew-ra)-(şûn-de)-(pê-ře)

PÊWENDÎ

Dûvekirinekê.. nêvbera wî û yê li dû wî ev tîpana tên….

(û-jî-yan-an-lê-ne-belê-tabi-.....)

Wek: Mêr bi zanestî û torînê nasyare

Mîr û dûv re zana derbasî ba şah bûn

Ciwan derketin û dûv re kal

Em rojekê yan hin ji rojê man

Gelo nêzîkê soza we an dûre

Mede Huner lê bide birayê wî

Merd be ji ê qenc re ne ji ê şaş re

Siwar nemir belê Şêrgo mir

Pêşmerge tabi peya gihîjtin

-Pêwendên hev bend ji çend pêwendan çê dibin

Wek: Çimaku-çiku-ku- boyku …..

……

TḰEZÎ

Dûvekeḱe derṭê li gorê dûvḱoḱ (paṣbend)

û ew du biřin (devderî-rezberî)

-Devderî(goṭeyî):

Vegerandina bêjeyê [naveḱ be-kareḱ
be -tîṕeḱ be-hevokeḱ be]….

Weḱ:

Haṭ haṭ bi mêranî

Maf xuyanêḱî xuyanêye

Erê erê

Roḱ hilaṭ roḱ hilaṭ

Û ṕêrnavên cuda an êd ṕêgeh bi ṕêrnaveḱî
cuda bêgûman dibin…

Weḱ:

Ez dinivîsim ez

-Rezberî:

Bi ṕênc bêjeyaye :

[bixwe- hemû(her)- giṣt́(tevde)- tebayî- herduwan] …

Weḱ:

Ez bi mîr bixwe ře ṕeyivîm

Min mal tevde kiřî an giṣt́ an hemû yan tebayê malê ….

Desť́ê xwe herduwan jê biṣo

T́ÊBÎNÎ : zimanê kurdî bi ṕênavê (xwe) teḱezḱiriye ….

Weḱ:

Ez bi xwe rabûm

T́u bixwe rab

BAŕÎ - CAŕÎ (dêlv-guhêrtin)

Dûvekeke navek pê ře tê (ne jiboyî xwe bide xuyanê)… û ew çar curene :

1-batiyê ligorê :

Wek:

Řêya řast bide ber me řêya ên ku tu qencîkerê wane …

2-batiyê hin ji tebayî :

Wek:

Ji heyvê perçakî wê hate girtin

3-batyê gişti (tevayî) :

Wek:

Mîr te jî dide ber mihderiyê

4-catyê nêvberî :

Weḱ :

Çaryeḱê ṕênceyeḱê (çareṕêncеḱê) bide ê parseḱ ……..

Û ḱiryar t́ê guhert́in ji ḱiryar:

Weḱ :

Ê ḱu wilo biḱe wê asaqa bibîne

Îṣḱence jêře ducar dibe -

Êṣa wî sêçarcar dibe.....

……

NÎR

1- Nîrên demê :

Ḱirin û bûn-bû-bib(biḱ)-dibe-bibe..

-Li mal bû

-li jor bibe

-Xanî ava dibe

-Wê ṣev bibe roj

2-Nîrên cî :

Ser-bin-jor-jêr-orte-navber-bilind-nizm..

-Li ser darê

-Li bin t́avê

-Jora dîwar

-Dakev(dayê) jêr

-Ḉiyayê bilind

-Li navbera gir û newalê werzeḱ heye
-Roḱ haṫ orta ezman

-Ev xanî ji wî xanî nizm ṫire

Nîrên hevbend ji du navan an jî ji du rewṣan û bi têḱiliya ṕêbesṫeḱê çê dibin…

Weḱ:

Seranser-řoj bi řoj-

Beranber-der bi der-

Řû li řû-kurṫa kurṫ

PÊWENDIYA XUYANÎ

-Dûnav piştî nav tê :

Wekî:

Azad Şahyare

Şarîbanê guhdare

-Nav piştî bernav tê :

Wekî:

Bavê Şêrgo Arase

Diya Jînê Hemrîne

-Ê berçav piştî nîşandanê:

Wekî:

Evê verêjê

Ewî marî

-Pesind piştî rewşê :

Weḱ:

Zana Rûmet́

Seroḱ Kawa

Bedewê Narîn

-Raveḱirin piṣt́î raveḱirî :

Weḱ:

Xaḱ dêmeḱ zemîne

Kes dêmeḱ mirove

……

SEYRIḰ

Du darêjê seyriḱê hene….

1-Çiḱirin: Çi baṣt́ire rast́î

Çi zort́ire ṣiyarya dujmina

2-Çiṕêḱirin: Çi baṣt́ire ṕê biḱ

Çi girînge bûna wî a bi tirs

-Seyriḱ ji nenasyê ře çê nabe …

Weḱ:

Çi qenct́ire miroveḱî (ṣaṣe)

Wê bibe : Çi miroveḱî qenct́ire (rast́e)

TAYBETḾENDÎ(pisporî)

Naveḱe piṣtî ṕêrnav t́ê niyazîḱê dide xuyanê

Weḱ:

Em gelê Kurd namirin

Em Kurd rêzdariya mêvana diḱin

Û ez perîṣanim hey kole hêvîdarê daxa Yazdanim

……

FERYAD-HAWAR-(GAZÎḰIRIN):

-Bankirina yê ḱu dijî t́engasiyê alîkar be ..

1-Bi (haho) ji gundiya:

Haho gundîno

Tîṕa(eḱ-o-no) dikeve dawî de

2-Bi (wa) ji mileť ře:

Wa milleťo

Wa milleťeḱ

3-Weḱe xwe dimîne (bê guherťin):

Ḱu hey alava bangiyê be….

Hey milleť

Û ḱu gazîxwaz nasḱer be û dûxa biryarî be

(bi) dikeve pêṣî de û (ve) li dawî dikeve

Weḱ: Wa Aras her bi Azad ve

KOVANÎ(şwînîbirî)dilsojî

Bangîna ḱulkêṣ û dilêṣe û dilṣewaṫe (yê girî li ser-janyar)

Weḱ:

Ha lawoooo

Û wa ḱezebooo (wax ḱezebêêê)

Bi (wa) û (ha) û (ho)

- Û kovanî jî sê berê wêne….

1-Weḱe xwe dimîne (bê guherṫin)….

Ha Hejar

Wa ṫîna dilê min

2- (ê) û (o) dikeve dawî

Wa Kalînê

Ho germa dilo

3- Ṫu ḱare (ha) û (ho) û (wa) biguhêre

û biḱe (lo- lê- lolo- lêlê- heylo- heylê..)

Lê Şêrînê lo sewdana mino

Lêlê Şêrînê lolosewdana mino

Heylê Şêrînê heylo sewdana mino

PEVGUHERTÍN (şûngir)
Û
DERAVÊJ (jêbirin)

Tîpeḱ dikeve şûna tîpeḱê….

1- Du tîpên dengedar li pê hev di bêjeyeḱê (goteyeḱê) de nabin…..

Dêmeḱ:

Çare + eḱê dibe çaraḱê (du-e-bûn-a-)

Sî + eḱ dibe siyeḱ(î-bû-i-tîpa girêḱoḱ

-y- cudaḱirineḱ bi nermayî da)….

TÊBÎNÎ: Tîpên girêḱoḱ du tîpin (y-w)

2- Du tîpên bingehî ên bêdeng û cêwîdar mîna hev û li pê hevdû di bêjeyeḱê de nabin (ji hev cihê biḱin jî şaşiye ..lê yeḱê ji wan pavêjin rewanbêjiye)..

Weḱ:

(rast́t́ir) bibe (rast́ t́ir) … ṣaṣe..
lê dibe (rast́ir) .. durist́e..

(paḱḱir) bibe (paḱ ḱir)…ṣaṣe..

Lê dibe (paḱir) … durist́e..

3-(ḉ-ḱ-ṕ-t́) cêwîne û (ç-p-k-t) cêwîdarin…

cêwîdar li dawiya got́eyê dibin mîna cêwiyan..

Weḱ:

Ṕiḉ- keḉ- leḉ

Paḱ-roḱ-çeḱ-ḉûḱ

Leṕ-çaṕ-ṣoṕ-diloṕ

Kat́-rût́-cot́-hêt́

4-(i-u) di pêṣiya tu got́eya de tunene û di dawiya hevoḱa de bi (e-î) t́êne guhert́in..

Weḱ:

Sê lawê min heni = (sê lawê min hene)

Ťu dikeni = (ťu dikenî)

- Eger (ê-a) ji navbera du navan an jî naveḱ û rewṣeḱê hilê.. rewṣeḱe dumil (hevbend) saz dibe..

Weḱ:

Ji du navan:

Porê sor dibe (porsor)

Gula sor dibe (gulsor-sorgul)

Ji naveḱî û rewṣeḱê :

Ciwanê mêr dibe (ciwanmêr)

- Bi guherťina ciyê nava û rewṣa.. hin navên hevbendî dîťir derťên..

Weḱ :

Sorgul-gulsor

Ciwanmêr-mêrciwan

Buhagiran-giranbuha

Şahdil-dilşah

-Li cîhna (h) dibe tîpeḱe cudaḱirinê

Weḱ :

Ciy̲ê = cî<u>h</u>ê

Giy̲a = gî<u>h</u>a

AXAVTÍNEḰ LI SER TÎṔAN

- Her tîṕeḱ an du tîṕ an sê tîṕ alaveḱe pendî didin ….

1-Ji cî ře:

Ciyê xwarinê = xwaringeh

Ciyê xwendinê = xwendegeh

Ciyê koman û navên lûsên wan:

Mor = moristán

Kurd = kurdistán

Ḱa = ḱadîn

Ḱil = ḱildan

Çíyayî …. bajarî …. gundî

2-Ji kar ře:

(ḱir- ḱer- ṕêj- kar- jen….)

Karḱir - coṫkar

Arjen - nanṕêj

3-Ji hay û hesṫan ře:

(girṫ- dîn- bîn- dî-….)

Şagirṫ- řodîn

Dûrbîn- řodî.....

4-Ji huner û zanînê ře:

(zan-er-van-..)

Bilûrvan- hozan- rêzan

Daner- nivîser- xwendevan

5-Ji rewşê ře:

(în- dar- ar- ṫir …)

Şevîn- rojîn- kalîn- zêřîn

Zordar- serdar

Xewar- hejar

Çêtir- reştir.....

6-Ji weş û raweya jêderê ře:

(stin- andin- ist- ast…)

Xistin-revandin

Daxist- parast

7-Ji kêm û biçûk ře:

(ik- ok…..)

Çêlîk- zêřik- darik

Zarok- xalxalok

8-Ji têḱiliyê ře:

Hevkar -hevbend -pev ře(bi hev ře)

Tevrabûn -pev veḱirî-pevçûn

Heř bi Azad ve (heř ṕêve).

9-Ji banḱer ře:

Hey-ha-wa-erê-lo-hê-ê-ho-o-..

- Di pêṣî de:

Ha Azad- hey Şivan- wa Zîwer

Erê Kawa- lo Řûgeṣ- lê Cîhan....

- Li paṣî:

Gewezê- Çelengo- Rûmeṕo- Ḉinarê

10- Zar û pîtolî

Çi zimanên ku hene pîtoliya wan heye, dêmekî qonaxêd avahiya pîtoliyê jî hene.. çiku tu pîtolî di bêhnik an hûrdemekê tenê de pêk nayê … û peyda nabe, lewra pêwîstiya demên dûdirêj û warên têz ji avahiya pîtoliyê re giringe..

Dûrêzkirina mercên avahiya zar û zimên jî pêdivêyî rêbazên çaksaziyeke bingehiye , gelo tu zar bêyî hebûnê hebûn .. û hene .. û ewê hebin..?..

Başe .. û hebûn jî bêyî peydabûna afirandî tuneye.., dêmekî jêderên peydabûna afirandî hene taku hebûn jî heye .., erê - ka emê werine ser hebûna zar û ziman .. û emê ji hev re binasînin … hela bê kanîn ew jêderên fermî û gerek ji egera zar ûzimên re çine …

Xurist (surişt) bi hemû yasa û ayin û rewayên avahiya xwe ve heye.. candar û bêcan jî tê de hene .., têkiliya candaran pev re (bi hev re) û bi bêcanan re jî pêdawîstî danasîn û ravekirinêye ..taku jevnaskirin hebe boy berdewamkirina jiyanê bi şaşî û rastiyan re..bi keçî û qenciyê re

.. bi xweṣî û tengasiyê ře …û…h..w.., dêmeḱ danasîna jevnaskirinê li nîṣandeḱên liv û bizava ewan yasayên avahiya xurist́a jiyanî digerin ..û bi berdewamiyê ře ew liv û bizav bi pêṣ dikevin , ew nîṣandeḱ jî di ewê ṣoṕê de berz û ṣit́yar dibin .. çiḱu bi candaran ře navendên hay û hest́an peyda bûne û di wan ṣivarêḱan ře ṕêjn û pelandin bûne alîkar daḱu di rêya bihîztinê ře deng nas bûne .. û ji nerînê dît́in peyda bûye .. û bi pelandin û pevgihîjt́inê jî bizavên curbecur (rengareng) belû bûne..

Bi pêṣket́ina berdewamiya demê ře mejiyê hiṣmendan bi lez û bez .. û ê hemû candarên dît́ir jî bi hêmenî bi pêṣ dikeve.. t́a gihîjt́e ast́ekê ḱu ew pevgihîjt́ina tiṣt́ên heyî jî bizavên nûvar di pêdawîst́iya jiyanê de ava ḱirin ,.. û bi alîkariya ewan bizavên peydabûyî pêwîst́iya peydaḱirina bizavên bi nav û nîṣan hat́e hebûnê .., û daḱu em bi kurt́î xwe bigihêjînin mebest́a xwe (çiḱu zanyariya xurist́î firehe) .. emê bêjin deng ji hev hat́in nasḱirin , dema ḱu dengên balindeyan ji ên direndeyan an jî ji ên ejderan hat́in cihêḱirin , tevlî ḱu zarên danasînê ji her cureyeḱî ji lawiran ře jî hebû … lê ṕêdivê bû

ḱu dengê hişmendan jî zarên cihêreng ji komiḱan ře li gor têḱiliya wan bi cîwarê wanî xuriśtî ře damezrîne..

Deng peyda bûn.. her dengeḱ weḱe naveḱî li tişteḱî heyî bû , her tişt bi dengan bi nav bûn û haṕin naskirin , dêmeḱî ew dengên sereṫe bi xwe sanbolên danasîna beşên koman bûn .. navnîşanḱ bûn , ew pîṫolên despêḱê hîmdeyên bingehî bûn û dabîra ên ḱu dibêjin (deng di zar de tunene ..lê zar bi giśtî û gelamperî tevaya dengaye ..) berovajî diḱin ..

Di dîroḱê de dem dûdirêje û berdewame , ew sanbolên ḱu bi pîṫoliya xuristê ře xwevelîśtî û hem perpiṫî bûn .. xwe dan ser hev û haṕin ṕarzinandin .. û ji her komeḱê ji ewan komên bûřî zareḱ derkeṫ(derhaṫ) .. û ji her zareḱî bi pirbûna mirovan ře şêwezar pejirîn .., hin ji wan li ber pêlên demê man xwegirṫî ṫa ew jî bûn zarên serbixwe … û .. her .. weha …!!

Lê de ka îcar emê binihêrin ka hela bê zar çiye:

Zar komeḱe deng û sanbol … nîşandeḱ û alavin .. goṫe û bêje û zaravin , bi rêzan û tûziḱên

rêxistî boy dayin û stendinê di navbera mirovan xwe bi xwe û naskirina jiyana cîwar û tîmanên xuristê deye .. boy hevnaskirin û jevfêrbûnêye , têkilî sebaret bi hay û hestan pêdivêyî pêdawîstên pêjn û pelandina pevgihîjtinên ponijandî bi kêferata mayin û hebûnê řeye.

Zar avahiya pisporiya endaziya çaẍ û demê bi cîh û war řeye.. hêmenên avahiyê jî evin :

1- **Axaftin** : dengivedana dev û lêvan.. û bihîztina guhe , lewra kesên kеř lalin jî … çiku ku guh nebihîze wê cîderên deng di mejî de çi anînê (ayinê) bi hiş ve bighîjînin , ango cîderka biryarên hiş vala dimêne û tu bihîztinê wernagire daku weke biryar ji dev û lêvan ře biguhêze , ew kesê ku pištî axaftinê jî guhgiran dibe dengê wî jî li wê gorê bilind dibe daku guhê wî bibihîze ka bê çi dibêje .. ji wî weye (werê) ku ew kesên guhdar bi tevayî ew jî mîna wî guhgiranin .

Dêmekî axaftin dayin(dan) û standina hay û hestên mirovî bi jiyana derveyî gewde û laşê wî řeye .. pêjne .. ji hay dipele û hest hişyar û

haydar dikê.. , rêçana ewê têkiliyê hem ew komdengên ku dikare wan bide der .

Balo ew pêjn û bizava dev ji zar ře bi deng hatiye naskirin ..çiku pêgihîjandinê bi cîwara hawîrdorî xwe ře dikê.. lê her dengek bi wateya xwe a taybet cîhdereke taybet jê ře heye .. ev têtê wateya ku axaftin ji gotinan (gote û bêjeyan) ava dibe û gotin jî ji dengan ava dibin û deng jî curbecurin (rengarengin) ..ango cihêdengin .. lewra wateyên gotina jî ji hev cihêne .. ne hevwate û ne yekwatene .., dêmekî di her gotinekê de bêhtirî dengekî (çi kerlal û çi dengidar) heye .., eger her axaftinek komeke peyv û gotinin.. tew em dikarin bibêjin erê her wateyek (danasînek) jî ji dengekî bêhtire.., balo ku peyv û gote pirdeng bin têtê wateya ku ew deng jî ne weke hevin … dengê di her goteyekê bi xwe de curbecurin … lewra cîderkên ewan dengan jî curbecurin.

Lê .. çima kirî em ji bîr bikin ku axaftin devokiye û bilêvkirina dengan jî devokiye .. ma gelo her axaftinek ne ji komelek gotinan peyda bûye .. û her gotinek ne ji bizava dengekî bêhtire ..?

Dêmekî axaftin a gotinaye û bilêvkirin a dengaye .., ji evê avakirinê pirseke balkêş xwe dide pêş : erê ma reng û durv û navên dengan tevan yekin ?

Bêyî ku em mijûl bibin û mitala bikin bersiva evê pirsê bi - na - tête danin(dayin) .. haaa..ha eger ku cîder û bizavên dengan tevan ne yek bin ewê bi durv û reng û navêd(navêt) xwe jî ji hev cuda (cihê) bin .., ew bilêvkirinên bûrî dengin û her bilêvkirinek bi navekî cihê bi nav û nasîn bûye.

(deng ji deng cihêye)..

Têbînî:

Gotin komela dengaye û axaftin komela gotinaye ..dêmekî axaftin komelgeha dengaye..

2- Nivîsandin : bê bi çi awayî her dengekî navek standiye her weha jî her navek nîşandekekê an sanbolekê û rengekî an jî wêneyekî (nîgarekî) bi rewş û rawe boy jevnasînê dixwaze …

Di axafţinê de her dengeḱ ji cîdereḱê bi lêv dibe , ew cîder ji deng ře dibe rewṣ û rawe (dûx) û nav li deng diḱe ..

Piṣţî serbûriyên hezarên salan û li gor pêdawîsţiyên civaḱa mirovî bi têḱiliya zar û ziman ře piř kês û derfeţ derbas bûn .. û bi delîveyên hevgar û rojgaran ře pîţoliya axafţinê li beṣdariya ṕêjn û pelandinên dîţir (ji bilî bihîzţin û dengînê - bangînê) kola û geriya daḱu di qonaẍên ţeng ře bi ser qonaẍêţ ṣiroveḱirinê vebû .. ew qonaxên curbecur bi pêṣkeţina demê û pêwîsţiya nûvarḱirina mercên wê ře.. nûjeniya nîṣandeḱ û sanbolên dengan bi peydaḱirina alîkariya ḉav û ṕoz û ḉerm bi mejî ře .. bersiva vedenga dev û guh haţe dayin .. ţa gihîjţe asţa ḱu tîṕ (pîţ) ṣiţyar û aṣḱarţ û mancî bûn ..

Li ṣûna deng navê tîṕ bikar haţiye.. daḱu bêţe nasîn erê tîṕ ji tevayên dengan ře .. û yeḱa yeḱan ře jî ţêţe goţin û ţêţe nîṣadan jî .. ango tomar dibe, balo navê cîderḱa bilêvḱirinê ji her tîṕekê ře bûye navê rewṣ an raweyê (dengenav) .. û jevnasḱirina ṕêjna her tîṕeḱê di axafţin û bilêvḱirinê de bi bihîzţina guh nas dibe .. lê bi

çavan reng û durvê tîpê weke tiştekî heyî ku berya nuha wendayî bû tête dîtin û bi destan jî ew wêne bi mizyarî nîgar dibe û berçav jî dibe … ango hay û hest bi tevayî pê dibilin (dest-çav- guh- dev- û poz jî di hin raweyan de..),.

Deng diçe lê tîp dimîne .. û axaftin tête guhêztin ta demekê .. lê nivîsandin dîrok û mîjoye .. bûrî û nuhok û ayindeye..

<u>Têbînî</u> :

Bi berdewamkirina dîrokê re û di warê zanyariya zimanan de bi piř kesan re derbas bûye ku ji pêhaybûna pêjna her tîpekê li gor guhertina fonîtîka bilêvkirina dengan ji jiyana germê ta a sermê .. û ji kesên çiyayî ta ên deştî .. deng piřşêwe derhatiye ..(qube- bilind- nizm- nazik- qalind- sert û hişk- nerm- zivir- şayik û zelal..û..h..w..) , lê ji hêleke dîtir ve jî bi ewan zanyaran re rengên dengan derbas bûne lewra kêferata derûnî rengê tîpa (A) bi hinan ji wan re rengê gewr dide û (V) rengê sipî dide .. , û ev rêbaz bû alîkara pîtoliyê daku nêr û mê ji bêregeziyê re hate şirovekirin .. û ev ne mebesta me bû lê min hindek agahî tê re da

nasîn û ragihand bi hêviya ku em di mijareke dîtir de berfireh ravekin.. çiku ev mijar bi xwe zanyariyeke serbixweye .. beşek ji pîtoliya zanestiyêye…

Dema ku em li zar weke dezgeha (deng û tîpan … axaftina peyv û gotin û bêje û zaravan … şêwezar û devokan) binêrin .. em dê bi ser kombenda pêlerzên dengîn (Accent) vebin, ango rewanbêjî şêweyê lêvkirina dengan bi devokî dixîne ber tûzik û peyrew(sîstem) û rêxistinên saziya şayikirin û zelaliyê de … daku ji cîderên dengêt tîpan verêsî (tawang) û catiya (pevguhêrtina) dengan jî tafirîne , tevde boy hêsanekirinê ji dev û lêvan řeye û xweşkirina derkirina deng bêyî ku dev astengiyan bibîne û li hev biherbile..

Her dengek bi cîdere , ku mercên dem û çaxê bi şêweyekî nerêtî bi war û cîh ře ne alîkar bin .. ev pirose(kiryar) pêk nayê .., dêmekî her tîpek pêdivêyî çavdêriyêye taku em jî dibêjin ka hela bê her dengek ji sîh û yek dengên kurdî li gor pîtoliya zar bi çi rêbazê pêk têt .. û bê xwe çawa bi hay û hestan ve digihêjîne.. û xwe têkildar dike ..(divê ji bîr nebe ku ev pirose

tevde bi rêdana desťûrên hiṣ.. û biryarêd navendên wan dengan di mejî deye..) .. de ka emê li dengan bikolin û cîderên wan binasin :

Berya ḱu em derbasî mijarê bibin divêť em zanibin heger ḱu dev venebe deng jî nayêne der û bi vebûna dev û derkeťina deng ře bayeḱ ji henasê derťê û ew ba jî dengedareḱê li gor asťa qaťa cîderê vedidengîne .

Phonetics :fonîťîḱ zanyariya dengêd axafťinêye.

Accent : êksan ṣêwezare .. pêllerza dengaye .

A B Cya kurdî ji 31 dengan hîmdeye…û ewin ên ḱu sanbolêť wan bûne sîh û yeḱ nîṣandeḱên rengareng û bi nav bûne tîṕ(pîť)…

Bi du cure û ṣêweyan ťêťe nivîsandin :

GIRS(mezin) :

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Hûr(biçûḱ) :

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z .

- Di zimanê kurdî de Du beşên(celebên) tîṕan hene :

- Dengedar û bêdeng

A-Tîṕên dengedar: 8 tîṕin

A E Ê I Î O U Û

Û raveḱirina navnasiya evan tîṕan jî eve :

Ji xweber deng didin bêyî tîṕên din jî û bi sê wat́eya t́êt́in nasînê:

I- Dengedarin:

Xwedî dengin..dêmeḱ dengeḱî ji
Ji (deng +li dar)in….

Dar : wat́eya karê arziye, xwedît́iyê dinasîne

II- Dengedêrin:

Deng derdixin û li ber bayê dixin û didêrin ….

Ji (deng + didêr)in…

Dêr: karê ḱirinêye

III- Dengederin:

Bi dengin - cîhdengin- denga didine der…

Ji (deng + der dixînin ji dev)in…

Ev hersê navnasî jî durist́in çunḱu bingeha wan hersêya jî denge .

Û tîṕên dengedar tevde bi tenha xwe ji kûr û ji navbera zengelorḱ û sîngê t́êne der .

- Kuxuḱ û ken jî bi dengedarin lê rêya xwe bi (h) dixînin… dêmeḱî hevbendin .

- Piṣḱandin jî bi dengedare lê rêya xwe bi (h-ṣ) dixîne… ew jî hevbende .

- Baweṣḱandin jî bi dengedare lê rêya xwe bi (h-x) dixîne..û…h...w..

Dengedar hemû(bi giṣt́î) bi danin(dayin) û st́endina bêhnê ře dert́ên .

Tîṕên dengedar du curene :

1- Dengedarên dirêj (bi awaz) :

Ew jî ṕêncin : **A Ê Î O Û**

- A a :	av	ba	bar
- Ê ê :	êvar	mê	mêr
- Î î :	îro	mî	nîro
- O o :	ode	do	goř

- Û û : û (nabe serwer) řû dûr

Rêzimaniyeḱ:

Dengedarên dirêj dengeḱî dirêj û bilind û serfiraz didin ……

"Û" mîna "U" û "I" ḱu despéḱa go t́inê ha t́in ew go t́in ne ji kurdiya pe t́iye.

2- Dengedarên ḱin(kur t́):

Sisêne : E I U

-E e : em me wer

-I i : (li despéḱê nabe) di-bi ṣil

-U u : (li pêṣî nabe) dudu gul

Rêzimaniyeḱ:

(I+U) nabin serwerê tu go t́eyêd Kurdî .. ango despéḱa go t́ina nayên .. û li dawî jî tenê bi alav û pérnavan .. û tîpén pébest́ re t́ên û ew jî go t́e li ser wan ranawes t́e ..

Ku-t́u-tu- çi-bi-ji-di…û…h…weha.

Dengedarên ḱin dengeḱî kurt́ û nizm
û xwegirt́î didin…

T́ÊBÎNÎ : Du tîṕên dengedar di zimanê kurdî de li ṕê hevdu nabin.. çiḱu ew jî mîna sê bêdengên li ṕê hev rawest́aneḱê didin ..

Dêmeḱî li navbera du dengedaran (w) an (y) ṕêdivêye.

Du tîṕên bêdeng (w-y) ên girêḱoḱ hene dengedara ji hev cuda diḱin û wan peve girê didin.

Weḱ :

Xu ar = xwar - xu în = xwîn

Dî u ar = dîwar - su ar = siwar

Xu elî = xwelî - xu ezî = xwezî

Xe ûn = xewn - bû î er = bûyer

Cû an = ciwan - kîuan = kîwan

Jî an = jiyan - rê u î = rêwî

Gu îz = gwîz - zî an = ziyan

An jî yeḱ ji wan tîṕên dengedar di hin Şêwezaran de t́êt́e avêjt́in..

Weḱ :

Xûn- xulî

Ḱor- gûz

****

Pêlpêlka pêllerziya dengedaran

(Êksan û Fonîtîk)

Agahdarî : pêlpêlka(pêldevana-pelpelûka)
dengedaran li gor çîza (fonîtîka)
deng heye .. û ev rêbaza wêye ..

(1)	(2)
A a	dengê bilind û qubeye ..lêv pêře direj bibin dibe **O o**
E e -Ê ê -Î î	dengê ortene .. ku lêv direj bibin dibin **Û û**
I i	dengê nizme.. bi direjkirina lêvan re dibe **U u**

Stûna (1) :

Aa : dengedareḱe qubeye û lêv ṕêře ne alîkarin …

Ee +Êê +Îî : dengedarên navendîne ji aśta ortene û lêv bi wan ře ne alîkarin…

I i : dengedareḱe kuŕt(ḱin) û nizme û lêv ṕêře ne alîkarin…

Stûna (2) :

Oo : dengedareḱe qubeye û lêv ṕêře alîkarin..

Ûû : dengedareḱe navendiye ji aśta orteye û lêv ṕêře alîkarin…

Uu : dengedareḱe kuŕt û nizme(nimze) û lêv ṕêře alîkarin…

Ji danasîna herdû st́ûnan t́êt́e naîn ḱu bingeha (Aa) û (Oo) yeḱe û sewiye ew ewe lêbelê dirêjḱirina lêvan di (Oo) de alîkarin û di (Aa) de nine… balo ḱu lêv bilive û xwe dirêj biḱe dengê (Oo) dide û ḱu lêv li ciyê xwe bimêne û bêliv be ew (Aa)ye .. lê aśta bilindiya herdiwan yeḱe . ., dêmeḱî (Ee- Êê- Îî) jî jiaśta (Ûû)ne lê

bizava lêvan jevderxisťina cihêrengiya dana dengan dinasîne… û herweha jî (Ii) û (Uu) ..

B- Tîṕên (pîťên) bêdeng (ḱeřlal) : 23 tîṕin

B – C – Ç – D – F – G – H – J – K – L – M – N – P – Q – R – S – Ş – T – V – W – X – Y – Z

Ji wan ře ťê goťin(tîṕên ḱeř) û navnas bûne (bêdeng) çimaḱî ew tîṕana bêyî tîṕên dengedar tu dengî nadin...

Mîna hemû zimanên cîhanê ew jî dengeḱî pêṣgir yan jî paṣgir dixwazin ťaḱu biliv û can bibin dengê xweyî vemirî vêxînin ..

(bêdeng û dengexwazin)

Ango herdu navnasî jî duriśtin.....

Ev tîṕên bêdeng di hundurê dev de bi liv û tevger dibin bi ḱeřlalî..lê bi dengedaran ji dev derťên û bi ṕêjin dibin.

16 tîṕ ji evan tîṕan bingehîne:

B C D F G H J L M N Q S Ş V X Z

Du (2) tîṕ ji 23yan jî navbiř û girêḱoḱê dengedarane :

W Y

Mînaḱ:

Şiyar-rêwî-beyan-ṣewaṫ

-Boy rewanbêjiyê 3 (sê) tîṕên bêdeng li ṕê hev nabin ... dengedareḱê dixwazin:

Kurdisṫan(kurdsṫan)-gulîsṫan(gulsṫan)-dengedar(dengdar)-derdiyar(derdyar)

****

CÊWÎDAR Û CÊWÎ

5 jî ji ewan 23êyan cêwîdarin .. dêmeḱî dudengin :

Ç K P T R

Mînaḱ:

(ço-çar) - (kar-kêr-ka) - (pêl-par) -
(tar-tu) - (birîn-pir)

Cêwiyên(cêmiḱên) her 5an jî ..ango dengê wanî duwem evin :

Ḉ Ḱ Ṕ T́ Ř

Mînaḱ:

(ḉo-ḉar) - (ḱar-ḱêr-ḱa) - (ṕêl-ṕar)

(t́ar-t́u) - (biřîn-piř)

RÊZIMANÎḰ(1):

Pḗnc dengên jêder hene jiwan ře
tîpḗn (cêwî) ṭê goṭin..dudengin…

-Boy jevcudaḱirina nasiya bêjeyan ,..cihêḱirina tîpḗn cêwî girînge…

Weḱ:

Ço : ji ajoṭina kerê řeye

Çó : navê dare (ṣiv)

Ker : navê lawireḱî çarlinge

Ḱeř : bêdengiye (deng na bihîze)

Pêl : gevizandina avêye (pêlên avê)

Pḗl : pḗlḱirina bi lingaye(ji pḗ)

Tar : taẍe (hêleḱ ji bajêre)

Ṭ́ar : qaliḱê dora tiṣṭên gurovere
(ṭara bêjingê)

- Çar tîṕên cêwî ḉiẍêzeḱe hûr li jora wan t́ê danîn û ew ḱin û sert́ û hiṣḱin û bi zor vedert́ên.

(ḉ)ḉem-(ḱ)ḱem-(ṕ)ṕez-(t́)t́av..

- Tîṕê bê ḉiẍêz cêwîdarin- nerm û sist́ û bê westandin ji dev dert́ên…

(ç)çar - (k)kes - (p)poř - (t)têr..

- Tîṕa ṕêncem (r) divê ḱu nîṣandeḱeḱ li ser hebe boy nasiya tîṕê di got́eyê de.

Weḱ :

(r) : ber : nêḱ.. nêz.. li ba

(ř) : beř : t́ejeḱe ji boyî raxist́inêye

Birîn - biřîn

Têr - têř

Rêzimanîḱ(2):

Piřên caran ḱu tîṕên cêwî(cêmiḱ) an cêwîdar û li ṕê dengdareḱe ḱin (kurt́) û li dawî (rawesteḱ) (r) t́ê dibe (ř)..

Weḱ :

Ḱeř- ć̣iř- ḱuř- piř-

An jî dengedareḱe ḱin li ṕêṣ û dengdareḱe dirêj li paṣ (r) t́ê..dibe (ř)….

Weḱ :

Kiřîn- duřû- biřav- biřîn.....

- Nexasma ḱu t́êkeve pêṣiya bêjeyê de û li dû tîṕeḱe dengedar bê..

Weḱ :

Řev-řez-řê-řî-řoj-řewṣ-řû-řast́

- Û ḱu tîṕeḱe cêwî û li dû cêwiyê yeḱe dengedar hat́ û bi dûv ře (r) hat́ berî tîṕeḱe dinî dengedar dîsa dibe (ř)..

Weḱ :

Pêře-t̂êře-t̂eřî-t̂iřole-

Lê ev rêzimanî carna ne bi tevayiye ji ber ku her herêmeḱ ji welêt̂ taybet̂mendiyeḱ ji zimên ře lê heye...û hin ṣêwezar (Ř) t̂eniḱ diḱin û hin jî qalind diḱin ..!!

Agahî :

Di hin ṣêwezaran de tîṕên mîna (L-S-B..) qube û qalind bikar t̂înin û li gor vê jî dûbare dinivîsin … egera dûbareḱirinê tuneye çiḱu wat̂eya got̂inê nayê guhert̂in ..

Weḱ :

Belê û bbellê yeḱ wat̂eye

Wisa û wissa yeḱ wat̂eye

û ên ḱu bi ṕîvera cêwîdaran diṕîvin ṣaṣin çiḱu

wat̂eya (pir) ji a (piř) cihêye … kêr ji ḱêr cihêye… çar nabe ć́ar…ta li ku û t̂a li ku , ev danasîna cêwîdaran (cêmiḱan) ji ast̂a hînḱirinê ře giringe çiḱu ferhenga devoḱa piřan ji

malbaťên kurdî bi wendaḱirina evan tîṕên xwesťî lawaz bûye..ṕêdivêyî zanînêye.. tîp piťir(bêťir) nabin ..tenê dengê wanî duwem ťêťe naskḱirin.

…….

Têbînîyeke girîng :

Di dawiya bêyî dawî de .. ez dê bidime nasîn ku çend têvelên (cudahî û cîwazên) resen di navbera kurmanciya jorîn(bahdînanî) û kurmanciya jêrîn(soranî) de hene.. , eya bala zimanzanêd herdû şêwezaran kişandine an na?

1- cudahiya paşkokan(paşgiran).. û nexasma pirbûna wan di şêwezarê soran de (ev jî bandoreke E'rebî û Persiye).

2- karê nepen di bahdînanî de bi yarmetîya karê alîkar(hat) tête pîvan ..lê di soranî de dîsa bi bandora E'rebiye..

Wek:

BAHDINAN	SORAN
Hate kujtin	kujraw
Hate rêkxistin	rêkxiraw

3- weke ku em dizanin du komêd pêrnava (ranavan) di zimanê kurdî de hene (koma ez û koma min) û koma (ez) bi alîkariya alavêd tekeziyê(im-e-î-in) tekez dibe çiku di darêja

bûrî de bi karê salt́egêr ře t́êt́ ..ango berkar jêře nine ḱu teḱez bibe.. lê koma min bi karê derhingêv ře t́ê û berkar jêře heye t́eḱeziyê dide ,de îcar soran ewan alavan bi koma min ře t́înin û koma ez t́avêjin .. û ev bi xwe tevlevḱirineḱe E'rebiye û hem jî di pîtoliya zarê kurdî de kujt́ina taybet́mendiyeḱe gewreye..lewra ciyê got́inê jî di hevoḱê de t́êt́e guhert́in û ji rêzana hevḱa(rist́a) kurdî derdikeve..

Weḱ : (min li derî da) bûye (lle derî dam)

4- nav û karêd raderî (ên qetirme) bi darêja tevayên karên dît́ir t́êt́in ṕîvan ..,(ṕîvera karê qetirme û cîwaz t́êḱveçûyîye)..

Weḱ : (xew) bûye (xewt́in)

5- arîşe û aloziya herî zor ewe ḱu nav di soranî de nepen û nenase ,ev dîsa bandoreḱe E'rebiye.. dêmeḱî ṕêdawîst́î alava danasînêye(eḱan).., belê di bahdînanî de nav pendî û nase..

Hin têvelên dît́ir jî hene lê tenê min boy agahdariyê ev çend bi mihderî pêskêş ḱirine..

DENG

DENG…çiye :

Despêḱ ji sîngêye..

-Tîṕên dengedar denga didin û di her bêjeyeḱê de çend ji wan hebin ewqas deng hene û her careḱê dev vedibe dengeḱ jê dertê.

Weḱ:

Av- yeḱ denge

Baran- du denge

Xuristan- sê denge

Cengawerî- çar denge

-Her bêjeyeḱ ji denga par vedibe lê deng pay nabe …

Weḱ:

Şi+van (şi) dengeḱe û (van) dengeḱe..

TÊBÎNÎ :Tîpên dengedar her yek ji wan dengeke.. Lê tîpên bêdeng û ên girêkok û yên cêwî bêyî tîpên dengedar tu dengî nadine der...

Tîpa (x) bi rengê (ẍ) derbas bûye .. nermkirineke boy lêvokên ku di bin bandora erebî de di hin şêwezaran de bi lêv dibin .. lê di nav tîpên kurdî de ne cîgire..

Wek :

Aẍe- zuẍur- meẍel- zîẍan- kaẍez- ẍemgîn- birẍul- şeẍel- ẍarẍarok- saẍî- Saliẍ(saloẍ)- veẍumandin- dilẍelandin…û…h..w...

……..

FERHENGOḰA GOṪE Û BÊJEYÊN GIRÎNG

Acab - Avrû : herî giring ji paya mirov ře (ṣeref-kerameṫ)

Ade : hûrzindiyên gezoḵ û devlêḵer

Aferîd : tiṣṫeḵî bûyî û heyî

Afirandin : çêḵirin û peydaḵirin

Afrandêr-Daner :ê ḵu nivîseḵê an pirṫûḵeḵê dinivîse û derdixe

Afrîva - Stayiṣ : hebûna paye û serbilind ḵu jibîr nabe

Agahaṫ : haṫe bîra wî(wê)

Agahdarî : jêřegoṫin - p̀êhayḵirin

Aha : derhal- anuha

Aheng : kêf û ṣahî dîlan

Aheng : ṣahiyeḵ bi narîn

Alev : pêla agir

Alode - Qitḵî - Giřiḵî : ava bigemar û mîkrob(ava ne paqij)

Aloz : girêḵoḵ - lihevgerandî û asê

Aloz : piroblem-teṣqele-likumandin

Altax : mîṫ-casûs

Amêr : ewz û rêçan

Amaje : nîṣan - nîṣandeḱ

Amar : hejmara kes û mirovan

Amedebûn : ez li civînê bûm = ez li civînê amede bûm

Amedeyî : têzî- hazirî

Amojgeh : ṕeymangeh-sozgeh

Amûr : mekîne - haleṫ

Ara : hebûn - heyin

Aram : hêmin û nerm û hêniḱ û ḱerlalî

Aramî : sebr- hedan-bihinfirehî

Aramgeh : goř- tirb(ciyê veṣarṫina ṫermêd mirî)

Aran : germḱirin- dilbijandin-… deṣṫa rasṫ

Ardimî : alîkarî- desṫeḱ

Ardû : Soṫemenî - xwarina agir

Arezû : xwesṫeḱ- hêvî- lav- daxwaz

Arîṣe : merbend- kilîṫ- pisgirêḱ- girêbendiḱ(grêḱûṫiḱ)

Arîṣen : rewṣ û raweya hêrs û hêz û hay û hesṫan

Aro : xiyar

Arya : wefadar- şîrhelal

Arzî : jiboyî taybeťmendyê-milk-saman

Asayî : ne zor û ne hêsan (xwezayî)

Asť : sewiye- pila ťêgeyê

Asťeng : ťengav- evşandin-derbiřîn

Asťengî : ťengasî- zehmeťî

Aşať : biřiḱ û serbendên pirtûḱa evra(Avisťa)

Aşḱarť : bi cî ḱird (mancî û teḱez ḱir)

Aşna :pḗzan û haydar

Aşoṕ : jêweyî- qey heye lê ew bixwe tuneye

Aşťî : levḱirin - jevhezḱirin(dijî ceng û şeř)

Avabûn : windabûn(ro çû ava)

Avaḱirin - Avayî : damezrandin- lêḱirin

Avbazgeh-Melevangeh :avjengeh(ciyê sebihandin û avjeniyê)

Avdar : meha(hêva) yeḱem ji sala kurdî adare

Avêne : birqoḱ- gewr diçirise

Avrû : şeref-namûs

Awa : reng û şêwe

Aware - Havî : kesê ji war dûrkeťî û biyan

Awarte : baṣqe-guherťî

Awarte : ji bilî- ne di rêziḱê de

Axavťin : ṕeyivandin

Axavťina tevandî : ṕeyva ne eṣḱere û niyazîḱ ťê de heye

Axavťina yeḱser : ṕeyva nuhoḱ ya rû li rû

Axavťinkar : yê ḱu diṕeyive

Ayînî : ol û rewayî

Ayinde : dema ḱu wê bê

Azar : êṣ û jan

Aziryayî : hecbû(hêç keť)

Azṕêj : xwarinçêḱer

Babeť : erbab-ligor-cure-celeb

Babelîs : sedsalî - qirn

Bace : xuḱûťiya fermandariyê

Badî :tas -zeriḱa avê

Bager : balîzoḱ

Bahoz : ba û barana xurť

Baťî -Caťî : pevguherťin

Baťî-caťî : dêlv(ḱu tiṣť ťêkeve ṣûna tiṣť

Bala :bilind û hêja

Balberî : heyḱu dibeḱu

Baneṣan : alava bangînê

Bangîn : gazî ḱirin

Bangawaz : ragihandin - banḱirin

Bara : weṣ-rawe

Barimte : girew

Barûdox : desûdar – rawe

Baxo : ji rindiya xwe

Bayiḱ : sermayedar (sermayê diravî hilanînî)

Bayloz : hevind- sefîr

Bed : gend - pîs - xirab

Begem : piř reng- rengareng

Behî : ṣwînî- civaťa jibo mirî

Behane : dana ber řû

Behnen : navê roja sêyem Ji Heyvê (kurdiya ḱevn)

Behre : bîr û ramanên geṣ û t́ûj- xelat́bîr

Belengaz : perîṣan-qelender

Belqit́andin : ṣeḱa dawiyê- derba ḱujt́inê

Bendbaw : Piropûḉ- xerafet́

Bendege : dagêrgeh - warê bidest́

Bender : rawest́teḱa ḱeleḱ û gemiyan

Bengî : evîndar

Bengîn : bedewbûna ji rê birî

Bengîn : xort́ê di çaẍ û benga xwe de be

Berṕêḱ : lêlukumandin-teṣqele

Beraberḱirin : weḱhevî an jî cudaḱirin di navbera tiṣt́an de

Berbat́ : yeman

Berdewam : dûdirêjḱirina demê di kareḱî de

Bere : enî bi zarê konevanî(cebhe)

Berevan : ê ḱu diber hineḱa de ṣer diḱe

Berg : cil û çeḱên çermîn

Bergirî : berevanî

Berhelist́î : liberrabûn - dijberî

Berhemgarî : gef û fort́

Berjeng : rewṣ û pesind û qencî

Berjewendî : xwesťeḱ û daxwaziyên kesane

Berkar : kar bi ser de ťê (ḱara+xwarin+ kar)weḱ: min xwarin xwar

Berkar : yê ḱu kar ṕêbû ye

Berzex : derav-ťengav

Besťî : hevbend - girêdayî

Beṣ : perḉe. biřiḱ

Beṣḱirin : prḉeḱirin-parḱirin- biřḱirin

Bexṣîn : buhart́in -lêbûrîn

Bexťeyar : bexťewar-xwedîṣens

Beyan : hilat́ina rojê

Bezim -bezm : ṣahî û kêf serxweṣî

Bezimgeh : ciyê ṣahî û dîlan û meyê

Bê luxum : bê hêl

Bêcan : tiṣťên heyî û bêcan weḱ (ḱevir)

Bêgûman : teḱez

Bêhêvî : bê omûd

Bêhniḱ : demeḱe kurt́- hûrdem

Bêje : got́in-ṕeyv

Bêkavî : qeda û qeder - ne bi dest́ê mirovî

Bêserûṣûn : t́arîbûn-wendayî

Bêtore :bê edeb- bêperwerde

Bêzavî : kîn- ziḱreṣî

Bihane : qîl - hicet́

Bijandin : giṣt́andin

Bijare : mizyarî

Bijîṣḱ : text́or- hekîm

Bilîmet́: pirzana

Bilindeḱ (ˆ - ˇ)

Bimalîn : jê bib-řêṣ biḱ-paqij biḱ

Binçîne : perensîb û sincî

Binyat́ : bingeh

Bipût́e : lêmiqat́eyî

Birêkar : Pêṣvan- nimûnend

Birha : bandor

Biryar : fermana fermî

Biryarî : fermanî

Biř : hineḱ-komeḱ ji komê

Biserhaťî : ezmin - Serbûr

Bispor : jêhaťî

Biṣav : ava mêweyan

Biwar : mewda- mecal - hêl-alî

Biyang : ṣiroveḱirin û teḱezḱirina dabîreḱê

Bizafťin : livandin - gûrḱirin

Bizav : melavî - hewildan

Bizavťin : liv -tevger

Bîbî - bîbîlanḱ : reṣḱa ċav

Bîner : temaṣevan

Bîroḱe : ramanoḱ

Bîryarî : endazî û mêjerî

Bobelať : sosreť

Boblať : derewlêḱirin

Bor : esmer

Bûjenav : navê tiṣt́ê çêbûyiye

Bûyer :rûdan

Buhêrḱ : dema bûrî

Buhayî : nirx

Cado : sihirdar

Cêwaz : têvel û awarte

Ceveng : sîmbol - hêma

Cindî : aqilmend-xwediyê goṭna rast́ û bizanîn

Cîwar : jiyana hawîrdor

Coṣ :vên û hezḱirin(hêvîdariya dît́in

Coṭan : meha nîsanê

Coṭxal : (:)

Cûn : kom û girûṕa werziṣê

Çarenûs : mafê milleṭan (mesîr)

Çareserî : raveḱirin-havil (ḧel)

Çêj : pêhaybûna bi dev û ziman(teem)

Çêr : xeber û sixêf

Çeysî : ṣewqedar

Çepel : zimanzivr

Çeşn : terz - mode

Çelebî : bedew û çeleng

Çelk : gemar

Çavdêrî : zêrevanî- binçavkirin

Çavteng : lekeya gotina çikûze (hişk- desgirtî)

Çavtêr : desbelav-comerd

Daçek : paşgir-paşbendek-paşkok…

Dabîrstan : dibistana navîn

Dabeşî : belavkirin- paykirin

Dîdar : dîtin û dîmenek bi rewş

Dadgeh : ciyê hukumdanê (mehkeme)

Dadyar :evoqat - mihamî

Dagîrî : standina war û welatên milletan

Dahênan : peydakirina pîşkek zanyarî nûjen

Dahatî : nûsyayî - hawîş

Daman : pê êşandin-xemgîn-mest-melûl

Daman : ji a xwe danakeve - jê venagere

Damezerandin : avakirin-hîmdekirin

Damirî : vemirî

Daner : ê ku nivîsokînî nû der dixe

Dapoşî : veşartin - nuxamtin

Darêj : durv-reng-sewiye-kêşe û rawe-temet

Darêja merbendî : ango-lewra

Dawer : extер-qeder

Daylan : dilkêş -bedewiya ku dil ji rê dibe

Defş : dews-cîh -paye (rutbe)

Degmen : tema-wextî-li ber

Delamet : karekî ji merev tê xwestin

Delîve : derfet û berfirehî (qonaxë)

Delû :devliken

Dem : çaxë

Demardar: bi xîret

Demik : kate-seet

Deq : nivîsandineke ji çend hevokaye

Deramet : dahat-hatina dest

Deravêt́in : jêrahêjt́in

Derbarî : jiboyî- boy- di evî warî de

Derdest́ : derhal-hemen-di cî de

Dermale : terxane

Derûn : tiṣt́ê dihundurê mirov de-ojdan- nefs

Dest́ṕêḱer : naveḱe nasya hat́ina hevoḱeḱê dide

Dest́eber : xwedaber

Dest́eḱ : alîkarî

Dever : devera kurdist́an(herêm)-navçe

Dewêd: hurîng-ṣûṣeya ximavê

Dexl : çandinî-zad

Dexs : ziḱreṣî-ḉavnebarî

Deyûz : bêceleb-bêfehêt́

Dezgeh : ewz- amûrgehên dewlet́ê

Dêm : hinarḱê řû

Dêmeḱ : balo

Dêw : cin-efrît́

Dîl : girt́iyê cengê - hêsîr

Dîlawer : bîrawir-bîrbir-rewan

Dîlber : hîn bedewt́ir(hiṣrevîn)

Dîmar : mij - morav

Dît́er : gova- ṣahid

Dîsa : dûbare- careḱe dît́ir

Diṣê: diḱare

Dijûn : çêr-xeber-sixêf

Dilçûn : dilbijandin

Dilêr : gernas-mêrxas

Çḯilaṕeḱ : diloṕ-nuqut́

Dilkêṣ : dilrev - Suř

Dinimîne : bi lêv diḱe-dibêje

Dirav : pere

Diravgeh : beng

Dirûd : silava leṣgerî u bi rêzdarî

Divanḱ : Pisole-bilêt́ḱ

Diwêre : natirse

Doran : tersî sodmende(xisaret́)

Dozix : dojeh-cehnime

Dûvasḱ : dawiya c̣av

Dûx (jîwer) : weṣ-rawe

Dûx : rawe-ḧal

Dûz : dûrge-ḱeleha asê

Dubend : [ ]

Dudilî : dilodînî-ket́ erênayê

Duḱevanḱ : ( )

Durist́ : rast́-seranser

Durv : reng-cure

Duxal-cot́xal : (:)

Ebre : gulav-lewento

Efser : payedarê leṣgerî

Ehrîman : mezda û xwedanê xerabî û gunehan

Elalet́ : cemawer-kesêI pist́evan

Enî : bere- pêsiya serî û jora ebriwan

Encam : jêmaya dawî c̣are û havila dawî

Encam : keda kar ya dawiye

Encomen : civaṫ

Endîṣe : diltirsî-dudilî-qeleq

Endazî : ṫê ṕîvan din

Engîz : gijgij - xwîngerm

Engiřî : qeḧerî-ẍeyidî

Enisṫîṫûṫ : ekadîmî

Eriṣṫaṫ : firîṣṫeyên rasṫiyê- milyaketên ḧeqiyê

Erḱ : karmendî û pêdawîsṫî

Evra : perwer-bala û rêzdar

Ewṣandî : qedexe

Ewlekî - ewletî : ewleyî- ṕêbawerî

Exṫan : kurṫedemeḱe ji valahiyê-derfeṫa vewesîn ûrawesṫandinê

Eylo : balindeyeḱi qence - ṫeyreḱî mîna baze

Eyvez : têz-amade-ḧazir

Ezbeṫ : malbaṫ

Ezber : derixeḱirin- jiberḱirin-ḧevizḱirin

Fayil : dosê-rûpelêd tomarḱirina giriftaran

Feraṣîn : havîngeh

Fermesûn : gawirê jêhaťî û zîreḱ

Ferzand : tenha

Fês : fîno-kumê bi guliḱ û gulabend

Firêdan : ṣêweyê xwendin û axafťinê

Fîṣal :girḱirin-mezinḱirina nepêdivê

Gangazî : hêsanî

Gazîḱirin : qêřîn û hawar

Ged : pesind-henkûf-ṣîmeť

Geda : pareḱ

Gef :zirť-forť-berhemgarî

Gelî : newalên ťeng

Gelemperî : bi giṣťî- bi tevayî

Gemî :ḱeleḱ- keṣḱî

Gemer :qiřêj- dorpêçî

Genav : pingav-avgîra genî

Gencîne :xizne - defîne

Gend : nepaḱ

Gengaz : dibe ḱu- hey ḱu -dibe

Gengeṣe : axafẗin- giftûgo

Gerdenîṣ : piṣû- paydoz

Gerdon : hebûna jêr û jor (xaḱ û ezman û sẗêrḱ…)

Gever : guhlêneḱirin- nepêwîsẗî

Gewde : laṣêmihreyê pîroz

Gewez : rengê sorê veḱirî-(dêm gewez dibin ji fediya)

Gewrî : qurg-zengelolḱ

Gêjeloḱ : gêjevanḱ-sergêjḱ

Gêl : gelor -hov

Gêle : mizur

Gêṣ : refê balindeyan - koma ẗilûran

Gidî : dessiviḱ

Gihandeḱ : tîpa pêwendiyê

Gihaneḱ : pêgehnav-qonaẍ

Giṣẗenav : naveḱî bi tevayiye

Girêcan : girêḱûẗḱa derûnî

Girêḱoḱ : pevgirêdan

Giramî : xweṣî û rûmeẗ û xoṣewîsẗî

Girîng :ṕêdivê û ṕêwîśt́

Gird : mezin û girse

Girdav : bobelaṫ-sosreṫ

Giriftar : qad-pirsgirêk

Girnijîn : qemiḉandin-devlikenî-mizicandin

Gival : ewrê li barînê-ṫaveḱ li ber barandinê

Giyan : can

Gizîr : cîgir-ṣûngir

Gizing : berya ḱu roj hilê

Gizre: firdoneḱ- libolibo-jihevkeṫî

Gîre : jêra rûpelê ciyê vala

Gîrḱirin : bi derengxiśtin

Goṫe : bêje-zarav-ṕeyv

Goṫe :goṫin

Gûmanî : dudilî-dilodîno

Guhêzṫin : guherṫina cîh an jî buhêrṫina demê

Guhdar : ê ḱu deng digihêjê

Guhdengî : ṣiyarî-hayjêḱirin

Guhgir : ê ḱu ṕeyv jêreye û li řûye

Gulṣen : gulîzar -ç̣îmena gulan

Gulale :ganguloḱ-sorgula buharê

Guzername : pasporṫ

Hagadarî : ṕêhaybûn -hayjêḱirin

Hajo : lêxuř- ṣufêr

Halan : navṫêdan

Halo : wesa - weřê - wilo - weha - wa - wanîḱo

Handerî : kejawî-dilbijandin û jirêbirin-ẍiřḱrin

Havî - avî : biyan- ẍerîb

Havil : ḉare

Hawîṣî : lîsṫiḱ û kêf û ṣahî

Hawîṣgeh : ciyê dîlan û meyvexwarinê

Hawe : ṣêwe

Hayda : lê miqaṫe bû

Heban : kember- navṫeng

Hedan : bihna fereh- sebr

Heṫwan : melhem -lebîxe

Hekînî : bi merc û şerť

Helab : hîva çardehşevî

Helbeť : divê ǩu wilo be (bilî nabe)

Helbijarť : neqand- parzinand

Heljimar : amar- hejmara kesan

Helkeftin : bûna tişt bêyî hay û hesťan

Helwesť : raman û armanc

Hemaheng : li hevǩirin û rêǩûpêǩirina kar pevře

Hempazî : sermezinayî- pozbilindî

Henase : hilm û bêhn

Hentęş : amede û beşdar-ḧazir

Herac : ciyê kiřîn û firoşťina eşǩere

Herwe : mifťî- bedawe-belaş

Hesť : naskirineǩ ji mejiyê hunduruye

Hesû : aso- pevgihîjťina xaǩ û azman bi dîťina çavan

Heşaftin : qiřǩirin

Hetle : kawiǩ - çopiǩ

Hevdudanî : hevbend-lêǩdayî-murekeb

Hevend : hevalbend

Hevoť : berhev-hojîn- hînḱirin

Hevoḱ : ji çend goťeyan û bêjeyan nasiyeḱ derťê

Hevraz : hevalê rê-berokaṣ-kaṣê ber bi jor de

Hevriḱ : dijkar -berhelisť

Hevsî : cîran -

Hewadarî : ji rasťiyê revyayî

Hewal : nûçe - dengobas

Hewdan : êrîṣ-hicûm

Hewes : vên û coṣî

Hewlêre : zor baṣe

Heyî : berdesťe

Hezîta : erêna

Hêdan : sêriḱman-jidarkeťin-ecêbmayî

Hêl : qam - lay - alî - nêḱ - rex

Hêlî : hêminî- hêdî- bihnfirehî

Hêma : nîṣandeḱ-nîṣanḱ

Hêman : endam

Hêv : awir

Hêvîn : xoṣewîśt- ezîz- ṣêrîn û hêja

Hêviṣîn : bidawîbûn

Hêvoje : hawût-lêsorkirin

Hêwirî - ṣevder ma- bi cî bû

Hicran : bele

Higiṣtin : hingavtin-birînkirin

Hilavistin : hildarkirin

Hilbijartin : neqandin

Hilmaliṣtin : rûtkirin-qeṣartin

Hinartin : ṣandin

Hingor : hingûr-piṣtî roj diçe ava

Hiṣ : bîr

Hizir : raman-bîr

Hîbûdî : bertîl

Hîmdar : avaker- damezrîner

Ho : sedem-sebeb

Hode : mefayî-wirc-sûd

Hojan : hojîn - hîn

Hojangeh : yarîgeh-sťad

Hokar : mamosťe- fêrḱer

Hoḱer : nîrê demê

Hoḱer(nîr) : cîhgir û demgire

Hoḱerê awaḱî : nîrê řaweyî

Hoḱerê demiḱî : nîrê demê

Holis : dêmanî-bicîbûyî-lûsyayî

Homa : yezdanê xurťê kespẽniḱar

Homan : birêz-ḧakim

Horbandin : sťiranênjin û mêran di helkefťinan de

Hov : nezan

Hoz : xêl-êl-ber-eşîr

Hozan : Pîťol- felsefekar

Hûrdanî : hûrbînî

Hûrdem : xuleḱ

Hulî : tîl - Şayiḱ

Îdî : ji vira û wa de(ji nuha û pêve)

Îskemlî : nişt̕egeh(kursî)

Îst̕egeh : rawestigeh

Îsyan : t̕îjik̕-t̕îrêj

Jan : êş

Jar : p̕epû̕k-bindest̕-k̕êmket̕î

Jenyar : narînjen-mûzîk̕van

Jêder : ç̕avk̕anî

Jêdernav : navek̕î ji zaravek̕ê hat̕iye st̕endin

Jî : temen-salên e"mir

Jî : hem-dîsa

Jîwer : çeşn-rawe û dûx

Kaj : dara sinoberê

Kam : xwest̕ek̕-qesd-mirad

Kamî : kêfxweşî

Kamîran :p̕îroz- bext̕eyar

Kar : k̕iryar- îş-ji k̕irinê

Kargêř : mudîr- serkarê kargehê

Kargeh : ciyê kar û pîşe(sineet̕)

Karguzarî : raje- xizmeť- çaḱsazî

Karnav : maḱa nav

Karzan : Pispor-xebîr

Kavî : ji qazî ve

Kazêwe : berbang- berya rohilê-ṣveq

Keḉ : hele -ṣaṣ-sûc

Kej : çardemên salê (buhar-ṕayiz-zivisťan-buhar)

Kelîje : rtaserî

Kelîsť̂un : kesḱesor

Kelepor : paṣmayî-mîrate

Kelex : pû́te- peyḱer

Kelḱ : sûd -mefayî-havil

Kemo : fêhris-bîrť̂ûj

Kesîre : wesťiyan-ťeebandin

Kesyar : mirovî

Keṕre : keṕez-ciyê rasť li jora ḉiyê

Keṣ : seqa-raweya bayê

Keṣťî: ḱeleḱ- gemî

Keṣt̂igel : ḱeleḱa mezin ḱu balafir û tanḱ û leṣger.. li serin

Ketwar : helkeft̂-tûṣî-rêkeft̂

Keval : tabloya nîgarî

Kewden : nexwende

Keys : delîve û derfet̂

Kêṣesazî: tîṕa dawiya her biřeḱî ji helbest̂ê

Kiṣwer : xaḱa ṣah û meleḱan(weḱ Urdin)

Kilît̂ḱirî : xiçyayî - xeṕyayî

Kinîṣ :bermalî

Kinos - çeḱûz-çvt̂eng

Kirêt̂ : ṣerm-fihêt̂

Kizir : zuha

Kîf : çent̂eyê dest̂an

Kît̂e : bilêvḱirina tîṕan

Koçeḱ : oldarê xewlangehê- řehbiḱê dêrê- reben

Koçḱ : oda mezin a mêvandariyê

Korme : nepaqijî

Kovanî : dilẍemî-qeẗr- ḱul û derd

Kovanî : ṣwînkêṣî-girî li ser mirî

Koz : meẍel-ciyê lawirên ḱedî

Kuṫeḱyarî : zorî

Kulmiṣandin : kumiṣandin-kambaxî-xeraḱirin

Kuloz : kum

Kurṫ : ḱin-quṫ

Ḱaḱil : naviḱa orta libê

Ḱara : ê ḱu bi kar rabûye -ḱirar -ḱirde

Ḱedî : hevxû-ram

Ḱeṫe : bi tenê-yeḱ-teḱ

Ḱevî : qiraẍ-lêv-kenar

Ḱeval : tablo

Ḱevl : e"rṣ û kursî

Ḱêl : ḱevirê pêṣ goŕa mirî-peyḱerê ḱevirîn

Ḱone : polîṫîḱ-siyaseṫmend

Ḱuṣṫar : ciyê ḱujṫinê

Laṕ :piř-gelḱî

Lagir : nemekdar-zilamṫî-vehêl-dûviḱ-Periṣṫ

Lan : lehn-mala ṣêr

Laperîn :levcivîn û serhildan (intîfade)

Lav : ciwan-xorṫ

Lavêj : du"a û nizayên biomîdewerî

Lave : erêna

Lawaz : qels-ṣeẍel-ziîf- weza

Lawir : cinawir-ṫeba

Lebîxe : heṫwan-melhem

Leheng : qehreman- xurṫ

Leke : ṣerm-ḱêmasî-rezberya ṣaṣ

Ler - lar : lawaz

Lerizî : ricifî

Levaḱirin : piṣḱûṕarḱirin

Lê : manê - belê - bes - welê – axir

Lêhaṫî : ligor-henkûfî

Lêḱdayî : hevbend-hevdudanî

Lêḱerên bi serve haṫî : karên bi ṕîver

Lêḱveḱir : fisṫiqand-ji hev xisṫ

Lêvḱirin : derkeťina bêjeyê bi lêvan ji dev

Lêxur : hajo- ṣufêr

Lêz : zaroḱ -sêwleḱ- nebîrawir –mendal

Loma : lewra

Lûs : cîh-war-mal

Mať : tilûḱ-rawesťandin-mendehṣ

Maliṣťin : jêbirin- paqijḱirin

Mamiḱ : tiṣťanoḱ-tîman

Mamiz : aho- xezal-asiḱ

Mancî : çesṕandin-bicîḱirin

Mandî : wesťî

Mebesť : niyazî(mexsed)

Mehane : behane-ḧiceť

Mehmiz : moće- diravê mehane

Melezî : zayina di navbera du regezan de

Melheze : rêbaza kar

Melhorî : zorkarî - bêdadî

Melle : piř zana

Mendal : zaroḱ- biçûḱ

Mendîn :berbi hiṣe - mejî qebûl diḱe

Menteṣ : ṕêgihêjandin

Merg : miriyê malê-mirin

Mergesat́ : bobelat́

Metel : bêçare-ḧeyirî

Mezr : binkofḱ-navend

Mêhrevan : navê yezdane- bi mihreye(bi reḧme)

Mêhru : mehre- dilyarî-hezḱirin

Mêjer : rengedêrê jimart́inê

Mêjû : dîroḱ -dema bûrî

Mêṣe : çalaḱî- jêhat́îbûn

Miçandî : gîrisandî-devgirt́î

Mift́î : were- bedawa- belaṣ

Milya : meṣiya

Miṣext́ : eware- koçber- rewend

Mit́a : ṣt́omeḱ-kirîst́e-made

Miqat́eyî : lênerîn-pît́eṕêdan

Mixabin : poṣmanî

Mize : ṕêhaybûna bi ziman- çêj-t́e"im

Mîranî : fermî-resmî

Morav : mij

Muḱuř : eṣḱereḱirina tiṣt́ên ḱu veṣart́îne di dil de

Nakam : ḉareřeṣ-jar û mest́-bêṣens

Naṣê : nabe

Naṣî : hov-nezan

Nasnav : naveḱî pendî û xuyaniye

Navçe : herêm - dever

Navê ṕêgihiṣt́î : navê ṕêveḱirî

Navê hevalnav : navê rewṣḱêye

Navdar : nas- binav û deng

Naveroḱ : dûrêzḱirina navnameyan

Navt́eng : newq - kemer

Nayî : nebûn-naḱirin-nerênî

Nedyer : nepen(nenas)

Neghamî : njḱavî

Nehênî : neyin-tunebûn

Nemerd : pinťî -çepel-riswa

Nepen : veşirťî-nenas

Nerêť : dab-u"rf

Neşê : neḱar

Newaziş : niza-du"e

Nêd : mizgînî

Nêvnasî : jihevdrxisťin

Nifş : dûrêzḱirineḱe komî ji tibabe

Nihênî : raz-sir

Nijad : tuxum-regez

Nijdevan : talanḱerê bêyî melheze

Nimînend : wekîl-rasipêr

Nimone : weḱ-mîna

Nirxandin : buhadan

Nixya : daqûl bû

Niyaz : xwsťeḱa dil

Niyazî : hêw - qazîve-qesd

Nizar : berbisî

Nîr : cîhê kar yan jî dema kar dide xuyanê

Nîṣannav : naveḱe tiṣt́eḱî ṣanî dide

Noṣdarî : xweṣiya tenduriśtî

Nûçe : saloẍ

Nûner : ê ḱu bi navê ê dît́ir taxive

Nûsyayî : hawîṣ-haṣḱirî

Nûvar : nuhbûyî-nûjen

Nuhoḱ : dema nû

Obe : êl-koma mirovan-tîre

Ocaẍ : reha malbat́î- binekoḱ

Olam : kaê mift́î û bedawe

Olzan : ayinzan

Omîdewar : hêvîdar

Oveyî : bive -yeman-tehluke

Padaṣ : dana qenciyê-xelat́ḱirin

Paje : pace-pencere- ṣibaḱe

Paḱřewan : cangorî-ṣehîd

Palavt̕î : hilbijart̕î-neqandî

Palvedarî : tiṣt̕ê ḱu t̕ê werdanḱirin

Palvedêrî : xist̕ina ser- lêwerdan-hat̕iye ser

Pargît̕ : alavên ṕêgihîjt̕î

Parmest̕in : despelandin

Paşgir : dûveḱ-tîṕ dikeve dawiya got̕eyê

Paye : biterfî-xwedît̕î-qurnaz

pejare : mihreyî (rehmet̕)

Pelandin : dest̕lêgerandin-kont̕rol

Peledarî : belvbûn

Peledarbû : fireh bû û belav bû

Pelemarbû : xwe t̕ê derxist̕-bela xwe t̕ê da

Penaberî : xwelêgirt̕ina wareḱî dît̕ir ḱu lê bibe nişt̕ecî

Peṕûle :ṕinṕinîḱ

Perî : horiya buhust̕ê

Peraşîn : feraşîn-havîngeh

Perco : tuneya şê û ḱarînê -nabe

Pereng : ṕizot̕a agir

Pergal : endam-hêrs-hêz

Perpûẗe : nemiqaẗe

Pesindêr :ê ḱu pesin jêřeye

peṣêwî : maẗ mayin (thihûl)

Peẗî : fermî û xweṣ û rewan(ḱurmanciya zelal= peẗî)

Pexṣer : belavkar

Peyam : nameya bilez

Peyda : çêḱirin û derxisẗin û anîn

Peyḱer : kelex-pûẗe

Peyman : sozdan -lihevḱirin

Pêdawîsẗ : ṕêdivê-ṕêwîsẗ-lazim

Pêlerzḱ : çîz û fîzîna heja dng

Pîsẗ : pisẗuḱ-qaliḱê ẗeniḱ

Pêṣangeh : ciyê raxisẗin û berçvḱirina tiṣẗan

Pêṣwazî : derkeẗina pêṣiyê û bi rêzgirẗin

Piẗir : zor-bêhẗir(+)

Pil : payiḱ-nîṣanḱa serkefẗinê

Pila germê : hejmara ṕîvana germê

Pinçîne : binema-perensîb

Pirt́ : ṕiḉ

Piroje :řêḱûṕêḱirina kareḱî rewayî

Pirose : ḱiryar

Pişgirt́in : alîkarî û piş́tevanî

Pişḱ : pay-par

Piyal : qedeḧ

Piyar : qencîṕêḱer û mihrevan

Pîşekarî : hosteyî û zanîna kareḱî

Pît́ : xêr û berket́

Pît́eṕêdan : lêmiqat́eyî

Pîver : boy wezn û ṕîvanê

Poşman : jûvan

Pot́e : pût́- senem-heyḱel-kelex-peyḱer

Pol :cîh û radeya xwendinê-ast́a xwendinê

Pût́e : miqat́e-riş́tî

Puxt́e : ṕarzinandina dawî

ṕa - Vêca : dêmek – balo

ṕarêzgeh :bajarê mezin - wîlayet

ṕarzinandin : jevgirt́ina xwest́î ji nexwest́î weḱ(nîviṣḱ ji dew)

Ṕêbest́ : bidû xweve dikêṣîne

ṕêda : piṣt́î- bi dû de

ṕêdar : herma - ê ḱu namire û ji bîr naçe

ṕêdarî : ṕêdeçûn- xwelêkarḱirin-

ṕêguhert́in :serbiserî

ṕêjî : çêḱirina xwarinê

Ṕêjin : hayḱirina liveḱê

Ṕêjor - Encam : mêjera dawî- dawiya karê bûyî bi giṣt́î

Ṕêḱanîn : çaḱirin- karbidawîbûn(kar çû serî)

Ṕêḱaxavt́in : lihevrûniṣt́ina boy lihevḱirinê

Ṕêkenînḱ : ewê ḱu heneḱ û laqirdiyan diḱe (qeṣmeriya diḱe)

ṕêḱve : bi hev ře (pevře)

Ṕêkolî : liberxwedan (Hewldan)

ṕêngav : ṕîvana bi lingan (gav)

ṕêr : roja berya duhî- bêcivanî

ṕêragihandin : saloxdan - jêřegoẗin

ṕêřagihiṣẗî : gihîjẗî- bîrbir- bîrawir

ṕêrew : liṕêçûn- dûviḱ

Ṕêrgîẗ : alavên pêṣgir

ṕêřisẗ : ẗêhilaẗ – naveroḱ

ṕêrnav : bernav- cînav(ez-ẗu-ew-em-hûn-ew+an)

ṕêrû : sẗêrḱa bi ṣewq (thureya)

ṕêsẗrînḱ : jêbirḱa paqijḱirinê- av û gemarê rêṣ diḱe

ṕêvajoḱ : birêveçûn (meṣ)

Ṕêwîsẗ : gereḱ

Ṕêwendî : girêdan - lê dibane

ṕêwîsẗî : lazimî (gereḱî)- ṕêdivayî

ṕêwesẗyayî : ṕêvehaẗî- ḱara-jêhaẗî

ṕêxweṣî - Pejirîn : qayilî – qebûlḱirin

ṕindir : nermê ḱu ẗê ẗewandin

ṕingav : gola ava neheriḱî û genî

ṕingiřî : engiřî - qeherî-ẍeyidî

ṕiṣẗîḱu : li ṕê ḱu - bi dû de

ṕiṫiḱ : deqiḱ

ṕîlan: melheze û lîsṫiḱên dijmna ên bi dizî-xapînok

ṕîraboḱ : cina jin- cado xwe diḱe rengê jinê

ṕîrkuloz : xirsebaz (sihirbaz)a mê

ṕeyman: lihevḱirina bi sûnd û soz û bawerî

ṕonijîn - Hizrî : sawîr û miṫale(xeyal)

ṕûlṕarêz : ê ḱu pera pev diguhêře (hûr diḱe)

Qaḧf : kilox

Qam : kizweṫ-hêrs

Qandir : piřxwaz-ṫuma

Qayde : mîna-tayeḱî

Qeṣmer : ṕêkenoḱ

Qebo (Botanî) : berhemgarî- geř û forṫ

Qedexe : bende-ewiṣandî

Qedexe : biryara nehiṣṫinê û xwevegirṫinê

Qelawîsî : seyirḱirin -lêgeřîn

Qelender : Belengaz - Zîvar

Qels : lawaz-zi"îf

Qemî : heyḱu(belḱî)

Qepûlḱ :qapaẍa ċav

Qeral : ṣah-meleḱ

Qereqoṣî : ket́ober

Qetirme : pêċevanî cîwazî

Qemer : sorê t́arî

Qewî : xuyanî

Qewat́ : nerêt́î-a"det́ -teqlîd

Qewît́î : daxwaziya ber mirinêye (wesyet́)

Qewît́î : tembî û ṣîret́a ber mirinê

Qewsel : tîman-mamiḱ-luẍz

Qeyran : xireciř û qerebaliẍ

Qeyre : ḱeċa(qîza) ḱu bê mêr maye

Qiṣt́ : ṣox - ṣeng

Qidoṣ : bext́ewer-xwedîṣens-berṕîroz

Qiřḱirin : tuneḱirin

Qinarbaz : serjêḱer-celad

Qinare : Sêdare- ciyê daliqandinê

Qonaẍ : dûrbûn

Rahaťin : hojînî bi berhev û hevoťan

Ram : ǩedî

Rana : mezdayeǩe zerdeṣťiye(xweha Zerdeṣťe)

Raperîn : lidijrabûn

Rasiṕêr : nimînend

Ravêjker :ṣîreťdar

Rave : ṣirove

Raveǩirin : ṣiroveǩirin

Rawe : kêṣe û darêja kar

Raz : tîman-sir

Razbernav : naveǩe nasyeǩê dide xuyanê

Razyar : sekerťêr

Refťar : vewênî-sincî-silûǩ-rewṣ

Regez : nijad

Reh : damar

Rejû : komir

Renc : sexť - çeťin-zor-ziyan

Rengedêr : di rêzimaniyê de rewṣe

Rengedar : pesindar

Req : bêliv-serṫ û ḧiṣḱ

Revend : ê ḱu xwe li welaṫê biyan digire û ji welaṫê xwe direve

Rewa : ji boyî hênḱayê-ayinî

Rewan : nermî xweṣ-sernerm

Rewanbêj : nermbûn û peṫîbûna zar û ziman

Rewanbêjî : derxisṫina axavṫinê bi rêzanî û durusṫî

Rewayî : ayinî-olî

Rewend : koḉer

Rexav : lêvav

Rêdan : desṫûr-derfeṫdan

Rêwing : rêwî

Rêz : li dû hev

Rêzberî : nasîn

Rêzdar : xweda qedir

Rêzde : sûṫe-tûle

Rêzpeř: ne qola(ne endazî)- derveyî rêzê- awarṫe

Riṣt́î :teḱez- lêmiqat́e

Rijdî : divêt́ ṕêḱ were- ji a xwe danakeve

Riḱ : diřiḱ-qayiṣ-qariṣ

Riḱe : qefes

Riswa :fihêt́-kirêt́-fedî

Rîṕ : t́eṕ

Rojev : rûdan-bûyer-raweya bûyî

Rojgar : demsal- serdem

Ronaḱbîr : rewṣenbîr-zana û xwendevan

Rûbar : ḉem

Rûdan : bûyer-qeza

Rûgeh : quble

Rûxweṣ : goṣad - devken

Řenge - Liwaneye : dibe ḱu- hey ḱu(hey bibe û hey nebe)

Řewayî : qencî û rast́î (yasayên olî û asîmanî)

Sadenav : naveḱî asayîye

Salar : serkêṣ-serdar-serajo

Salt́ : t́ênepeř-xuřû

Saloẍ : guhêźtina axavt́inê liser bûyereḱê

Salûs : dudev-duřû

Sam : saw -tirs-saf-som-bavṕîrê Risẗem

Samal : saman- milk

Saman : aramî-xwegirt́in-dixwehilaẗin

Sana : raxisẗî-bê wesẗandin

Sawîlḱe : sade-hêsan

Saxt́eman : dezgeh-sazîgeh-mezrîngeh-sazman

Saxlem : noṣdar-bê nexweṣî

Seba : boy-jibo

Sebaret́ : derbarî-derheqî

Sebet́e : seliḱ

Sedem : sebeb-semed

Sema : dîlan

Semawend : aheng û dîlan

Semax : jixwefedîḱirin-serbilindayî-xoṣewîsẗiya derûnî

Semt́ : rohilaẗ û rowava û baḱur û baṣûr

Seqa : keṣ-avûba

Serṕêhaťî : serbûrî- biserîhaťin

Serbarî : mizyarî-imťiyaz

Serbor : roman-rîwayeť

Serdesťî : raserî-hukumdarî

Sere : ḱal-ṕîr

Sereťa : despêḱ

SergafI : matmayin-mindehoṣî

Sergihiṣťî : ṕêḱhaťî

Serť : req - zîḱ

Serkuťḱirin : daplosîn- devgirťin-vemirandina bi zorê

Serpiṣḱ : sergul-piřbaṣî

Sersam : bêhiṣ-eḧmeq

Serwer : desťṕêḱer

Sewdan : hiṣ û aqil

Sewlandî : cincilî-ṕarzinandî

Sexerbûn : ťêḱveçûn(pileyên hindiḱ biser nakevin)

Seyriḱ : dîťineḱe bi sosreť !!!

Siṕ : sifť-artêṣ-cêṣ-siṕah

Sipárde : emanet- télp

Sipênte : gotinekê kevnare bi watêya pîroze

Sirgon : dûrxistin-nefîkirin

Sirûṣ : peyama yazdanî-weḧî

Sirûṣte : xwezayî-xuristî

Sitayiṣ : pesindarî- hermayina navûdengî

Sixlet : bargiranî

Siyan : xak û axa pakî evra

Siza : ceze- tole

Sîmav : ava zîbeqê-ava zîv…

Sîrwan : sêřiyan(duřyan-çariyan)

Stêl : mafdar-henkûfî

Sodmend : fêda biserketî

Soraxî : lêkolîn

Sornî : newq

Soxî : û li dawî

Sûlav : ava ku ji ciyekî bilind tête xwar-ṣelal

Sûřê : řêwî

Suxt́e : ṣagirt́ê zanest́iyê

Şaheng : ṣaha hinguvoḱan

Şahnazî : serbilindayî

Şander : ê ḱu diṣîne

Şaneṣîn : qesra ṣah û melekan

Şaṕat́ : hineḱ ji demêye

Şar : bajar

Şarewer: bajarî

Şarist́anî : bajarît́î -jiyana bajaran

Şeṕal : bedewî -xweṣiḱbûn-desṕêḱa veḱirina gul û ḱulîlḱan

Şeṕol : pêl

Şegal : bizav-liv û tevger

Şeḱ : lêdan-hej-derb

Şen : piř bedew û xweṣiḱ

Şeng : jêhat́î û bi hêz

Şeng : xurt́ û bi hêrs û serbilind

Şerṕeze : hew dizane bê wê çi biḱe

Şeveng : tex-tîre -cure û civaḱên gell

Şevrong : cejna Êzîdiyan

Şeyda : hiṣberdayî-hiṣwenda

Şeyda : yê ḱu hiṣ berdaye

Şêt́ : dîn-dêhn

Şêwe : dirb-rêçan-hawe

Şiťî : weḱ-mîna

Şiťyar : berz-xuyanî

Şiyan : dereqet́-ḱarîn

Şîve : solîn-coḱa ava zelal

Şîwaz : ṣêwaz-hawe

Şofar : altax

Şû : ṣo (jinanîn-mêrḱirin) zewac- bint́ar

Şûtî : zebeṣ

Talan : yexme-st́endina bi zorê

Taybet́mendî : nexasma

Teḱa : lêbûrînxwazî

Temen : salên derbasbûyî ji zayinê de

Temena: silavdana bi rêzdarî

Tenê : Salt́-hew

Tenaye : asayiṣ-hêzên ewlekariyê

Teniṣt́ : rex-niḱ-kêleḱ

Teqeza : degmen-ḱêm caran

Terazû : mêzîn

Teres : xore

Terlan : ciwanê teze

Tet́er : ê ḱu nameyan digihêjîne

Têḱilî : dan û st́endin

Têvelî : lihevneḱirin- dijît́î

Têz : eyvez-amade

Tibab : hineḱ ji piřayêye

Tirozî : ṣarox-qit́î

Tirs : bizdandin-saw

Tixûb : sînorê dirêj(bajareḱî-welat́eḱî..)

Tixûbḱirî : sînordar - vebiřî

Tîman : mamiḱ-luẍz

Tîṕa bêdeng : bêyî dengdara deng dernaxîne

Tîre : obe-tex

Tolhildan : ẗheyfhilanîn

Torîn : torevan-wêjevan

Tundî : ṕêḱanîn-ṣideṫ

Tuxumnav : navê celeb

Ṫengavî : bi lez û girîng

Ṫengezar : bêhnṫeng

Ṫengijî : ẍeyidî-hew xwe girṫ

Ṫeṕ : rîṕ- hîlebazî

Ṫerazû : alava ṕîvanê - mêzîn

Ṫeřezan :geṣ

Ṫêbîn : raveḱirineḱ ji nerîneḱê ře

Ṫêgihiṣṫî : fêrbûyî

Ṫêḱurḱ : xwesṫeḱ û dilbijandinên ayindê

Ṫêper : derhingêv- ṫêderbas

Ṫêrg : ṫeyroḱ-zîṕiḱ

Ṫîn : jiboyî germê

Ṫîrmeh : meha(hîva) temûzê 7

Ťon - ťonî : reng û rawe-biçim-ẗal

Vacîdabiřḱ : (( ))

Vawêr : dabiř -(ʿ)

Vawêr-dabiř : (,, ,;)navbera du hevoḱa

Vegeṣ : nûvar

Vehaťt : tobe ḱir- poṣman bû

Vejînḱ : feza-kelhêniḱirin

Vekêṣ : wezn

Velorînḱ : bend û aṣaťên yezdanî-sirûṣ

Veqetandeḱ : (,)

Verês : hêldarî

Verês : tawang

Vewînî : refẗar û sincî

Vêť : vîn-xwesťeḱ-daxwazî

Viyan : dildarî-vîn

Wêje : tore-edeb

Waťe : rezberî-nasî

Warniṣîn : kesên ťêne ber hejmar û amarê(sukan)-welaťî

Wazênan : bi tenêhiṣt́in

Wazeḱe: raman- nerîn

Wediyare : qewî - qey

Weḱî : mina - hevtay - tay - ṣit́î

Werarḱirin : geṣeṕêdan - perṕêdan

Werdiyan : dergevanê girt́ingehê

Werziṣ : spor

Wesť egeh : ciyê sekn û rawesť andineḱe giṣt́î

Weṣandin : belavḱirin

Weyn : deḱ û dolab

Weza : ṣeẍel- lawaz-ziîf

Wiçan : vesîn-vewesîn- yefṣeyeḱ rawesť anê

Wircdar: bi mefayî-bi fêde

Wircedar : bifêde-hode-kelḱ

Wirya : ḧeyirî

Wiryayî : hay jê bûyî

Woçan : qoçan-ruxseť

Xak : e"rd-zemîn

Xal : ṕiť́iḱ- (.)

Xalbend : weḱ(. .).ṕiť́ḱ û nuť́iḱ

Xame : ṕênûs

Xanedan : bûṣe-regezbala û têrpere-têlî

Xanim : jina mala-ṕîreḱ

Xanxanḱ : maliḱ maliḱî -cedwel

Xasî : nasî

Xato : ḱeć́a hên qîz

Xatûn : jina bi nav û deng û têr

Xedeng : ť́îrê ji dar cê dibe ..boy ḱevane

Xelať́ : dane

Xemgîn : ẍembar

Xemil : ṣêlûpêl- xêz-zînet́

Xemûr : sikraťa mirinê

Xenê : xoṣ bext́-kêfxweṣ û bext́ewer

Xetîre : ardanḱa azadiyê

Xêlî : berć́avḱ - çarçef

Xêw : reṣḱê ṣevê- sawîrê tirsê

Xin : xweṣiḱ - qeṣeng

Xirs : siḧir

Xizm : xuyî -xwedî-hogir

Xîçiḱ : çixêzeḱe biçûḱe(-)

Xîj : dema ḱu balinde xwe ji jor de dadide berataḱê an nêçîreḱê

Xopan : wêran-xerabe û bêkes

Xor : roj-ro

Xorṣîd : roja 13 Heyvê(mehê)

Xorayî : bedawe- miftî belaṣ

Xûrijî :keṫ hev- qeherî

Xuře :oç- ê ḱu piř xwarinê dixwe

Xulṫ : kewṣ û gemar

Xurisṫ : siruṣṫ - xwezayî

Xurisṫan : dolab û nemliya xwarinê

Xuřû : paqij-ṕarizandî

Xweṕêṣandan :komcivîna bi helkefṫineḱê li ṣeqam û kolanan

Xwebexṫekir : fedawî

Xwedêwendî : bawermendê dilsoj

Xweser : tenha-bi tena xwe

Yadîgar : bîranîn

Yane : gurûṕa gogê a fermî

Yarîgeh : st́ada gogê

Yasa : biryarên dadgehî

Yasa : qanûn

Yawer : hevalbend

Yaxîbûn : serpêḉî-dijkarî

Yaxme : kelepûr-talan

Yeḱane : hevkar

Yeḱer : yeḱser-desbidest́-yeḱûdu

Zagon : fermiyên ayinî û olî- şerîe"t́- ṕêmayên ziḱmaḱî

Zal : zorbir -ṕêḱar

Zamdar : eware-koḉer

Zanist́an : zanîngeh-kuliye

Zar : zimanê gelle

Zarav : ciyoḱ-got́e-têrm

Zarbazî : devoḱî-lêvane

Zav : hêlperesťiya olî- mezheb

Zembele : ṣiřiḱ-ḧenefî

Zemîn : xaḱ-e'rd

Zeẍel : xiniz -bêbexť-xayin

Zêder : veqeťandin-cihêḱirin

Zêmar : girî û goťin û dîloḱên di ṣwînî û behiyan de li ser miriyan

Zêrevanî : ċavdêrî

Zibarî : alîkarî û hevkarî

Zihrî : daṣopîn-teqlîd

Zinar : kêleḱa ciyeḱî bilind û berbiroj

Zinc : ċeleng - laṣsiviḱ

Zindîloḱ : mîkrob-vayros

Zirbarî : bêpayî-tuneyî-bêyîhiṣťin

Zirṕandin : sizaya bi lêdanê

Ziryan : bablîzoḱa berfê

Zîpeř : masûlḱ- zebleḱ- hevdên goṣťê laṣ- zevleḱ

Zîreḱ : kelemêr - kelejin-jîr û zana

Zîvar : perċe-qeť-çîř(jiboyî caw-kinc..)

Zîxo : jêhaťî -piřzana-ṣaťir

Zom : tax-tareḱ ji bajêr

Zorî : kuťeḱî - topízî-xurťî

…….

…….

……

……

NAVEROḰ (p̂erist̂)

H.W	Mijar	Rûpel
1-	LÊVEGERA RÊZIMANA KURDÎ	1
2-	Pêşgot̂ina daner	3
3-	Lêvek̂irin	5
4-	RÊZIMANÎ . . . çiye ?	35
5-	HÛRBÎNÊN RÊZIMANÎ	37
6-	ALAV Û P̂ÊGIHÊJ	38
7-	PÊŞGIR	41
8-	PAŞGIR	74
9-	Alavên samandariyê	84
10-	Alavên kar û pîşe	87
11-	Alavên cî (deverê)	89
12-	Alavên karmend	92
13-	KOMÎ	104

H.W	Mijar	Rûpel
14-	PÊRNAV	113
15-	PÊRNAVÊD KESOḰ	114
16-	EZ.. .. .. MIN	117
17-	ṪU(ṫê).. .. .. ṪE	125
18-	EW.. .. .. (WÎ- WÊ)	131
19-	EM .. .. .. ME	140
20-	HÛN.. .. ..WE	149
21-	EW + (ÊN-IN-AN).. .. ..WAN	159
22-	RAVEḰIRINEḰ	171
23-	Rêzanên du dengedaran	178
24-	Arîṣa(aloziya) tîṕa /y/ di...	184
25-	ALAVÊN NERÊNIYÊ	192
26-	Alavên nerêniyê di dûxa biryarî de	196
27-	Nerênî û nerêniya nerêniyê	201
28-	Erêniya erêniyê	206
29-	PÊRNAVÊD NÎŞANDANÊ	208

H.W	Mijar	Rûpel
30-	PÊRNAVÊD PÊGIHÊJTÎ	213
31-	PÊRNAVÊD PIRSEYARIYÊ	215
32-	PÊRNAVÊD ARZÎ	218
33-	PÊRNAVÊD NEPEN	220
34-	NAV	223
35-	NÊR Û MÊ DI NAV DE	233
36-	KAR	241
37-	DERHINGÊV Û SALTEGÊR	255
38-	Raweyên kar	264
39-	Karên awarte	269
40-	KARNAV	273
41-	JÊDER(MAKDER)	276
42-	DENGENAV	285
43-	ZORGIR Û BÊZOR	290
44-	DURIST Û NEDURIST	292
45-	PENDÎ Û NEPEN	294

H.W	Mijar	Rûpel
46-	ḰARA	296
47-	DESP̀ÊḰER Û SALOẌ	298
48-	ALAVÊN BI NAV Û BI SALOẌ	304
49-	BERKAR	305
50-	P̀ÊKARÊ AZA	308
51-	JÊŘEKAR	309
52-	T́ÊŘEKAR	310
53-	P̀ÊŘKAR	313
54-	JÎWER	314
55-	REWŞ	317
56-	BIRNEDER.. NÊVNASḰER	322
57-	BANGEWAZÎ (BANGÎN)	323
58-	TÎP̀ÊN P̀ÊBEST́	325
59-	P̀ÊWENDÎ	327
60-	TḰEZÎ	328
61-	BAT́Î - CAT́Î	330

H.W	Mijar	Rûpel
62-	NÎR	332
63-	P̀ÊWENDIYA XUYANÎ	334
64-	SEYRIḰ	336
65-	TAYBET́MENDÎ	337
66-	FERYAD-HAWAR-(GAZÎḰIRIN)	338
67-	KOVANÎ	339
68-	PEVGUHERT́IN Û DERAVÊJ	341
69-	AXAVT́INEḰ LI SER TÎP̀AN	345
70-	ZAR Û PÎT́OLÎ	349
71-	CÊWÎ Û CÊWÎDAR	369
72-	T́êbîniyeḱe girîng	375
73-	DENG	377
74-	FERHENGOḰA G. Û. B.. GIRING	379
75 -	NAVEROḰ (ṕêrist́)	437